ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

**TEZA LÎSANSA BILIND**

# ROLA FOLKLORÊ DI PERWERDEKIRINA ZAROKAN DE MÎNAK: ÇÎROK

**Amadekar**

**Mohammed Baiz Rahman RAHMAN**

**14950001093**

**Şêwirmend**

**Doç.Dr.Vecihi SÖNMEZ**

**VAN- 2016**

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI


**Yüksek Lisans Tezi**

# ÇOCUKLARIN EĞİTİMİNDE FOLKLORÜN ROLÜ ÖRNEK: HIKAYE


**Mohammed Baiz RahmanRAHMAN**

**14950001093**

**Danışman**

**Doç.Dr.Vecihi SÖNMEZ**



**VAN- 2016**

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

**TEZ KABUL TUTANAĞI**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

**Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ** danışmanlığında, **MOHAMMED BAIZ RAHMAN RAHMAN** tarafından hazırlanan **"ROLA FOLKLORÊ Dİ PERWERDEKİRİNA ZAROKAN DE, MÎNAK: ÇÎROK"** adlı bu çalışma, 20/12/2016 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan (Danışman)** | : Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ | İmza: ………………….. |
| **ÜYE** | : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ | İmza: ………………….. |
| **ÜYE** | : Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK | İmza: ………………….. |
| **ÜYE** | : ………………………… | İmza: ………………….. |
| **ÜYE** | : ………………………… | İmza: ………………….. |

Yukarıdaki imzalar, adı geçen öğretim üyelerine aittir.

22/12/2016
Prof. Dr. Murat DEMİREL
**Enstitü Müdürü**

# ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında (Rola Folklorê Di Perwerdekirina Zarokan De, Mînak: Çîrok) ;

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

**Mohammed Baiz RAHMAN**

**20.12.2016**

# NAVEROK


NAVEROK....................................................................................................I

KURTE .....................................................................................................IV

ÖZET....................................................................................................... V

ABSTRACT ...............................................................................................VI

PÊŞGOTIN ...............................................................................................VII

KURTEBÊJE .............................................................................................. X

DESTPÊK ................................................................................................... 1

**BEŞA YEKEM** ............................................................................................ 3

1.TEZEK Dİ DERBARÊ FOLKLOR'Ê DE ...................................................... 3

1.1.Pênaseya Folklorê........................................................................ 6

1.2.Folklora Kurdî ............................................................................ 8

1.3.Cûre û Pêkhateyên Folklor'a Kurdî ................................................ 9

1.3.1.Efsane ....................................................................................... 10

1.3.2.Destan ...................................................................................... 11

1.3.3.Çîrok ......................................................................................... 12

1.3.4.Sitran ........................................................................................ 15

1.3.5.Gotinên Pêşîyan......................................................................... 17

1.3.6.Pêkenok .................................................................................... 18

1.3.7.Mamik ...................................................................................... 19

1.4.Perwerdekirina Zarokan .............................................................. 20

1.4.1.Peyv û zaravayên perwerdeyê ........................................................ 21

1.4.2.Pênaseyên Perwerdeyê ................................................................ 21

1.4.3.Şêwazên Perwedekirina Zarokan ................................................... 24

**BEŞA DUYEM** .......................................................................................... 26

2.PÊŞVEÇÛN Û GEŞEDANA ZAROKAN ........................................................ 26

2.1.Pêşveçûn û Qonaxên Jîyan a Zarokan ............................................ 26

2.1.1.Qonaxa Realîzm ( 3-6 ) Salî ........................................................ 28

2.1.2.Qonaxa Xeyalên Berfireh' ê  Zarokan (6-8) Salî ................................ 29

2.1.3.Qonaxa Pelewantîyê ( 8-12) Salî ..................................................... 30

2.1.4.Qonaxa Baliqbunê (12-15) Salî ...................................................... 31

2.2. Alîyên Pêşveçûna Zarokan ........ 33
2.2.1.Jîrî û Pêşveçûnên Di Alîyê Qonaxên Zarokan De ........ 33
2.2.1.1.Pêşveçûnên Jîrî ya Zarokan Di Baxçeyê Zarokan De ........ 34
2.2.1.2. Pêşveçûna Jîrî Ya Zarokan Di Qonaxa Bingehîn De ........ 35
2.2.1.2.1.Pêşveçûna Jîrî Ya Zarokan Di Qonaxa Destpêkê De ........ 35
2.2.1.2.2.Pêşveçûna Jîrî ya Zarokan Di Dema Baliqbûnê De ........ 36
2.2.2.Qonaxên Pêşveçûna Ziman Di alîyê Zarokan De ........ 37
2.2.2.1.Qonaxa Temenê 3-6 Salî ........ 38
2.2.2.2.Qonaxa Temenê 6-8 Salî ........ 40
2.2.2.3.Qonaxa Temenê 8-12 Salî ........ 40
2.2.2.4.Qonaxa Temenê 12-15 Salî ........ 41
**BEŞA SÊYEM** ........ 43
3.ÇÎROKÊN ZAROKAN ........ 43
3.1.Cûreyên çîroka zarokan ........ 44
3.1.1.Çîrokên Zarokên Temenê Biçûk ( 3-8 ) Salî ........ 44
3.1.2.Çîrokên Zarokên Temen Mezin ( 8-15 ) Salî ........ 45
3.2.Dabeşkirina Çîrokan Ji Alîyên Lêkolînvan û Nivîskaran Ve ........ 46
3.3.Armanc û Sûdên Çîrokên Zarokan ........ 47
3.4.Pêwîstî û Mercên Çîrokên Zarokan ........ 50
3.5.Rola Çîrokên Folklorî û Cûreyên Wê Di Perwerdekirina Zarokan De ........ 53
3.5.1.Çîrokên Ajalan ........ 54
3.5.2.Çîrokên Efsaneyî ........ 56
3.5.3.Çîrokên Resen ........ 57
3.5.4.Çîrokên Ayînî ( Olî ) ........ 58
3.5.5.Çîrokên Pêkenokî ........ 59
**BEŞA ÇARAM** ........ 61
4.PÎRAKTÎKKÎRÎNA ÇÎROKAN ........ 61
4.1.Rola Çîrokan Di Perwerdekirina Derûnîya Zarokan De ........ 61
4.1.1.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Derûnîya Zarokên Temen Biçûk De (3-8 ) Salî ........ 62
A.Waneya Keyfxweşî û Ji Xeman Rizgarbûn : ........ 62
B.Waneya Geşbînî û Bêhêvînebûnê: ........ 64

C.Waneya Ji Xwe Bawerî û Nemana Tirsê: ..................................................... 65
4.1.2.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Derûnîya Zarokên Temen Mezin De( 8-15 ) Salî ..................................................................................................... 66
A.Waneya Ji Xwe Bawerî û Çav Ne Tirs: ............................................................ 66
B.Waneya Çêkirina Dilxweşî û Ji Xeman Rizgarbûn : ..................................... 69
C.Çareserkirina Pozbilindî û Xwe Mezin Kirinê :.............................................. 70
4.2.Rola Çîrokan Di Perwedekirina Reftarê Zarokan De :..................................... 72
4.2.1.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Reftarê Zarokên Temen Biçûk De (3-8 ) Salî : ................................................................................................................ 72
A.Waneya Rast Gotin û Dur Ketin Ji Derewan : ................................................ 73
B.Waneya Destpakî û Durketin Ji Dizîyê :........................................................ 74
C.Waneya Gohdarî Kirina Kesên Bi Ezmûn : ................................................... 75
4.2.2.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Reftarê Zarokên Temen Mezin De (8-15 ) Salî : ............................................................................................................ 77
A.Waneya Rast gotin û Durketin Ji Direwan : .................................................. 78
B.Waneyên Destpakî û Durketin Ji Dizîyan :.................................................... 79
C.Waneya Wijdanî û Durketin Ji Xîyanet û Ne Paqijîyê : ................................ 80
4.3. Rola Çîrokan Di Perwerdekirina Alîyên Civakîya Zarokan De:.................... 82
4.3.1.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Civakîya Zarokên Temen Biçûk De (3-8) Salî : .............................................................................................................. 82
A.Waneya Arîkarî û Hevkarî Kirina Xelkê : ..................................................... 83
B.Waneya Yekîtî û Yekgirtin : ........................................................................... 84
C.Waneya Bexşandin û Lêborînê: ..................................................................... 85
D.Waneya Beşdarbun Di Xweşî û Nexweşîya Xelkê De: .................................. 86
4.3.2.Waneya Çîrokan Di Perwerdekirina Civakîya Zarokên Temen Mezin De (8-15) Salî : ............................................................................................................ 87
A.Waneya Rêzgirtin Ji bo Dayîk û Bav û Kesên Mezin: .................................. 88
B.Waneya Giringîdayîna Xizmayetîyê :............................................................ 89
C.Waneya Pêşwazî û Rêzgirtina Mêvanan :...................................................... 90
D.Waneya Yekîtî û Yekgirtin : ........................................................................... 91
**ENCAM**..................................................................................................................... 93
**ÇAVKANÎ**.................................................................................................................. 94

# KURTE

Ev lêkolîn bi navnîşana “ Rola Folklorê Di Perwerdekirina Zarokan De, Mînak: Çîrok ”e,Di vê lêkolînê de min rêbaza " Piraktîkî û Şîrovekirin" ê bikaranî. Min hewildaye ser rola folklor bi giştî çîrokan û taybeti perwerdekirina zarokan. Ji ber ku çîrok ji ezmuna jîyana mirovan çê bûye. Gelek wane û amojgarîyên bi sûd di navde ye, wisan dike ku zarok rewşenbîr bibe û paşerojekî ronî ji wan re dide avakirin. Qonaxa zarokatîyê qonaxa herî nazik û giring ya mirovan e. Serkeftina vê qonaxê dibe sedema zîrekî û kesayetîyekî ji xwe bawer. Di vê derbarê de folklor û beşên wê girîngîyekî ya xwe heye. Lê belê çîrok jî rolekî wê ya ber çav heye di zîrekî û pêşketina zimanê zarokan de. Ev jî dibe sedemê ku fikirîna zarokan berfireh bibe, gencîneya ferhengî,peyv û hevokên di nava çîrokê de zimanê wan dewlemend dike. Di heman demê de çîrokên perwerdeyî, wane û amojgarîyên cûrbicûr, zarokan di alîyê derûnî, reftarî û civakî de pêşdixe. Di nava civakê de kesayetîyekî serkeftî û bihêz a zarokan dide avakirin.

Ev lêkolîn ji destpêkek û çar beşan pêkhatîye.Di beşa yekem de qala pênaseyên folklorê dike, cûreyên folklora kurdî dide destnîşan kirin. Di mijarek din de perwerdekirina zarokan, beş û pênaseyên wan dide dîyarkirin. Şêwaza perwerdekirina zarokan dide destnîşankirin. Di beşa duwem de jî pêşveçun, qonaxa jîyana zarokan û alîyê jîrîya zimanê zarokan qal dike. Qonax bi qonax dide dest nîşan kirin. Beşa sêyem jî taybet ji çîrokên zarokan, cûreyên çîrokan, armanc û sudên wan ji bo zarokan pêktê. Her wiha di vê beşê de di alîyê naverokê de jî rol û bandora Çîrokên Ajalan, Çîrorkên Efsanewî, Çîrokên Resen, Çîrokên Ayînî û Çîrokên Pêkenîn ê perwerdekirina zarokan de dide destnîşan kirin. Bi şêweyekî li gel temenê zarokan guncav be. Di beşa çarem de jî şîrovekirin, piraktîkî û çîrokên hilbijartî ê perwerdeyî dide dîyar kirin. Bandorîya derûnî, reftarî û civakî li ser herdu temenê qonaxa zarokên temen biçûk û mezin dide destnîşan kirin.

***Peyvênsereke*:** Çîrok, Perwerdekirin, Zarok.

# ÖZET

ÇOCUKLARIN EĞİTİMİNDE FOLKLORÜN ROLÜ, ÖRNEK: HIKAYE

Bu araştırmada araştırma yasaları planlayıcı, anlaşılır ve açık yöntemler kullanılarak foklor, genel olarak ele alınıp özellikle hikayenin çocuk eğitimindeki önemi vurgulanmıştır. Çünkü hikayeler insanlığın içindeki gerçeklerden alınmıştır. Öyküler, içinde insanlara ders olacak nasihatlar içerir. Bu da çocukların daha aydın bir şekilde gelişmelerini, güzel bir geleceğe sahip olmalarını sağlar. Bunun yanı sıra çocukların kendilerine güvenmelerini sağlar. Bu alanda foklor ve türleri kendisine has özellikler taşır; fakat özellikle hikayelerin çocuklarda zeka gelişiminde ve doğru dil kullanmalarında büyük rol oynar. Bu da çocukların açık bir görüşe sahip olmalarını sağlar. Bunun yanı sıra çocukların daha zengin bir dile sahip olmalarını, yeni sözcükler ve cümleler öğrenmelerini sağlar. Aynı zamanda eğitici öyküler içindeki derslere konu olan ve nasihatlar, çocukların pisikolojik, ahlaki ve toplumsal alanda sağlıklı bir şekilde büyümelerine ve güzel bir kişiliğe sahip olmalarını sağlar.

Bu araştırma, bir başlangıç ve dört bölümden oluşmaktadır. İlk bölümde folklorden ve folklorün tanımından bahsedilmiş, Kürt foklorünün türleri ele alınmış ve bunun yanı sıra çocukların eğitimi tanımlanmış, çocukların nasıl eğitilebilecekleri anlaşılır bir şekilde anlatılmıştır. İkinci bölümde gelişim ve çocukların yaş bölümleri, zeka ve dil gelişiminden bahsedilmiş, aşama aşama açıklanmıştır. Üçüncü bölümde çocuk hikayeleri, hikaye türleri, hikayelerin amacı ve yararlarından, çocukların hikayelere ihtiyaçları olduğundan özellikle bahsedilmiştir. Ayrıca bu bölümde hikayenin türleri olan, hayvan hikayekeri, efsanevi hikayeler, asıl hikayeler, dini hikayeler ve güldürücü hikayelerin çocuk eğitimindeki önemi ele alınmıştır. Çocukların yaşlarına uygun hikayeler içerir. Dördüncü bölümde, seçilen yani uygun bulunan öykülerdeki eğitici bölümler ortaya çıkartılmıştır. Eğitici tarafları ve etkilerinin, pisikolojik, ahlaki ve sosyal alanlarda küçük ve büyük çocuklar olarak iki ayrı konu şeklinde ele alınmıştır.

***Anahtar Kelimeler***:Hikaye, Eğitim, Çocuk.

// ABSTRACT

This study which is entitled " The Role of Folklore in Educating Children, for example: Story" has used theoretical and analytical methods as an attempt to show the role of folklore in general and story in particular in educating children since stories reflect the events and experience of human being's life. Moreover, stories contain several constructive advices, impressive examples and important lessons that make children well educated, intelligent, and have a bright future. In this field, folklore and its types have their own significance; but stories play an outstanding role in developing children's intelligence and language in particular. From this perspective, children's thinking expands and their language gets rich with words, phrases, expressions and sentences used in the stories. Consequently, children's thinking and reflection develop, and the culture of their language progresses. In addition, the educational stories through a great variety of advices and lessons develop children in terms of psychology, personality, morals, and society.

The present study consists of introduction and four chapters. The first chapter gives an overview about the concept of folklore, its definitions and types. This chapter also determines educating children, concepts and definitions relating to their education and explains the styles used for educating children. Chapter two presents the growth, phases and components of children's life in terms of intelligence and language with elaborating stage by stage. Chapter three is devoted to present children's stories, types of stories, aims and benefits of stories, necessities and conditions of children's stories. Furthermore, with regard to content, the role and impact of animals' stories, epic, original, religious and funny stories are explained in the field of educating children in a way that has to be appropriate with the age and situation of children. In chapter four, lessons and educational directions of the selected stories are determined through analyzing and practicing, and it shows educational effects of psychology, moral and society for both very early age and older.

***Keywords***: Story, Education, Children

# PÊŞGOTIN

Ev lêkolîn bi navnîşana“ Rola Folklorê Di Perwerdekırına Zarokan De, Mînak: Çîrok ”e, Bandorîya çîrokan wekî beşekî giring a folklorê di perwerdeya zarokan de derdêxe holê. Çîrok di zimanê kurdî de Hîkayet yan jî Neql jê re tê gotin. Dem bi dem nifş bi nifş ji bo zarokên niha hatîye. Hinek bi nivîskî û hinek jî li ser zimanê kesan hatîye û xwedîyê wan jî ne dîyare. Gel wekî xwedîyê herî rast tê zanîn.

Weke tê zanîn qonaxa zarokatîyê ji dayîk bûnê re destpê dike. Lê belê zarok di temenê ( sê ) salî ber bi jor dikevin bin bandora tiştên derûdor , hest û hişê wan berfireh dibe û dikarin sudê ji çîrokan bigirin. Ji ber ku çîrok bandorekî zêde li ser berupêşbirin û jîrîya zarokan dike. Di alîyekî din de jî sedemeke ji bo dewlemendkirina ferhenga zimanê zarokan. Her wiha pir jî bûyer û serpêhatîyan gelek wane û amojgarîyên bisûd têde heye. Ev wane û amojgarî jî gelek bandorêdike li ser perwerdekirina zarokan. Di hemu alîyên jîyanê de bi taybetî jî alîyê derûnî û reftarê civakê de. Herî zêde çîrokan li ser şêweyê perwerdeyî zarokan bi bandor bikin. Çîrokên me li ser du qonaxan hatîne dabeş kirin. Çîrokên zarokên qonaxa temen biçûk û çîrokên qonaxa temenê wan mezin. Ji ber ku çîrok li gor qonaxa temenê wan jêre bê gotin wê zarok hîn zêdetir ji naveroka wan fêm bikin. Wê fêrî wane û amojgarîyên dinava wan de bibe. Da ku di jîyanê de sudê jê bibîne û di nava civakê de bibe kesayetîyekî serkeftî.

**Sedema Hilbijartina Mijarê**

Her çawa be jî li ser wêjeya zarokan û karên akademî lêkolîn hatîne kirin. Lê belê li ser rolê çîrokan di perwerdekirina zarokan de nehatîye kirin. Ji ber vê jî min biryarda ez vê babetê hilbijêrim û kar li ser bikim. Ji bo vê jî min rol û bandora çîrokên zarokan di çend çîrokên hilbijartî ê kurdî de daye dîyar kirin. Heya ku dibe sedemekî bisûd ji bo zarokan, di hemu alîyên jîyanê de bibe çêkirina kesayetekî aktîf. Bi taybetî jî di alîyê derûnî û reftarê civakêde.

**Armanca Lêkolînê**

Armanca vê tezê ewe ku dîyarkirina nirx û bihayê çîrokan di perwerdekirina zarokan di hemu alîyên jîyanê de. Da ku bi wane û sudên perwedeyî zarokan di alîyê derûnî, reftar û civakî de berupêş bibe. Her wiha armanca me ew e ku dewlemend kirina pirtûkxaneya kurdî, bi giştî girîngî dayîna wêjeya zarokane.

**Rêbaza Lêkolînê**

Di vê lêkolînê de me pişta xwe bi rêbazên " Piraktîkî û Şîrovekirin " ve girêda ye, ku li çend beşên destpêkê de bi rêka teorî pênasîn û têgehên xwe di derbarê folkilorê ve hatiye behiskirin. Li beşa dumahî jî ve bi aliyekî berbiçav karên meyên teorî li ser hinek çîrokên folklorî ve hatiye piraktîze kirin. Ligel min ev rêbaz , ji bo lêkolînek bi vî awayî rêbaza herî serkeftî ye .

**Girîngîya Lêkolînê**

Zerok pir nazik in. Di heman demê de ziman û mejîyê serê wan jî pir nazik e û mîna rupelek spî ye. Ez dixwazim di vê babetê de qala giringîya perwerdekirina zarokan di çîrokê de bikim û çawa bandorîya çîrokê ji aliyê Derûnî , Rewiştî , Civakî yê li ser zarokan de heye , perwerdekirina zarokekî baş ku mezin bibe bi xwedîyê binyadeke baş e. Pêwîst e destpêkê dayik û bav û kesên perwerdekar xwedî zanist û perwerde bin. Zarok ji aliyê dayîk û bav û kesên perwerdekar ve tê perwerdekirin.

**Astengiyên Li Pêşiya Lêkolînê**

Kêmbuna çavkanîyên pêwîst di derbarê folklorê de. Karnekirin li ser komkirina berhemên ser zimanê gel. Li ser Perwerdekirina zarokan û Çîrokên Perwerdekirinê, di kurdî de lêkolîn û lêgerîn gelek kêm in . Giringî bi alîyên zarokan nehatîye dayîne, lêkolînên pêwîst bi ser wêjeya zarokan nekirîne ku ji bo me bibe binyadek ya tezê.Her wihanebûna zimaneka kurdî sitander ji bo xwendin û nivisîn li cem kurdan.

Di buhartina van pirsgirêkan û tesbîtkirina rê û rêbazên akademîk de,şêwirmendiya mamoste Doç.Dr. VecihîSÖNMEZ, Her tim rê liber min vekir, ji ber vê alîkarî û şêwirmendiya wî ez jê re spas dikim. Her wiha ez spasiyên xwe pêşkêşî Al. Doç. Nesîm SÖNMEZ dikim , ku di amadekirina vê tezê de alîkariyeke bi nirx da min. Her wiha ji bo ku di warê serastkirinê de alikariya min kir ji hevalê min Mamoste Mehmet Emin Taşkesen re ji gelek spas dikim.

**Mohammed Baiz RAHMAN**

**VAN- 2016**

## KURTEBÊJE

Amd. : Amadekar

B. : Berg

b.n.b. : Berhema Navborî

Ç. : Çap

hwk. : Her Wekî Din

h.b. : Heman Berhem

J. : Jimare

R. : Rupel

S. : Sal

Wer. : Werger

Weş. : Weşanxane

# DESTPÊK

Bê goman zarokên îro lawê siberojê û zilamên paşerojê ne. Ji ber vê jî eger miletek bixwaze paşerojekî ronî ava bike pêwîst e girîngîyekî herî mezin bide perwerde û fêrkirinê. Ji bo ku bibe sedemê ku kesayetîyên bihêz di nava civakê de çêbibe. Yek ji binyadên herî serekî ê civakan li ser şêwazê perwerdekirina zarokan e. Bi taybetî jî di alîyê jîrî û ziman de. Eger binyadekî serkeftî a perwerdeyê ji bo zarokan hat danîn, wê di paşerojê de kesayetîyek bihêz û zîrek jê derbikeve. Bi vê re wê civak jî alîyên derûnî û reftar de bi sudmend be. Ji ber ku perwerdeya rast û baş zarokan fêr dike, alîkarîya wan dike ka wê çawa bikarin bi şêweyekî rast û guncav li gel kesên derdora xwe de jîyanê derbaz bikin.

Di vê derbarê de wêjeya folklorê bi giştî û çîrok bi taybetî bandorê li ser perwerdeya zarokan dike. Bi taybet di alîyê jîrîyê de jî hest û hizrê zarokan bi hêz dike, fikirîna wan jî pêşdixe. Alîkarîya zarokan dike ku ji bo hîn zêdetir zanyarîyan werbigire, hêza bîranînê, xeyal û ramanê berfireh dike. Ev jî di qonaxa baxçeyê zarokan û destpêkirina dibistina seretayî re derdikeve. Çîrok gelek arîkarîya ferhenga zimanî ya qonaxa zarokan dike û berupêşve dibe. Di heman demê di dema axaftinê û giftûgokirina li gel kesê din de dike. Ev jî bi mercekê çîrok li gel qonaxa temenê zarokan biguncê. Eger me nimûneyê baş ê çîrokan pêşkêşî zaroka kirin, ew jî di alîyê xwe de lêkolîn dike û di jîyana rojane de bikartîne. Peyv û hevokên di nava çîrokê de gohdar dikin dibe sedemê ziman û hizîrîna wan hêsanî bibe. Di alîyek din de jî hilbijartina çîrokan dibe sedemê ku rewşenbîrîya zarokan pêş bikeve. Ji ber ku di nava çîrokên zarokan de xeyalekî bilind û bihêz heye. Gelek wane û zanyarîyên cûrbicûr jî di nav de heye.

Çîrok, bi wane û amojgrîyên cûrbicûrre bandorê li ser perwerde û derûnîya zarokan dike. Ji ber ku di alîyê derûnîyê de kesayetîya zarokan bi kesayetîya di nava çîrokê ve girê dide. Bi vê re jî bandorîyê li ser hundirê zarokan çêdike.Sûd wergirtina ji çîrokan dibe sedemê ku zarok ji şermê û tirsê xilas bibe,zarokan têxe di barekî ji xwe bawer û dilxweş de. Ji ber ku çîrok sedemekî girînge ji bo fêrbuna reftarên baş û

bisûd.Dikare zarokan ji karê xirab rizgar bike û di kare reftarên baş pêşkêşî wan bike.Her wiha çîrokên baş û guncav ê civakî rolekî berçav heye di perwerdekirina alîyên civakî û têkildarîya zarokan de.Ji ber ku dibe sedemê kesayetîyekî rast û serkeftî a zarokan.Çîrok neynika hindir û ji derveyî ya mirovane.Armanca wê ewe ku pirsgirêk û astengîyên rûberûyî civak û kesan çareser bike. Xwestekênwan bi cih bîne. Di dawîyê dejî kesayetîyekî bi hêz û serkeftî di zarokan de çê dike. Hest bi pirskirina welat û civakê dike. Hest bierkê mirovatî bike û ji hedê civakê derbaz nebe.

Ji bo vê jî erkê xweyî kirin û mezinkirina zarokan di keve li ser milê dayîk û bavan. Pêwîst e bi girîngî temaşeyî zarokan bike û çîrokên girîng bi sûd ji bo wan hilbijêre û li gorî qonaxa temenê wan ji wan re bibêje. Da ku bi şêweyekî rast û guncav zarokên xwe perwerde bikin.

## BEŞA YEKEM

# 1.TEZEK Dİ DERBARÊ FOLKLOR'Ê DE

Folklor ew wêje û resenîye ye kû, jîyana xelk û gelan bi awayekî sade têxe ber çavan.Dîrok û goherînên demikî tê de derdikevin holê.Folklor bi core kî demaw dem, piştew pişt,navçe bi navçe di şeklekî berfirehde belav bûye. Nav'ê nivîskar û xwedîyê wê nedîyar e,sedemê wê jî eve. Wêjeya Folklor 'ê wekî berhemên takekesanenayên xûyakirin, ji ber kû çêkerê berhemên wê gele û her wekî berhemek ji ya gel tê naskirin. Ruyê wê yê eşkere jî ji sadetî ya wê pêktê, çi di alîyê ziman de be, çi di alîyê vegotinê de be, çawan be jî her şonpîyên gelan pêve dîyar e.[1]Demê wê yê zîrek jî li hevhatina gelên pêşî ye,yan jî hatina wan ya li gel hev bi awayekî bihevre demekî xweş derbaskirine û nasandina wan ya di jîyanê de ye. Gelik berhemên wê hene kû destkarî lê ne hatîne kirin, bi awayekî ser zimanî hatîye dîyarkirin û hatîne parastin.

Folklor, peyvekî li hevdaye bi wateya “Zanîsta Gel” hatîye bi navkirin û bikaranîn. Gelek gelên cîhanê yên wekî: Îngîlîz, Elman û Yunanû hwd. Ev peyv bi karanîne.Peyva Folklor di nifşên kurdî de, “*yekem car ji alîyê “ Meruf Berzencî” di sala 1958' an de, di jimara duwem ya “ Kovara Şefaq” de jêr navê “Folklor a Kurdî” de hatîye bi karanîn û hatîye belav kirin*.”[2]Her wiha di sedsalên pêşde peyva folklorê “*Elamekan di sala1806 ' an de peyva “Folkskunde” kû tê wateya “Helbestên gel û jêhatina gel”bi karanîne*.” [3]Bi nêzîkbuna her du peyvan re Folklor û folkskunde hindek zanayên folklornasî di wê bawerîyê dene kû, peyva Folklor ji Folkskunde a Elmanî hatîye girtin.[4]

---

[1]Îzedîn Mistefa Resûl, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Çapa 2, Weşanxaneya Zankoy Silêmanî, Slêmanî,1979,r.6.
[2]Sedredîn Nuredîn Ebubekir,*Berkurtekî Metelî Folklorî Kurdî*, Weş.Wezaretî Rewşenbîrî, Hewlêr 2005,r.10.
[3]Yorî Sokolof*, El Folklor Qezaye ûTarîx*, Wer: Hilmî Şerawî, Ebdulhemîd Hewas, El-Heye El-Misrye,1971,r.17.
[4]Hêmin Casim Mihemed, *Hunerî Gêranewe Le Çîrokî Folklorî Kurdî Çîrokî Mindalan Be Nimune*,Teza Lîsansa Bilind, Selahedîn, Hewlêr, 2015,r.37.

"*Çîroka Beragirdan*""aBirayên Grimm di sala 1812 ' an de hatîye belavkirin. Di hunera Netewyan de wekî karekî pir  giring hatîye dîtîn, folklornas jî vê berhemê wekî karekî pîroz dibînin.( Wîlhem-1859 ) û ( Jacob Karl Grimm- 1863) bi berhemên xwe gelek bandorî li ser nivıskar û zanayên Ewrupî çêkirîne. Wisan bi wan kirîye kû, ew jî çav bi berhem û karên wan bikin. Dest bi komkirina berhemên ser zimanî yên welatê xwe bikin. Ji alîyê gel ve kar û berhmên van herdû birayan bi navê  "Birayên Grimm" hatîye naskirin.Navê her dû birayan di dibistanên Romantîkî yên Elmanya de belav bûye,  ji ber kû xebat û çalekîyên mezin li ser folklora Ewrupa û Elmanya kirine, bi taybetî jî di derbarê Xeberoşk û Efsaneyê de kar kirîne.Her wiha bîr û bawerîyên Elmanya komkirîne di jêr navê"*Kinder und Hausmarchen*": (*Çîrokên ji bo Zarok û malîyan* ) belav kirîne.[5]Wilhem Grimm, di derbarê rêbaza "Birayên Grimm"de fikrên xwe tîne ziman û dibêje: "*Kelupel hemû di binçîneya xwede Hindîne*." [6]Hêdî hêdî ev xebat berdewam dike heya Di navîna sedsala 19 ' an di 22 ê Tebaxa 1846 ' an de Erdkolînnasên îngilîz ji bo kovara  " *The Athenaem*"  pêşnîyar kirin kû peyva (Folklor) bikar bîne, piştreew peyv belavkirin.[7]Pêşîya vî fikrî ev peyv ne hatîye bihîstin. Di destpêkê de wekî zanistekî biçûk û wekî beşê Mirovnasîye (Entropolociya) bi kar ne anîne. Lê belê piştre bergên peyvê berfireh bû, heya hemu alî girt, mînak alîyên kel û pelên serzarîyên dem bi dem zivirandîye yan jî kel û pelên jîyanê pê zivirandîye.[8] Ev zanîst di hemû alîyên cîhanê de gelik axaftin û lêkolîn li ser hatîye kirin. Her wihaçend bîrdozekî wekî ( Theory ) ji bo wê hatîye danîn, bûye sedemê zanîstekî nûjen.Gelek zanîngehên Cîhanê bi vê zanîstê hatîne binavkirin û kirine babetekî Akademîk.[9] Di sala 1888' an de cara destpêkê, ev zanîst di zanîstgeha Hlsngî de ji alîyê Danî ve hatîye bi karanîn ûbûye zanîstekî serbixwe. Ev zanîst ji alîyê gelek zanîstgehên cîhanê ve hatîye pejirandin ,giringî û eleqeyekî pir mezin ji alîyê wan ve hatîye nîşankirin. Mînak, zanîngehên wekî: Siwêd, Norveç, Danîmarka, Elmanya, Belçîqa,  Nemsa, Yugoslavya, Romanya, Kanada û Emerîka. Li ser vî bingehî di hemû welatên cîhanê de giringî bi "*Huner a Neteweyî*" jî hatîye dayîn.[10] .

[5]Hikmettin Atti,*Lêkolîneke Folklorê li ser Destana Mem û Zînê*, Teza Lînsansa Bilind, Mardîn,2013,r.4.
[6]Xalid Cotyar, *Berew folklor*, Weş. El Hewadis, Bexda,1984, r.17.
[7] Ehmed Alî Morsî,*Muqedîme Fî  Folklor*, Dar El-Seqafe û El-Neşir, Qahre,1975,r.5.
[8] Hîwa Omer Ehmed, *Mêjoî Folklor* " Kovarî Nûserî Niwê" Jimare 4, 1979, r.66.
[9] Hîwa Omer Ehmed,*b.n.b*, r.65.
[10] Hêmin Casim Mihemed, *b.n.b*, r.38.

Folklor û giringîya wê di belavukên zanîstgehên Ewrupa de wekî zanîstekî Akamdemîk hatîye naskirin.

Her çiqas hestên Netewyî berû pêşveçûnên nûjen ve diçû, ev zanîst jî ber bi pêşveçunên nûjen ve diçû. ( Romansîyet ) ji, di wêjeya Ewrupa de her kû diçû ber bi pêşve diçû. Ji ber vê yekê hemî zana û folklornas, di wê bawerîyê de ne kû peydabûna zanîsta Folklor ê xwe dispêre bi rêxistîna Romansîyetê ve. Dîyare di destpêka sedsala 19'an de ser encamek temam ya serhildana Romantîzmê têxe ber çavan. Giringîyekî zêde bi rewşenbîrîya Netewî didin.[11] Di virde derdikeve holê kû zanîsta folklorê a welatekê ji ya welatek din cudatire.Her çiqas direng û zû be jî ev zanîst bi hestên netewan yan jî li gorî desthilatdaran tê gohertin. Ji ber vê ye kû lêkolîn û babetên"*kel û pelên Netewî*" qunaxên dîrokî, jîyana rewşenbîrî, civakî û şaristanîyaNeteweyî der dixe holê.Tê dîyarkirin kû rêxistina Romantîzmrol û bandorekî gelik li ser kel û pelên neteweyî,berhemên kevin yên netewî û kar û hunera destan hebû ye. Ev jî bû sedemê kû nivîskar û lêkolînvan hîn zêdetir xebatê li ser bikin. Di sala 1891 ' an di Kongreya Folklora nû a Netewî de, peyva Folklor bi awayekî navdewletî hat qebulkirin.[12]

Di dawîya şerê cîhanê yê yekemde derîyek baş ji bo folklorê hat vekirin. Hewlek hat dayîn kû lêkolîn û babet li ser berhemên kevin bi awayekî zagonî bên rêxistinkirin.Ev bu kû di sala 1927 ' an de komela ( Neteweyên Yekgirtî N.Y ) folklor wekî zanîstekî ji alîyê wan ve hat naskirin,ev zanîst ji alîyê hemu gelên cîhanê ve hat pejirandin. Li gorî wan folklor ewe kû jîyana hevbeş a di nava gelan ,yan jî di nava gelên cîhanê dide dîyarkirine. Di sala 1948 ' an de folklorê cihê xwe dinava gelan de bi awayekî bi hêz û qayîm kir û ji alîyê wan ve hîn zêdetir hat naskirin. Ji bo nivîskar û rexnegiran folklor bû cihê çavkanî û rêya hêsanîyê, da kû hîn zêdetir pênûsa xwe bixin bin xizmeta wêjeyê. Kesên folklornas li gorî wan folklor demê borîye û rengdêrê nihaye. Folklor peywendîyekî zêde li gel dîroka gelan heye, li ser bingeha dîroka gelan hatîye dîyarkirin. Her çiqas gelek xwedî dewlemendîyek zêde be, ew qas jî folklora wê jî xwedî dewlemendîyekî zêdeye.Pêşveçûna folklorê hemû alîyên jîyana gelan digire destan. Mînak: Sîyaset,

[11] Xalid Cotyar,*Berewfolklor*, Weş.El-Hewadis, Bexda,1984, r.9.
[12] Atti, *b.n.b*, r.5.

Wêje, Zagon, Felsefe û...Hwd. Folklor berhemê ser zimanî û berhemên dest yên jîyana rojane a gelane. Her wiha, gelek cihê kelûpelên netewan digire, her wiha di kevinde cil û bergên netewî nû yên gelan ,wekû Gilas, Kevçik, Kasik û Lalîk hemû nexşe û nîgrên cûrbicûryên xwarinê ne. Gelek tiştên din jî hene, kû cihê tilîyên netewan di berhemên destan de nîşan dide.[13]Bi vê re jî em dikarin ji vê re bêjîn: "*Kelûpelên serzarî û kel û pelên netewî , di roja îro de jî li gelik welatan ji van berheman re dibêjin: Zaravayê Folklorî*."[14]

Di virde tê dîyarkirin kû ew tişta heya niha folklor li ser linga hiştî û parastîye nehiştîye kû têk biçe, berhema ser zimanê gelan bû ye. Ji ber kû her roj hatîye gotin û qala wê hatîye kirin.Karê hunera destan jî beşek din yê karê folklorê ye, kû şêweyê jîyana mirovan a hezar salan têxe ber çavan û nîşankirin.Ev gel di çi demê şaristanîyê de jîyan kirîye û asta rewşenbîrî, Pişesazî ya wê çawa buye dîyar dike.Di roja îro de folklor berhemê zîrekî û jîrîya gelane,folklor jîyana borî a kevin di demekê de têxe berçavan.

## 1.1.Pênaseya Folklorê

Zanayan gelek hewildan kirîne kû zanîsta folklorê li gel zanîstên wekî: Arkeolojî, Mîtolojî, Etnografî, têkel nekin, di xwestin folklorê wekî zanîstekî serbixwe bidin naskirin. Hinek zanayên din hewil didan vê zanîstê li gel yên din cuda nekin, di alîyê lêkolîn û babetan de.Li gorî wan folklor ji hizrê mirovan pêk hatîye, ji ber vê yekê ji zanîstên din cuda nakin.Folklornasan û nîvîskaran bi şêweyekî cuda pênaseya folklorê kirîne,li hev xistîne û fikrên xwe jî li ser zêde kirîne. Lê belê li ser naveroka pênaseyên folklorê hinek nakokî ji alîyê hindek babetnivîs û lêkolînvanan ve hatîye dîyarkirin. Li ser vê rewşê ( Van Gennep 1873-1957 ) ' ê firansî û çend lêkolînvanên Ewrupa a Rojava,Folklor ê wekî ( Etnografya ) dibînin. Lê belê Elmanî zanîsta folklorê disipêrin zanîsta netewayetî yê, Folklor tenê hunerê ser zimanê xelkê

[13]Îzedîn Mistefa Resûl, *b.n.b.*, r.6.
[14] Şûkrîye Resûl Îbrahîm,*Lêkolînewe le Zanîstî Ewrupa û le Kurdistan* "Kovarî Karwan" J.14,1984,r.16.

ye.[15] Li gorî (Yurî Sokolov) 'jî folklor wêjeya millî ( Netewî ) ye, her yek bi serê xwe babetekin,tenê cudahîya di navberan wan de wêjeya millî xwedîyê wê dîyare,lê ya folklorî xwedîyê wê ne dîyare. Belku xelk bi giştî xwedîyê wê ne.[16]Li gel vê jî em dikarin bêjin folklor hizre,karê hunera dest digire lê belê wêjeya millî tenê wêjeya ser zarê xelkê digire û xwe li ser hunera netewî dide nîşankirin.

(Maxim Gorky 1936-1868)dibêje: Binyada wêjeyê ji folklorê ye, di wêjeya xelkêdeye. Folklor metaryalekî mezine û çavkanîye ji bo hemû helbestvan û nîvîskaran. Eger em bi başî temaşeyî demê borî bikin emê berhemên rengîn bibînîn û wê demê emê baş ji folklorê fêmbikin .[17]Di virde dide dîyarkirin kû folklor çavkanîya hemû berhemên helbestvan û nivîskarane.ji ber kû çi gel û netew nîne li ser ruyê xwezayê ne xwedî folklor bin.Hinek neteweyên kevin ê pêşketî hene folklor û wêjeya wan jî pêşketî ye. (Charles F.Poter 1885-1962 ), bi vî awayî pênaseya folklorê kirîye."*Wêjeyekî nemire, Zanîst û rewşenbîrîya gelên kevin nîşan dide*."[18]Folklor, dîrokek wê ye pir kevin heye, xwedîyê wê nayê naskirin û ne dîyare. Ji ber vê yekê tenê gel wekî xwedîyê wê tê naskirin. Li gel vê jî folklor tevlî hemû alîyên jîyana mirovan bûye. Çiqas em temaşeyî her alîyek yê wê bikin emê bibînîn kû rol û bandoreke mezin heye.Di vê wêjeya dewlemend de zarok jî nehatîne ji bîrkirin, ji ber kû "*Folklor di perwerdeya netewî de giringîyeke gelek li ser alîyê derûnîya zarokan hebuye*." [19]

Em dikarin di vir de bêjin folklor berê binyada çavkanîya hemû temen, çîn û jîyana hemû alîyên gelane. Di her babetekê de folklor rewşa jîyana rewşenbîriya demê borî nîşan dide.Ev jî dide dîyarkirin kû jîyana mirovan di demê borî de jî bi heman şêweyî bû ye, nêzikî hev bû ye.

---

[15]Kamuran Mukrî (Muhemed Ehmet Taha),*Edebî Folklorî Kurdî*, Weş. Zankoy Selahedîn, Hewlêr,1984,r.30.
[16] Hêmin Casim Mihemed, *b.n.b*, r.39.
[17]Îzedîn Mistefa Resûl, *b.n.b.*, r.7.
[18]Morsî,*b.n.b*,r.44.
[19]Nahîde Ehmed,*Seratayek Deerbareî Serhildanî Edebî Mindalanî Kurd*, Weş.Wezareta Perwerde, 2005, r.8.

## 1.2.Folklora Kurdî

Neteweya kurd jî wekî her neteweyên rojhelatî xwedî berhemên mezin ê folklorê ye.Di hemû babet û wêjeya folklorê de xwedî dewlemendîyek mezine.Di seranserî cîhanê de jî xwedî kel û pelên folklorî ên nemire.Sedemê vê yê sereke ewe kû, kurd xwedî şaristanîyekî kevine. Folklor a kurdî jî bi çend dîyalektîk û şêwe zarên cuda re htîye dewlemend kirin. Sedemê direng peydabuna wêjeya nivîsîkî a kurd ewe kû rewşa sîyasî a li kurdistanê ye, ev rewş bû sedemê çîrok û babetên din yên folklorî bi awayekî ser zimanî bimînin. Ev jî mîzanpaja ruberê folklorê fireh kir.Geştyarên bîyanî ên kû dihatin Kurdistan ê gelek hewldan ji bo komkirina folklorê kirine, ew berhemên kû serzarê xelkê bi taybet komkirine.Li Kurdistanê nivîskarên  rojilatnas bi taybetî Rus li pey van berheman digerîyan.Rusan rolekî girîng hebû di derxistina bihayê folklora kurdî de. Em dikarin bêjin: ( Abo Vîyan ), giringîyekî pir daye folklor a kurdî, bi taybetî folklor a Neteweyî.Nunerê Balyozxaneya Rusî ( Alexander Jaba ) li Erzurum'ê gelek materyalên folklorî komkiriye,bi taybetî jî destnivîsên kurdî yên di derbarê beşên foklorê de.[20] Diyare kû Alexander Jaba, bi alîkarîya ( Mele Mehmûd ê Bazidî ) karekî gelek li ser folklor û wêjeya kurdî kirîye,piştre kiriye pirtûk û belav kirîye. Ev pirtûk wergerandî ye ser ziman ê ( Firansî, Elmanî, İngîlîzî ). Ev jî bûye sedemê kû gelên cîhanê kurd û samanên wan yên folklorî nasbikin.

Folklor a kurdî dewlemendîya wê û firehîya wê tenê di sînor û çarçoveyakurdistan ê de nemaye. Lê belê pêşveçun û nûbûna folklora kurdî, netewe û miletên din ê cîhanê jê sud werdigirtin.(N.Y. Mar), yek ji zimannasê Rojhelatnas ê bi nav û deng bû, di sala 1911 ' an de di belavokekê de nivîsîye û wê rastîyê derdixe holê û dibêje: Folklor a kurdî tenê di nava kurdan de belav nebûye,bel kû dinava gelên rojhelat de yên wekî : Ereb, Fars, Azerî, Ermenî û Asurî de jî belav bûye.[21]Ev jî gehiştîye wê rastîyê ,gelê kurd di demê borî de xwedî aqilek û rewşenbîrîyek fireh bûye,hemû rewşên baş û mirovatîya kurdan tê de berdest bûye. Ev jî bû sedemê kû gelên din lêkolîn û sudê ji berhemên folklor a kurdî bibînin.Rojhilatnasan gihiştibûn

---

[20] Şûkrîye Resûl îbrahîm,*Edebî Folklorî kurdî*, B.duyem, Weş.Zankoy Sellahedîn, Hewlêr,1984, r.168.
[21]Îzedîn Mistefa Resûl, *b.n.b.*, r.8.

wê encamê, Folklor a kurdî çavkanîya resen û bihêze ji bo hemû karên wêjeyê, dikarin pişta xwe jê rast bikin.

Ji xeyrî rojhilatnasan di nava kurdistanê de jî gelik lêkolînvan,zana û nivîskar hene, wan jî hewildanek kirîne ji bo nasandina çandû folklora kurdî. Ji van zanayan,Şeref Xan ê Bidlîsî, Mela Mehmudê Bayezîdî, kû her du jî lêkolînvanên zîrek û girîngin. Her wiha berhemên nivîskarên wekî : Ehmedê Xanê, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran , di derbarê Çand û folklor a kurdî de gelek zanyarîyên berçav dane nîşankirin. Di vê derbarê de ( Mem û Zîn )' a Ehmed ê Xanê pir giringe.Ji xeyrî van, Roger Lescot,Celadet Elî Bedirxan,Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl, Hacîyê Cindî,Emînê Evdal,Qanatê Kurdo,Şukrîye Resul îbrahîm û Îzedîn Mistefa Resûl, gelek berhem li ser folklora kurdî nivîsandine û berhemên wanên ciwan hene.[22]

Em di vir de gihiştin wê bawerîyê kû folklor a kurdî wekî deryayek e, em çiqas tê de xwe nuqî bikin biçin binî wê zêde mercan û tişt bi kevin destê me.Sedemê wê jî ewe kû, ew zimanê sade,hêsan û vekirî ye, evê jî wisan kirîye kû ev folklor dem bi dem pişt bi pişt dinava xelkê de bimîne û kevin nebe. Bibe sedemê binyadekî bihêz û fireh ya wêjeya kurdî.

## 1.3.Cûreû Pêkhateyên Folklor'a Kurdî

Folklor a kurdî, wekû folklora hemî gelên din ên cîhanê gelek babet û cureyên cuda di nava xwe de digire. Ev cûre û babet jî ji rastî û taybetmendîyên jîyana xelkê çêdibin.Di destpêkê de jîyana gelanser ruyê xwezayê de li alîyê reftar, hizirîn,û fikirînê de nêzîkî hev bûn.Lê belê hinek sifet û nîşan hebûn kû pêşveçûnên resentîya netewan ji hevdû cuda bikin. Bê goman gelê kurd jî bi heman awayî resentîya folklora xwe parastîye.Hinek cureyên niha, serdemên burî yê jiyana civakî û rewşenbîrî ya wan dide nîşankirin.Em dikarin bi vî awayî folklor a kurdî dabeşî ser çend beşên cuda bikîn.

[22]Atti,*b.n.b.*,r. 6.

### 1.3.1.Efsane

Efsane, kevîntîrîn cûre ye di nava folklor a kurdî de.Zana û lêkolînvanênvê beşê, li ser danîna pênaseyek guncav ya efsaneyê ne gihiştine çi encamekê.Ev jî sedemekê digire, ew lêkolîn û mijarên zana û rexnegirên efsaneyê li ser gihiştîne encamekê ew jî Efsaneya ( Mîtolojî ) 'yê ye.Di nava fikrên wan de cîyawazîyekî dîyar û eşkere derdikeve. Ji ber kû her yek bi rêbazekî cuda efsaneyê dîyar dikin.Hindek hene li gorî wan Efsane,ji tiştên pir û pîç û tiştên bê wate pêk tê. Hindek din jî hene kû li gorî wan Efsane,zanîste û pêwistîya wê bi lêkdana zanîstê û şîrovekirinê heye.Hinek din jî wiha didin xuyakirin kû Efsane, cûreke ji Sêhirbazî û Pîrevoktîyê wisan dibînin kû peywendîyekebi hêz dinavbera wan de heye. Di vê derbarê de zanayê bi nav û deng, ( James G.Frazer 1854-1941 ), dibêje : Efsane, sêhreke kûpeywendîyek bi serdema Adem ve heye.Efsane,di serdema destpêkê de heval û hemfikrê sêhrêye, bi sitiranê sêhrê ye pêşkeftîre berûpêş çûye.[23]( Friedrich Max Muller 1823-1900), dibêje: Efsane bi serdema dînîtîya mejîyê mirovan re tê zanîn.[24]Hinek din hene kû Efsaneyê bi olî ve girêdidin, wisan dibêjin : Efsane, Şîrovekirin û lêkdana sîrûdên ayînî ne, û çavkanîye ji bo fikrên kevin.[25] Lê belê li gorî (Alexander Grab 1894-194), Efsane, her wekî zanîsta berhemê aqil e.[26]Li gorî Îzedîn Mistefa Resul jî Efsane,sedemeke ji bo rewşenbîrî û hişyarkirina civakê ye, efsane hewildaneke ji bo cihan nasîyê.Ji ber vê yekê dibêje: Em dikarin Efsaneyê, wekî hişyarkirina civakê bidin naskirin, efsane hewildanekî ya destpêka mirovatîyê ye, ji bo kû em ji cihanê fêmbikin û wê nasbikin .[27] Di virde ji bo me dide dîyarkirin kû zanayên Efsanenasîyê, lêkolînvan, nivîskar û rexnegir li ser pênaseyek ya efsaneyê ya guncav rêk neketîne.

Di efsaneya kurdî de beramberê dîyardeyên xwezayî de şêweyê sade yê hêsanîya mejîyê mirovan derdikeve holê.Mirov jî di demekê de ji pirsgirêk û buyerên xwezayî fêmnake.Ji ber vê ye kû mirov bi neçarî hizir û xeyalên xwe têxe xebatê, ji bo lêkdan û hurbûna dîyardeyên cûrbicûr yên gerdunê. Ji ber kû mirov di roja

[23]Seyîd Mewlûd Bêxalî, *Efsane û Dastan le Kurdî da*,Weş. Hewlêr,Hewlêr,2013, r.42.
[24]Elwanî, *b.n.b*,r.9.
[25] Mihemed Ebdul Muîd, *El-Esatîr û El- Xûrafîyat* , Dar El-hedase, Beyrût,1981, r.20.
[26] Mewlûd Îbrahîm Hesen, *Geran Be diway Nemirî da*, Weş. Aras, Hewlêr, 2002, r.30.
[27]Îzedîn Mistefa Resûl, *b.n.b.*, r.10.

yekemîn a jîyanê de hewil daye kû xwe nas bike, şûna pîyên xwe di gerdunê de dîyar bike. Li ser buyeran hurbûnê xwe çê bike da kû bikare desthilatdarîya xwe li ser xwezaya wê serdemê de çêbike .[28]

Eger em bi hurî temaşeyê buyerên Efsaneyê bikîn emê bibînin kû şerekî bi hêz di navbera hêza xirab û ya baş de heye.Hêza baş ji mirovên baş û zilamê camêr, ên di serdema Adem de pêktê. Hêza xirab jî ji şerkerên wekî, Dêw, mar, Pîrejina hestî gir pêktê.Mînak a herî berbiçav jî di Efsane ya "*Kawa û Newroz*" de ew şêweyê şer derdikeve holê kû wekî, hemû Efsaneyên din ew ê jî sîma,sifet û cewherê taybet yê bingehîn heye. Ji dijayetîyekî berdewam a di navbera hêza baş û xirab yan jî ( Xêr û Şer ), kû çend buyerên diramatîk nîşan dide re pêktê.Di encamê de vê ji mere radigihîne kû hêza baş hertim ji hêza xirab serkeftîtire .[29] Ji ber wê ye em dikarin bêjin: Efsane hêvîya hemû gelên kevine.Efsane vê tiştê nîşana mirovan dide, tiştên wekî: Şerê di navbera zanîn û ne zanînê de, jîyan û mirinê de, Xwe ji buyerên xweza û gerdûnê re amadkirin. Efsane, peywendîya mirovan û Xudawenda wî,wê, mirov û dîyardeyên xwezayî nîşan dide. Efsane, ji dîroka destpêka mirovayetîyê pêktê. Ev hemû zanîst ji bo me wiha radigihîne kû Efsane,çîrokekî ne bê wate û pir û pûçe. Belkû di nava mejîyê mirovan de dijî û çavkanîya xwe ji mejîyê mirovan digire.

### 1.3.2.Destan

Destan, çîrokekî giring û berfirehe di wêje ya folklor a kurdî de. Destan, piştî Efsaneyê derketîye. Peyva Destan di binyada xwe de ji îranî hatîye , ew jî jêre dibêjin: " *Dasîtan*" yan " *Dastan*".[30] Lê belê dîroknas ,Îzedîn Mistefa Resûlbi vî şêweyî navê Destan'ê dibêje : " *Dastan, Poem yan jî Epos*".Li gorî wî Destan, berhemek ya himbêza çîrokê ye, forma wêneyê jiyana gel û peywendîya civakî, nexşeya pêşdeçuna dîrokê derdixe holê.Di nava destanê de mirada Adem jî derdixe ber çavan .[31] Bûyerên Destan ê bi jîyanê ve girêdayîne, herî zêde qala serpêhatîyên qehreman û dildaran dike.Buyerên wê ecêb û balkêşin, Pelewanên wê jî xwedî

---

[28]Elwanî, *b.n.b*, r.9.
[29]Ehmed Zerdeşt, *Kawa û Newroz Efsaneyî Bîrî Niwê*,Weş. Dezgehê Ruşenbîrî Kurdî, 1999,r.28
[30]Atti,*b.n.b.*, r.10.
[31]Elwanî, *b.n.b*, r.20.

hêzekî bê hempane. Di vir de xedîyên berheman, bûyer û serpêhatîyan bi awayekî lezgîn destnîşan dikin. Ji ber vê jî em dikarin bêjin : Destan, berhemekî wêjeyî ye, bi şêweyekî hunandî û darêjtin rêkxistîye.Qala bûyer û serpêhatîyên lezgîn dike, bûyerên wê ji xeyalên mirovan dure. Şêweyê qehremanan jî bi vî awayî destnîşan dike kû xwedîyê aqil û laşekî bihêz in.[32]

Destan a folklora kurdî beşekî girînge di wêjeya kurdî de, binyadekî baş û xwedî nirxe ji bo berhemên wêjeyî. Destan, di wêjeya folklorî û wêjeya nivîskî a gelande gelek dişibe hev. Em dikarin bêjin dû cûre destan hene.

A. Hinek destanê kurdî bi xwe jî hene ji vana destanên wekî : Destana Memê Alan, Xec û Sîyabend, Zembil Firoş û Derwêşê Evdî...hwd . Ev hemû destanên xwe xweyî ne ji xweyrî kurdan hîç netewek nikare bike malê xwe.

B. Ew destanên kû dinava kurd û gelên wekî : ( Ereb, Fars, Turk û Azerî ) 'de hevbeşin, destanên wekî : Ferhat û Şirîn, Leyl û Mecnûn, Rustem ê Zal...hwd.Ev jî wê nîşan dide kû gelê kurd di babetên folklorî û taybetî babetên destanan de gelek dewlemende, berhemên wan rol û bandorekî pir heye li ser gelên cîran de.

## 1.3.3.Çîrok

Di alîyê dîrok û qalkirinê de ji Efsaneyê nûtire û cihekî berfireh di folklor a kurdî de girtîye.Di gel hatina mirovatîyêre û jîyana gelan re peyda bû ye. Beşekî mezin û fireh ya wêjeya folklorê ye, kû dem bi dem, pişt bi pişt bi me re gihiştîye. Çîrok, di şêweyê pexşanên hunerî de ye, xwedî dîrokek kevine. Çîrokê, xwe di mejîyê mirovan de parastî ye.[33] Di destpêkê de Çîrok wekî berhemek yê ser zimanî bû, di nava civaka mirovayetîyê de serî hildaye.Çîrok bi berhema aqil û hizrê civakê tê zanîn û di roj bi roj, di jîyanê de hatîye.“ *Çîrok neynika serdemê xwe ye,bi*

[32]Ebdulhemîd Yusif, *Mûcem El-folklor*,Weş.El-Heye El-Misrîye, Misr, 2009 , r.458.
[33] Şukrîye Resûl Îbrahîm, *Hîkayetî Folklorî Giyandaran*,Weş. Şivan, Silêmanî, 2005,r.9 .

*derbazbûna her serdemekê re nîşan a wê pêve dîyare. Di taybetmendîya her serdemekê de mijarên; Ayînî, Sîyasî, Reftarî û Ferhengî tê de tê xûyakirin*." [34]

Di çîrokê de gelek caran , qala rol û karekterên xeyalî tên kirin. Hinek caran wekî bi rastî çêbûye tê pêşkêş kirin, hinek car jî heye kû bûyer û serpêhatîyên Çîrokê ji rastîyan durin.Di her demî de, ( Xeyal ) bi binyada çîrokê tê danîn. Xeyal, rolek û bandorek mezin heye di nivîsandin yan jî vegotina Çîrokê de. Ji ber wê ye kû carnan, di alîyê xeyalan de çîrok jî diçe ser efsaneyê ; Her çiqas be jî xeyala çîrokê ji rastîya jîyanê dur nakeve.  Qehremanê çîrokê hinek caran di demê karkirinê de ne bi xwesteka mirovan e.[35]

Babetên Çîrok a kurdî bi giştî ji wan bûyer û karesatan pêk tê; kû di her serdemekê de bi serê gelê kurd û kurdistanê de hatîye. Bûyerên kû hatine serê gelê kurd ne hatîne nivîsandin. Ev babet û Çîrok jî ji alîyên kesên bi hişmend û zîrek ve bi awayekî hunandî hatîye darêjtin. Ji ber kû wan jî di singê xwe de hilgirtiye û heya niha ji bo me maye.Mercên serekî yên çîrokên folklorî jî, cûreyên ziman û şêweyê vegotinê ye. Çîrokbêj, rolekî berçav dibîne di dema xweşkirin û tamkirina çîrokê de. Ji ber kû çîrok, li gorî zîrekî, hizir û vegotina çîrokbêj disekine. Dema kû xelkê gelek daxwaz ji çîrokbêj kiri, gotin : ka çîrokekê ji mere bêje, wê demê çîrokbej jî pê paye bilind dibe. Çîrokbêj jî xweş dibêje, ev jî dibe sedemê kû xelk hemû hest û xeyalên xwe bi çîrokê re derxîne holê.[36] Ew taybetmendî yên kû çîroka folklor a kurdî jê tê cudakirin û naskirin, gelek cûreyên wan taybetmendîyan hene. mînak yên wekî : "*Hebû Tinebû, digirin û dibêjin...hwd"*. Ev gotin jî ji bo me ji bo me didedîyarkirin kû çîrok gelik kevne û dîroka bûyerên wê ne dîyare. her wiha çîrokên folklorî li gel hemû netewan bi gotina "*Hebû Nebû*"  destpê dike,lê belê li ser şêwe zimanê xwe. Mînak, Ereb dibêjin:"*Kan Mekan Fî Qedîm Al Zeman"*, her wiha Faris jî dibêjin : "*Yek bûd Yek Nebû*", îngilîz jî heman destorê dibêjin : "*Once upon time*", hemû di yek wateyê de tên bikaranîn. Hevok a bidawî kirina çîrokê jî ji hevoka "*Mergê we qet qet ne bînîm*".[37]

---

[34] Haşim Selîm ,*Çîrok û Efsaneyî Mokryan*,Weş.Serdem, Silêmanî, 2013, r.24.
[35] Îzedîn Mistefa Resûl, *b.n.b.*, r.9
[36] Tariq Cambaz, *Hîkayetên Kurdî û Motîvayekan Lêdwan û Çend Hîkayetek*,"Govarî Rewşenbîrî Niwê", J.110, sal,1998, r.161.
[37] Mihemed Ferîq Hesen, *Memleketî Masî*, Weş. Aras, Hewlêr, 2010 ,r.26.

Zaravayên çîrokê di çend şêwazên cîyawaz yê cuda de tê bikaranîn.Mînak : İngilîz jêre dibêjin :“ *Tale-Story* ” , Ereb jî jêre dibejin : “*Hîkaye yan Qise*” , Tirk jî jêre dibêjin : “ *Hikaye* ” . Her wiha “*Di nava kurdan de jî jêre dibêjin: Hikayet (Neqil), kurdên "Lor " jî jêre dibêjin: Metelok.*” [38]

Ji alîyê zana, lêkolînvan û nivîskaranve çîroka folklorê dabeşî bi ser çend beşên cuda kirîne.Ji vana lêkolînvanê Elman,( Fondy ) di lêkolîna xwe ya jêr navê (Saykolocîyayî Miletan ) ' de Çîrok dabeşî bi ser çend cûreyan kirîye. Wekî li jêr me dîyarkirîye.

1. Çîrokên Mîtolojî ( Mythologische Fabelmarchen).
2. Çîrokên Sêhrbazî û Efsaneyî ( Zaubermarchen Rein).
3. Efsane û Çîrokên Bîyolojî ( Biologische Marchen und Abeln).
4. Çîrokên Ajalan
5. Çîrokên Resen Yên Eşîr û Gelan ( Abstam Mangsmarchen).
6. Çîrokên Pêkenînok û Keyfxweşî (Scherb Marchen und Scherz Fabeln).
7. Çîrokên Reftraî (Mcrolisch Fablen ). [39]

Nivîskarên kurdan jî di derbarê Çîroka folklor a kurdî de xwedî çend fikrên cuda ne, wan jî ev beş dabeş kirîye. Ji van nivîskaran yek jî ( Qanatê Kurdo )' ye kû wî jî ev beş dabeşî bi ser çend beşande kirîye.

1. Çîrok û Hîkayeta derheqê jîyana însanî de, derheqê jîyan a ayîna wan de.
2. Çîrok û Hîkayeta Tarîxî.
3. Çîrok û Hîkayeta Efsanewî û Xeyalbazî.
4. Çîrok û Hîkayeta Derheqê Heywanan teyr û tuwalan. [40]

---

[38] İzedîn Mistefa Resûl, *b.n.b.*, r.15.
[39] Cemîl Mihemed Şîlazî*, Çend Vekolînek Di Çîrokên Folklorî Kurdî de,* Weş. Şivan, Silêmanî, 2003,r.37.
[40] Şîlazî, *b.n.b,* r.38.

Li gorî ( Elî Cizîrî ) Çîroka Kurdî, dikare bi gelik şêweyan cuda û beş bibe. Ji van beşan yên herî girîng jî evin.

1. Çîrokên pirû pûçên bê bawerî.
2. Çîrokên Ajalan yên bi nav û deng.
3. Çîrokên Efsanewî.
4. Çîrokên Civakî.
5. Çîrokên Mamik ( Metelok )
6. Çîrokên Pend û gotinên mezinan.
7. Çîrokên Henekî û pêkenok.
8. Çîrokên Qehremantî. [41]

### 1.3.4.Sitran

Sitran jî, di nava beşên din ên folklor a kurdî de, cihekî dîyar û bilind heye. Di nava jîyana kurdan de beşekî herî kevin û dewlemend e.Ev jî rewşa jîyana kurdan digire nava xwe, kû di alîyê ziman de xwedîyê gelek şêwezara ne. Di alîyek din de jî kevintîya Sitran ê û peydabuna wê wisan kirîye kû, di nava wêjeya netewî de xwedîyê wê ne dîyar be. Sitran,dem bi dem, pişt bi pişt, diçe nava wêjeya folklorê û xezîneya wê dewlemend dike. Ev hemû jî bûye sedemê kû Sitran, dinava kurdan de belav bibe. Sitranan, di nava kurdan de xweşî, şadî peyda kirîye û derûnîya wan aram kirîye.Di vê derbarê de zana û rojhilatzan Ermenî ( Abo Vîyan ), dibêje: Her kurdek, yan jî pîremê,xwedevanê wan rihê helbestvantîyê dinava sing û deronîya wan de heye.Hemû dikarin Sitranan bêjin,ew bawerî di wan de heye. Ev hemû ji nava hiş û derûnîya wan re derdikeve holê.[42]

Di serdemên borî de, mirovan demê karkirina rojane de , yan demê di westan û di civatan de stran digotin. Sitranên wan li gorî cûrê karkirinê bûn, yan jî li gorî rewşa herêmê bûn.Stran û awazên wan di şêweyekî hunandina sade de bû. Ji ber vê jî, " *Derketin yan jî serîhildana Sitiran ê di wê demê de derdikeve,ew demê kû hest bi*

---

[41] Elî Cizîrî, *El- Edeb El-Şefahî El- Kurdî*, Ç.2, Weş.Ofsêt Hewlêr, Hewlêr,2000,r.190-191.
[42] Îzedîn Mistefa Resûl, *b.n.b.*, r.7.

*xweşî yan nexweşî û êşên jîyanê tê kirin de. Sedemê wateya wê jî bandorîya dengên xwezayî ye. Karîye bi van re sitiran û awazan çê bikin*” [43] . Sitranan peywendîyekî berçav bi jiyana civakî, binyada gelan ve heye. Rol û bandorîyekî mezin li ser hişyarkirin û rakirina serpîyan a gelan de heye. Bi taybetî jî sitranên kû li ser qehremanên kurdan hatine çêkirin, di demê ceng û şer de. Ji ber kû sitranên kurdî mirov dihejîne, Xizînê têxe cigerê û tamekî xweş ji dil dinav de heye. Ji ber kû di nava singê jîyana kurdewarî de tê çêkirin û demê borî ji mere radigihîne.[44]

Her netewek xwedî stranên folklorî ne,hemû jî pişt jigel digire. Sitran, wekî neynika gel, zarok,ciwan û pîrane. Hestên jidil di nava sitranê de derdikevin holê. Bi vê re Sitran ji berhemên din ên wêjeyî tê cuda kirin. Dirok ji bo Stranên,çalekîya jîyana mirovan û karên wan yê rojane re hatîye danîn. Ji ber vê ye ligorî hinek zanayan wisan e: Sitranên Şivanan kevintirîn cûrê stranê ye, Ji ber kû li gorî wan ji çanda çandinîyê kevintire.Li gorî hinek zanayên din Şivan,xwedîkirina mih û heywan jî beşek ji çanda çandinîyê ye... Di zanîsta folklornasîyê de dû fikrên cûda yên derketina Sitranê heye. Ew her duk fikir jî ew kû Sitranên karkirinêcûreya herî kevne, li gorî yên din jî sitranên Olî cûreya herî kevn e.[45]

Di alîyê naverokê de em dikarin Sitranên folklor a kurdi dabeşî ser çend beşên jêr bikin.

1. Sitranên Ayînî.
2. Sitranên Dawetan.
3. Sitranên Evînî.
4. Çawenî ya Xwezayê.
5. Sitranên Lîstikan.
6. Sitranên Zarokan.
7. Sitranên Baran barînê. [46].

---

[43] Şûkrîye Resûl Îbrahîm,*b.n.b*, r.78.
[44] Yasîn Hesen Goran,*Lawikû Sitiranên Kurdewarî*, Weş. Rewşenbîrî, Hewlêr,1997,r.4.
[45]Îzedîn Mistefa Resûl, *b.n.b.*, r.43.
[46]Îdrîs Ebdula, *Edebî Mîlî û Folklorî*, B.3,Weş.Hacî Haşim,Hewlêr, 2014,r.121.129.

### 1.3.5.Gotinên Pêşîyan

Di nava folklor a kurdî de, (Gotinên Pêşîyan ), Ji hemû beşên din zêdetir girîngî pê hatîye dayîn û hatîye komkirin. Beşekî serekî û zindîye di hunera netewa me de.Di hemû alîyekê de belav bûye, û fikrekî yê felsefeya kûr tê de heye. Ji bo jîyana mezin yan biçûk a mirovan buye binyadek ya zagona mezin . Çend gotinên kurtyên kurdî ne kû bi hev ve hatine girêdan û wateyekî bilind û mezin hene. Di demekî pir kevin de ketîye ser zimanê kurdan. Di çend alîyên cuda de xwe nîşan didin, Mînak : Çawatî ya jîyanê, Exlaq, fikir û bawerî, derbarê sîyasî û civakî,derbarê exlaqê xêzanê, zengînî û hejarî de dîyar dibin.[47] Ev jî vê radigihîne kû Pendên Pêşîyan û Gotinên mezinan , di hemû alîyên jîyanê de bûye neynik. Bû ye sedemê çareserkirina hemû buyer û serpêhatîyên civaka mirovatîyêû di alîyê civakî,sîyasî û aborî de.

Gelê kurd,di Pendên Pêşîyan û gotinên mezinan de xwedîyê sermayeyekî gelik dewlemendin.Sedemê vê jî hebûna gelek "Dîyalektîk " û şêwezarane di kurdistanê de.Kurdan karîye di her çar alîyên kurdistanê de, yan jî her navçeyek yên wê de " Pend" an çêbikin. Ji ber kû,zimanê kurdî dabeşî biser çar beşên serekî de dibin. Her zaravayek ji çend şêwezaran pêk hatîye.Ji ber vê sedemê ye kû zimanê wan dewlemend bûye,di nava wan de çend Pendên cûrbicûr derketîne holêû mil daye bi milê wêjeyên din.[48]Cûreyê hizirîn û hişyarkirina rewşenbîrîya xelkê,di serdemên cuda cuda de nîşan daye. bûye sedemê çareserkirina pirsgirêkan bi şêweyekî rast û hekîmyane.

Dîyar e pendê pêşîya û gotinên mezina di Kurdistanê de, cihekî taybet yê xwe heye û biçend şeklên cuda cuda derdikevin holê.Lê belê di naverok û xwestekê de heman wate dîyar dibe. Mînak: “ *Di Kurdistana Îraq û Îran ê de ji ( Pendên pêşîyan û gotinên mezinan ) re dibêjin, ( Bêj û Pend ), kurdên Bakur û Ermenîstanê jî jêre dibêjin:( Gotinên Bavan ) yan jî ( Mesele û Metelok) ,kurdên Azerbaycan û yên welatên Asya ya naverast jî jêre di bêjin :( Gepîdî Bavan ).”*[49]

---

[47] Eladîn Secadî, *Mêjoyî Edebî Kurdî*, Weş. Întişarat Kurdistan, Sendec, Îran, 1391,r.139.
[48] Sefer Hawarî, *Pendî pêşînan Le deverî Hewreman da,*”Govarî Asûyî Folklorî ”, J.5, S. 2001,r.127.
[49] Şûkrîye Resûl Îbrahîm,*b.n.b*, r.5.

Pendên pêşîyan û gotinên mezinan, armanc û xwestekên wê ê dîyar hene.Di nîşankirina şiret û perwerdekirina mirovan de,di her rewşa jîyana mirovan de tê dîyarkirin. Jiber kû ev pendane di encama ezmuna jîyana bab û bapîrande derketîye holê. Gelek biha û rêyên civakî di nav xwe de digire, ji bo hilbijartina rêya rast û dirist di jîyanê de. ji ber kû,"*Pendên Pêşiyan bandorîyek a perwerdê heye,gel bi rêya Pendên Pêşîyan zarokên xwe perwerde dike*."[50] .

Em dikarin bêjin pendên pêşîyan û gotinên mezinan amojgarîyekî bi sud û bi bandor e. Ji ber kû ji derûnîyekî aram û mejîyekî zîrekçavkanî girtîye. Wateya wan jî ji ber kû gelek sade ne, mirov dikare zû jiber bike. Hemû kes dikarin jiber bikin û bêjin, çi biçûk çi mezin be.

### 1.3.6.Pêkenok

Pêkenok, coreke ji cûreyan giring ê wêjeya folklorê , di wêjeya hemû gelan de heye. Beşekî bi nirxê ser zimanê xelkê ye û ji alîyê hemû çînên civakê ve bikartê. Sedemeke ji bo derxistina rexne, û çewtîyên di jîyana civakî de. Her ji bo wê ye, pêkenok û gotinên xweş,ew jîwekî hercûreyandin neynika folklorê ye. Jîyana civaka Adem û jîyana gel di hemû alîyan de dîyar dike.Di nava civakê de, sedeme ke ji bo rexne girtin li ne wekhevî, ne hemfikrî di jîyana zordaran de. Naveroka Pêkenokê jî gelek babetan di nava xwe de digire, Mînak : Ramyarî, Civakî û Aborî .[51]Pêkenok dinava xwede hinek alîyan digire. karên xirap di pêşkêşkirinên cuda cuda de nagihîne cih. Bi cûrekê, bi awayê pêkenîn û henekî, rexneyên giran pêşkêşî karên xirap,civak, mirovên sade û yên pilebilind dike. Herî zêde xwesteka wê ewe kû ,karên xirab nehêle di nava civakê de, civakê berbi başîyê ve bibe.[52]

Derketina gotinên xweş û pêkenokê xwedî dîrokekî kevne. ew jî bi derketina mirovahîyê re derketîye. Ji ber vê jî, folklor a Pêkenokê di kevinde di nava kurdan de heye. Piştî wê mirov ji çanda " Neolotîk " bûn. Edî jîyana li ber agir û meclîsa şevan

---

[50] Şûkrîye Resûl Îbrahîm,*b.n.b*, r.5.
[51]Mukrî,*b.n.b*, r.88.
[52]Elwanî, *b.n.b*, r.76.

destpêkir. Ev ê jî bandorîyekî zêde li ser xelkê kir. Ji ber kû kê di wê rojê de tiştek bi bihîsta û bidîta,bi şev dihat di meclîsê de bi awayekî xweş digot û dirêj dikir. [53]

Şêwazê rexn ê di pêkenokê de,cudaye ji cureyên din yên rexnegirtinê. Ji ber kû rexneyên pêkenokê bi awayekî xweşî û dil xweşî wekî şêweyê amojgarî bû. Peyvên giran di rexneyên pêkenokê de cih nedigirt. Ji ber kû,cêyawazîya di navbera pêkenok û Çîrok, Efsane, û pendên pêşîyan de ewe kû, hemû pirsgirêkên mirovan naxe berçavan,hêvî û daxwaza mirovan di pirsgirêkan de çareser dike. Lê belê pêkenok bi wê pêkenînê bandorîyekî zêde têxe li ser temaşevanan,herî zêde dinava jîyana xelkê de jîyan dike.[54]

Qehremanên pêkenokê jî hemû ew navên kû zindî ne. Di jîyana rojane a mirovan de rolê wan yê dîyar heye û berçave. Di pêkenok,gotinên xweş û kenwerî " Komedî " yê de qehremanên wan di nava civakên cuda de hene. Mînak : " *Di nava kurdan de qehremanê pêkenokê Melayê Meşur e , di nava Ereban de jî Cha yan Chaî Romî ), her wiha di nava Tirk û Azerîyan de jî Hoca Nesredîn, Mele Nesredîn, Neserdîn Efendî*." [55]hene. Em dikarin bêjin, di nava gelên cîhanê de,qehremanên pêkenokê gotinê taybet ên xweş yên wan hene.Gotinên wan di nava civakan de xwedî paye û pileyên bilindin,bi çavekî mezin li wan tên temaşekirin.

### 1.3.7.Mamik

Mamik, berhemekî ya wêjeya folklorêa resene. Beşeke ji wêjeya ne hatî nivîsîne,herî zêde ji bo derbazkirina wext û aramkirina mejî hatî ye bikaranîn. Şevên meclisan bi metelokan hatîne germkirin û derbazkirin. Ev berhem jî dem bi dem, pişt bi pişt belav bûye. Şekil, şonpêyên cih û wextê serdema wê pêve dîyare. Mamikê di encama peşketina hiş û hizrê mirovan re derketî ye.Mamik bi şêweyê pirsyar hatîye çêkirin,her dem li benda bersiva kesê beramber dimîne. Wateya wê jî," *Mamik ,ew kurte axaftineye kû bi pirsyar û nîşan qala wê tê kirine.Piştre jî di pirse*

[53] CemalBaban, Galtewkep û Danisqayî Kurdewarî, Çapxaneî Şifa, Silêmanî, 2010,r.8-7.
[54]Mukrî *b.n.b*, r.98.
[55]Îzedîn Mistefa Resûl,*b.n.b.*, r.9.

*ka ew tişt çîye*."[56] Li gorî hinek di" *Mamik , Folklor a pirsên mijarên folklorîye. Bi şêweyê hunandî û pexşan li hevdayîye*." [57]

Mamik ,dialîyekê de wekî babetekî ji bo nirxandina zîrekî û fikrên tûj yên kesên civakê ye.Di alîyê din de jî di her metelokê de waneyek heye kû dide xûyakirin.Ev jî ji bo dîyarkirina kesên jîr û ne jîre. Metelok, di kevin de ji alîyê kesên zîrek, zana, bi hişmend ve hatîye danîn.Bi vê re jî karîye cihê xwe di hemû alîyan de bike. Ji ber kû, çûye di nava hemû babetên zanistî de, Mînak, zanistên wekî, Ziman, Bîrkarî û Sitêrknasî...hwd.[58]

Mamik, di naverokê de armancekî taybet heye. Bi zîrekî û zanîna mirovan re çêbûye, sûd ji amêrên babetên jîyanê wergirtîye. Ji bo peydakirin wan tiştên ne dîyar û wan tiştan bînîn bi awayekî zanistî çê bikin. Mamik, di naverokê de du cûre ye. Cûreyek xwestek e, cûreya din jî ji bo rahênana mejîye . Lê belê di alîyê rû de di şeklê hunerî de gelik wêneyan dikêşe û peyvan dicihê xwe de bikartîne. [59] Em dikarin bi metelokan gelek peyvên nû û resen bêxin di nava wêjeya xwe de. Bi şêweyekî baştir em dikarin parastina zimanê kurdî bikin.

## 1.4.Perwerdekirina Zarokan

Perwerdekirina zarokan erkekî însanetî ye. Pirojeyeke di destpêka jîyana mirovan de destpê dike . Perwerde, zanîstek serbixweye berhemekî mirovatîye. Bêyî nebuna perwerdê, çi gel nîne kû jîyana xwe bi awayekî pêşketî û serkeftî derbaz bike. Ji ber kû sedemê mayîna mirova, çêkirina nivşê nû ye, çand, huner û zanyarîyan nivş bi nivş li gel xwe dibin. Perwerde, di berdewamîya şaristanî û mirovatîyê de hêvî û bawerîyeke. Perwerde, rêyeke ji bo pêşxistina erkê mirovatî, şaristanî û çandî. Pêwîste zarok bi perwerdekirinekî rast bê perwerdekirin, ji ber kû civaka kû bixwaze di pêşerojê de pêşketî be, pêwîste destpêkê de zarokên xwe bi awayekî baş perwerde bikin, *" Zarok pêşeroja civakane "* . Hemû netew û gelek bi nûjenîyê berû pêş diçin.

---

[56] Îdrîs Ebdula, *Edebî Mîlî û Folklorî*, B.1,Weş. Hacî Haşim,Hewlêr, 2014,r.271.
[57]Sedredîn Nuredîn Ebubekir,*b.n.b*,, r.33.
[58] Taha Ehmet Berzencî, *Metel*, "Govarî Keluporî Kurd", J. 57, S.1995,r.41.
[59] Mukrî, *b.n.b.*,r.104.

Perwerde, ji bo zarokan di destpêkê de di malbatê de destpê dike, heya digehe dibistanê.[60]

### 1.4.1.Peyv û zaravayên perwerdeyê

Peyva ( Perwerde ) , di zimanê ingilîzî de tê wateya " *Education* " , ev peyv di zimanê ingilîzî de gelek wateyên wê hene. Mînak:*" Perwerde, Perwerdekirin, Fêrkirin, Xwendekarî, Rewşenbîrî, Zanîst, Zanyarî, Ferheng û Berhemên hizirînê " . Di zimanê Erebî de jî bi wateya ( El-terbîye ), kû ji sê binyadan çavkanî girtîye. Yekem " Riba-Îrbo", tê wateya " pêşveçun, Mezinbûn, zêdebûn û Tê perwerdekirin ", ya Duwem jî " Rabî- Îrbî ", tê wateya "Nûjenî, Ket ser linga, Perwerde bû, hat perwerdekirin", Sêyem jî "Rb- îrb" , kû tê wateya " Başî kir, Perwerde kir."*[61] .

### 1.4.2.Pênaseyên Perwerdeyê

Beş û pênaseyên perwerdê li gorî dem û cihê civakê tê gohertin. Ji ber kû her Nivîskarê kû babetek li ser perwerdê çêkirî be, li gorî dem û cihê civaka xwe pênaseya perwerdê kirîye. Ji bo wê ye em dixwazin pênaseyek ya perwerdê bi awayekî giştî bikin. Em ê pêşberî gelik pênaseyên perwerdê werin, kû heryek di alîyê felsefe û îdeolojî yê ve hatîye kirin. Lê belê hemû pênaseyên perwerdê di binyat û binçîneya xwede hevbeşîn.

1. Perwerde taybete ji bo cureyên mirovan.
2. Xizmetên perwedê ji bo kit û kome.
3. Karekî berdewam û xwedî armance.
4. Ji bo ragihandinek rast ya laş û jîrîya mirovane.
5. Cihê Fêrbûna Perwerdê ( Mal, Dibistan û Civake ).[62]

---

[60] Suhêl Tahir Ebdula,*Perwerde Le Serdemekî Metirsîdar Da*,Weş.Xanî; Dihok, r.22.
[61]Ezîz alanî,*Perwerdeî Mndalekanman*, Weş. Çarçira, Silêmanî,2014,r. 24-25
[62]Alanî, *b.n.b.*, r.186.

Destpêkê de ji bo zêde naskirina beşên perwerdê, pêwiste em ji Fîlozofên kevin destpê bikin. Di vê derbarê de em dikarin çend pênase û qalkirinekê bigirin dest.

Eflatûn ( Platon ) " 347-427 " em dikarin bêjin yekem Fîlozofê kû giringî bi perwerdê daye. Bi vî awayî li ser perwerdê dibêje: Perwerde, qonaxa fêrbûnê ye,hewildanekî xwestekîya kevine ji bo anîna dava başîya jîyanê. Herwiha avakirina ezmûnên hukmetîne ji bo nivşê nû.[63]Di alîyek din de jî li gorî wî, pêwiste perwerdekirina zaroka jî temenê 7 salî heya 18 di bin çavdêrîya dewlet û mîran de be.

Perwerdekirina rast ya hemwelatîyên baş û bi sûd,pêwîstî bi şêwazê rêbazek ya taybet heye. Pêwîste li pey vî fikrî lê bigere. [64] . Her wiha (Aristoteles - Aristotle 384-322 ) Fîlozofek din yê " Yunanî " ye,di derbarê giringîya perwerdê de dibêje: Xwesteka Perewedekirinê ewe kû, mirov bi kare encamekî baş û tiştên bi sud di şer û aşitîyê de bigire.Ev jî mirovan digihîne cihê bextewarîyê.[65]Di vir de ji her dû pênaseyên Fîlozofên Yunanî ( Eflatun û Aristo ) ev derdikeve holê. Ewan giringîyekî zede bi perwerdê dayîne, bi çavekî bilind û balkêş temaşeyê giringîya perwerdê kirîne. Dibêjin, perwede sedemekî baş û cihê bextewarîyê ye ji bo mirovan.

Jean Jacques Rousseau ( 1712- 1778 ) , wekî xwedîyê perwedeya Rojavaya nû tê naskirin.Li ser navê perwerdê di pirtûka xwe ya bi navê ( Îmêl ) de dibêje: Armanca perwerdê çêkirina mirovekî tame, perwerde hemû çewtîyên dinava mirovan de xilas dike, ji bo pêşveçuna mirovan dixwezayê de. Perwerdeya yekem jî dema zarok ji dayîk dibe heya digihe temenê 12 salî destpê dike. [66]

Di derbarê perwerdekirina zarokan de, Email P. Littre ( 1801-1881 ), dibêje: Perwerdekarî fêrkirina zarok û ciwanane, bi awayekî sûd ji bo xwe û civakê heye . Lê belê armanca perwerdê li gorî Fîlozofê mezin ê Elmanî, İmmanuel Kant (1724-1804), Pêşveçuna mirove ji bo gihiştina pileyekî bilind û têgihiştî.[67]

---

[63] Eflatun,*Komar*,Wer.Suran Emer Heme, Rêbwar Qaraman, Hesen Çomanî, Weş.Wezaretî Perwerde,Hewlêr, 2006, r.132.

[64] Kerîm Şerîf Qereçatan, *Saykolojiyetî Mindal*, Beşa yekem, Weş.Zanko, Slêmanî,1997,r. 8.

[65] Ebdula Rşdan,*Îlim El-Îçtimae El- Terbiye*,Weş. Dar Alşruq, Eman,El-Erden, 1999,r. 39.

[66] Yusif Osman Hemed,*Tîorekanî Perwerde û Ferkirin*, Ç.1, Weş.Asoy Perwerde, Hewlêr,2006,r.27.

[67] Îman Biqaî,*Fen Qise El-Etfal*, Weş.Dar El-Hadî ,Beîrut,Lûbnan ,2004,.r.65.

Friedrich Welhelm Froeble ( 1801-1881 ), li gundekî yê Elmanya ji dayîk bûye. Yekem destura fêrkirina perwerdê ji bo zarokan danîye. Wekî bavê zarokên bextewer tê zanîn,li gorî wî : Perwerde, di be sedemê kû derxistina ew zîrekîya di zarokan de. Xurtbûna di nava zarokan de derdixe holê. karê perwerdê jî derxistin û nîşankirina xurtîya wan ne.[68] Li gorî fikrê, ( Froble ) kû dibêje: Perwerda herî pîroz perwerda zarokan ne, kû ew jî di rêya baxçê zarokan de ye. Her wiha li gel wê tiştê ye kû, Perwerda ji bo zarokan pêwîste ya heri baş û berfireh be.[69]

Ayetên Qurana pîroz jî bal kişandîye ser giringîya perwerdekirina zarokan. Disan balkêşî daye ser reftarê zarokan di perwerdekirinê de. Zanayên Ayînî jî misoger dikin û dibêjin : Pêwîste sûdekî giring ji xurtîya zarokan bê girtin. ( Îmamê Elî ), rizaya Xwedê Teela li ser be, di fermîne :“ *Dilê zarokan wekî zevîyekê ye her çi tiştî tû fêrî wan bikî wê ew tişt bimîne dinav singê wan de*.”[70].

Zarok hebûna paşerojê ye. Pêwîste zarok bi şêweyekî rêkûpêk û baş bê perwerdekirin.Berî her tiştî pêwîste mafên zarokan bên dayîn. Bêyî kû cêyawazîya reng, ol,netew û pêwîste bi çavekî wekhev li zarokan bê temaşekirin. Pêwîste zemînek baş ji bo zarokan bê danîn, ji ber kû ew zemîn dibe sedemê xurtî û pêşketina zarokan.[71] Bi çi şêweyî na be tû bi hişkî bi ser zarokan de biçî.bê goman ev berpirsyartî hemû dikeve li ser milê dayîk û bav. Ji ber kû dema kû zarok bi awayekî baş bê mezinkirin, wê di pêşerojê de kesayetîyekî baş jê derbikeve.Eger zarok bi awayekî xirap hat mezinkirin, wê kesayetekî nebaş,derewîn,nexweş jê derbikeve û heya mirinê wê zererê bide dayîk û bav.[72]

---

[68] Yusif Osman Hemed,*b.n.b.*, r.5.
[69] Yusif Osman Hemed, *b.n.b.*, r.55.
[70] Mehemed Şerîf Sewaf,*Perwerdeî Mindal u Herzekarî*, Weş. Wezaretî Perwerde,2004,r.39.
[71] Alanî,*b.n.b.*, r.29.
[72] Kerîm Şerîf Qereçatanî*, Saykolîcya ûPerwerdeî Mndalan*, Weş. Peywend, Silêmanî ,2011, r.11.

### 1.4.3.Şêwazên Perwedekirina Zarokan

Di her gel û netewan de şêwzên cûda û taybet yê perwerde kirina zarokan heye. Lê belê heya niha jî dinava civaka kurd de, şêweyek yê perwerde kirina zarokan wekî pêwîst nîne. Nekarîye mafên zarokan bi temamî bi cih bike. Sedemê vê jî ewe kû, ji alîyê dayîk, bav, civak û kesên peywedidar ve pîlan û bernamên baş nehatîne danîn. Dayîk û bavan ji bo pêşeroja zarokên xwe, pîlan û bernameyên baş nedanîne. Ev zarok wê di pêşerojê de çi bi serî de were, bi taybetî alîyê derûnîya wî wê çawa be nayê zanîn. Ev ji hemû nedanîna pîlan û bernama ye.Ev hemû pirsgirêkin ji bo nivşê nû. Li gorî hinek zanayan: Jibîrkirina zarokan di demê perwerde kirinê û fêrkirinê de, dijmintîyekî mezin e li gel nivşê nû.[73]

Bê goman ji bo perwerde kirina zarokên me geli şêweyên cûrbicûr hene. Bi vê re em dikarin çend rêyên perwerde kirina zarokan bêxin ber çavan.

1. **Perwerde kirina bi mînakên baş û ciwan :**Mînak, ji zarokan re qalkirina kesên binav û deng, xwedî kesayetek bilind û baş.

2. **Perwerde kirina bi xelat yan jî bi ceza :** Ev jî bi xelat dayîn û sezakirina zarokan ve girêdayî ye, dema kû karekî baş yan xirap dikin. Dema kû zarok karên xirap dikin tên sezakirin, ev jî dibe sedemê kû xwe ji karên xirap dur bigirin yan jî biparêzin.

3. **Perwerde kirina bi amojagrî .**

4. **Perwerde kirina bi mînakên bûyer:**wekî îbret bi serê kesekê de hatî û jê ders girtî.

5. **Perwerde kirina bi Çîrok :** Wekî pendekê ders jê bigire.[74]

Perwerde hebûna jîyanê ye. Ji bo jîyanê sedemekî ya pêşketin û berdewamî yê ye. Eger em bixwazin bibin xwedî civakekî hawçer û pêşkeftî, pêwîst e di

[73] Mehemed Reşîd Fetah, *Nimûne û Lêkolînewe Le Edebî Mindalanî Kurd*,Weş.Roşenbîrî, Hewlêr, 2009,r.6.
[74] Suhêl Tahir Abdula,*b.n.b.*, r.15.

destpêkê de em ji bo zarokên xwe perwerdeyekî goncav daynin. Pêwîst e em hemû şêwazên zanistî bikarbînin ji bo zarokên xwe, da kû em jîyanek bextewar û xweş di pêşeroja wan de ava bikin. Bê goman dayîk û bavên perwerdekirî rolekî sereke dilehîzin ji bo vê armanca pîroz.

# BEŞA DUYEM

## 2.PÊŞVEÇÛN Û GEŞEDANA ZAROKAN

### 2.1.Pêşveçûn û Qonaxên Jîyan a Zarokan

Di jîyanê de hemû kes di zarokatî ya xwe de, di qonaxên giring,nazik û hestyar re derbaz dibin, heya kû navê zarokatî li ser wan diçin. Zarok di çend qûnaxên pêşketî yên cûda de derbaz dibin. Her yek ji van qonaxan xasyet û taybetmendîyên xwe heye, ev jî cudaye ji qonaxên din.

Dema hatina dayîk û bavan ya li gel hevre, zarok di keve zigê dayîkê, ji wê dayîkê re dibêjin : "Du canî" .Zarok 9 mehan di zigê dayîka xwede dimîne û piştre tê dunya yê. Em di virde nizanî wekî pêwîst qala hemû qonaxên zarokan bikîn. Ji ber kû: Pêşveçûn, wekî zincîrekê di goherîna deronî û laş deye.Fîzyolojî,jîrî, Reftar (Exlaq ) û civak hemû kes bi van re derbaz bû ye.[75] Bi van hemûyan re jî em nikarin bi başî qonaxên zarokan dîyar bikin. Ji ber kû demên pêşveçûnê di hemû zarokan de cûdaye. Ev cûdayî jî peywendî bi Fîzyolojîya zarokan re heye. Her qonaxek, sîfetû taybetmendîyên xwe cûdaye ji qonaxên din.Em dikarin tenê di temene kê de qala zarokan bikin,dema kû zarok hest bi xwe û zimanê xwe dike. Dema kû pewerde û amrazên perwerdê bandorek li ser hebe.

Zanayên perwerdê û yên Derûnasîyê ( Pîskolojî ),bi çend binyadên cûda qonaxên zarokan dabeşî bi ser çend beşan de kirîne. Her yek ji van beşan pişt biçend binyad û belgeyên zanistî, derûnî ve girêdaye. Hemû jî li ser qonaxên zarokan bûne yek, lê ne karîne pêşveçûnên qonaxên zarokan bi şêweyekî rastji hev cuda bikin û sînorekî dîyar ji bo wan dîyar bikin. Qonaxên pêşveçûna zarokan li gorî her zarokekê cudaye.Lêkolînvanan bihorî hest bi van cudahîyan kirîye.Ev cudahî jî ji salekê na bore. Mînak : Hinek zana van qonaxan dabeşî bi ser çend salan dikin, " *3-6 sal, 6-9 sal, 9-12 sal*."[76]

Lê belê hinek din jî van qonaxan bi ser van salan de dabeş kirîne,*" 3-5 sal, 6-8 sal, 8-12 sal.*"[77] Bê goman ev cudahî dina pêşveçûnên qonaxên zarokan de heye,

[75] Besam Benî Yasîn û Axeron, *Turq Diraset El-Tifil*,Weş.Dar El-Meysere, El_Erden, 2002, r.13.
[76] Ehmed Necîb, *Fen El-Kitabe Lîl Etfal*, Weş. Dar El-Kutb,Qahire,1968, r.25.
[77] Ebdulftah Abu Mehel, *Edeb El-Etfal* , Weş. Dar El-Şrûq, Eman, 2001, r.34.

rolekî mezin dibînîn li ser pêşveçûna mejîyê zarokan. Pêwîste Çîrok, li gorî temenê zarokan bi wan were guhdar kirin.Ev çîrok jî di astekî bilind û goncav de be.

Zana û lêkolînvanan li ser dabeş kirina qonaxên pêşveçûnên zarokan ne gihiştne encamekê. Ji ber vê yekê her yekê li gorî fikrê xwe û zanyarîyên xwe ev qonaxne da beş kirîne.

- Erik H. Erikson ( 1902-1994 ), bi rêbaza pêşveçûnên derûnîya civakê, (Pyschosocial Development ) qonaxa pêşveçûnê li gorî temenê zarokan dabeş kirîye.

1. Ji dayîk bûnê heya 18 mehî.
2. Ji 18 mehî heya 3 salî.
3. Ji 3 salî heya 6 salî
4. ji 6 salî heya 12 salî.
5. Ji 12 salî heya 18 salî.[78]

- Gean Piaget ( 1896- 1980 ) , li gorî binyata rêbaza pêşveçûna jîrî, ( Threoy of Congnitive Development ), bi vî awayî pêşveçûnên zarokan beş kirîye.

1. Ji dayîkbûnê heya 2 salî.
2. Ji 2 salî heya 7 salî.
3. Ji 7 salî heya 11 salî.
4. Ji 4 salî heya 14 salî.[79]

- Sigismund S. Freud ( 1939- 1856 ), li ser binyada şîrovekirina derûnî yê (Psychoanalysis) , qonaxên pêşveçûna zarokan bi vî awayî dabeş kirîye.

1. Qonaxa şîr vexwarinê. *( in Fantil Stage )*
2. Qonaxa zarokatîya zû. *( Toddler Stage )*
3. Qonaxa Pêş çûyîna dibistanê. *( Preschool Stage )*
4. Qonaxa dibistan a Seretayî. *( School Age Child )*
5. Qonaxa Baliqbûnê. *( Adolescences ).*[80]

---

[78] Fazil Mecîd Mahmûd,*Şiirî Mindalan Le Edebî Kurdî da*, Weş. Serdem, Slêmanî,2006 ,r.21.
[79]Fazil Mecîd Mahmûd, *b.n.b.,* r.21.

Zana û lêkolînvanên derbarê perwerdekirina zarokan qala qonaxên pêşveçûnên zarokan dikin. Her wiha ji sê salî berbi jor destpê dikin, ji ber ku ji temenê sê salîyê kêmtir çûyîna zaroka a perwerdê bê sûd û bê bandore. Di temenê sê salî de zarok ji perwerdê hesdikin amraz û bandorîya perwerdê li ser wan çê dibe. Bê goman Çîrok jî bandorîyek heye liser kesayeta zarokan wan ji pırsgirêkan xilas dikin. Ev jî dide dîyarkirin kû zarok di temenê sê salîyê de liv û tevgerek ya wan heye ji bo jîrî yê.

Her wekû me di destpêkê de da dîyarkirin ku, zarok di vê qonaxê de hest bi hebûna xwe dike û tam ji her wêjeyekê di gire. Ev jî ji temenê sê salî ber bi jore. Gelik zana û lêkolînvanên derbarê zarokan de, qonaxên zarokatî dabeşî ser rêve çûyîna wan kirîne. Ji temenê 3' salî destpê kirîye heya gihaye temenê 15 salî bûrî ye. Ev qonax ji bo zarokan gelik bi bandorin. Pêwîste dayîk û bav, Çîrok bêj, Mamostayê Perwerdê li ser van qonaxan gelik bi hestyarbin. Ev qonax jî evin:

### 2.1.1.Qonaxa Realîzm ( 3-6 )Salî

Ev qonax ji bo pêşveûna zarokan a herî girînge. Ji ber kû zarokan di vî temenî de xeyalên gelik hene û hest bi karkirina dewruber dike. Li gorî wan hemû tiştî ziman heye û li gel wan di axive. Ji bo vê jî zarok gelik ji çîrokên Heywanan ( Ajalan ) hesdikin. Ajal û daruberên li wan balkêş tên evin, cûreyên daran, berx, karik, Pişîk,...Hwd.Kû hemuyan digirin û dibînin. Nabe em jibîr bikin ku, mejîyê zarokan hertim berû pêşdeçûnê deye.

Zarok di vî temenî de dikevin dibin bandorîya xwezayê de. Zarok ji rolên dayîk û bavan gelik bandor dibin. Ji ber ku : Zarok divê qonaxê de, pêwîste dayîk û malbat ew tiştên li deruberê wî hene lê bide naskirin kû tiştên wekî : mal, baxçe, dar û şînatî û heywanên kovî, jiber vê jî çêrokên heywanan li wan xerîb nayên.[81] Di vê qonaxê

[80] Ebdulkerîm Qasim Ebul Xêr,*El-Nimû min El-hemil îla El-Muraheqe* ,Weş. El-Waîl , Eman 2004, r.46.
[81]Ebdulftah Abu Mehel, *b.n.b.*, r.53.

de eleqeya dayîk û bav ji bo zarokan gelek pêwîste, jiber ku kesayetekî baş û serkeftî ji wan derkeve.“*Zarok di temenê 5 salî de binyata perwerdê diavêjin. Di vî temenî de % 90 ' ê karê perwerdê di keve ser milê dayîk û bav.Di vî demî de pirojeya perwerdê dikeve ser milê kesê beraberî zarokan. Ew jî li ser xwestek û armancekî baş fêm dike.”*[82] Ew malbatên kû bi şêweyekî rêkûpêk zarokên xwe perwerde dikin, bi vêre paşe roje kî pêşketî ji bo zarokên xwe avadikin . Ji ber ku, “Zarok di temenê 5 salî de, perwerde ji bo wan giring û bi sude ji qonaxên pêşerojê re.”[83] Ji ber vê jî di vî temenî de pêwîst e hinek cûreyên wêjeyê pêşkêşî zarokan bên kirin, da kû ligel hestên jîyana wan bi goncên. ji ber kû : Zarokatî beşekî kurt yê jîyana mirovane ! Rengdayîna jîyana mirovan jî demê zarokatîye.[84] Pêwîste, di vê qonaxê de dayîk û bav û mamoste agahdarê vê bin ji zarokan re çîrokên dil giran,bi tirs ne bêjin ji ber ku zarok di alîyê derûnî de têk diçin. Pêwîste wan Çîrokan ji wan re bêjin kû zarok pê dilxweş bibin û serê wan rihet bibe.

### 2.1.2.Qonaxa Xeyalên Berfireh' ê Zarokan(6-8) Salî

Di vê qonaxê de zarok diçin qonaxek din a jîyanê. Ji xeyalên sinordar diçe dunyaya xeyalên berfireh û ji çar goşeya dîwarê malê rizgar dibin. Diçine nav xwezayekî berfireh kû ew ji civake. Ew dîmenên kû rojane dibînindi nava kolanê de yan jî di nava malê û civakê de gelik goherîn di zarokan de çê dike.Zarok divî temenî de gelik pirsyaran dikin. Hemû pirsên zarokan di vî temenî de ji ber tirsandinê ye. Ji gelek tiştan di tirsin Mînak: Ji mirovên xirap, heywanên dirinde û dengê bilind. Ji ber vê yekê wan pirsyaran dike da ku bersivên wan bigire da kû di nava xwede hest bi aramî û netirsîyê bike.[85]Zarok di vî temenî de ji van çîrokan hesdike. Çîrokên qala Dêw û Dernc , Melek û Horîyan dike. Her çiqas ev çîrokne hinek tirsê têxe di nava dilê zarokan lê belê zarok her dixwazin goh bidin van çîrokan. Pêwîste dayîk ji bi rêya Çîrokên goncav re tirsan wan bibe. Ji ber kû, Zarok di vî temenî de gelek

[82]Hadî Neman El-Hîtî,*Edeb El-Tfal Felsefetîhî Fnûnîhî û Wesaytihî,*Weş.Dar El-hûriye,bexda,1977,r.20.
[83]Ebdulstar Tahîr Şerîf, *Mindal û Perwerde*, Weş. Dar El-Îraq, Bexda, 1977,r.17.
[84] Hîwa Omer Ehmed, *Rajenînî Lankî Mirovayetî*, Silêmanî,1977,r.13.
[85]El-Hîtî,*b.n.b.*,r.33.

dilsozê dayîka xweye û jê hesdike. Peywendîya zarokan li gel bav jî li ser rêzdarî, tirsê ye.[86]

Bê goman dema zarok çû dibistanê peywedîya wî li gel kesên derûdor çê dibe ev jî dibe sedemê kû erkê wan zêde be. Perwerde bandorîyekî gelik mezin li ser zarokan heye, ji ber ku di perwerdê de fêrî nivîsîn û xwendinê dibe, pêşdikeve.

### 2.1.3.Qonaxa Pelewantîyê ( 8-12) Salî

Di vê qonaxê de gelek gûherîn di zarokan de çê dibe. Hêdî hêdî ji xeyalan dur dikeve, ber bi rastîya jîyanê ve diçe. Tevgera wî/wê zêde dibe, di xaze ji cihekê biçe cihek din. Nêzîkî kesên derûberê xwe dibe, hevaltî bi wan kesên di temenê xwede re dike. Zarok di kevin tevgerekî gelek , her dixaze ji cihekê biçe cihek din yan jî ji dunyayek biçe dunyayekdin. Dixaze ji wî temenê xweyê pêşîde der bikeve berbi temenê nû bi keve tevgerê. Di qonaxekê de zêde dixwaze bi keve nava pêşbirkên civakî de yên wekî lehîstok.[87]

Zarok di vê qonaxê de hej ji xwe derxistin û şanazîkirinê dike. Gelek ji Pelewanan hesdike, carna xwe di cihê wan dejî dibîne û bawrî bi dest û milê xwe heye. Ji ber vê ji hevalên xwe komdikin û lehîstokên wekî Fîlîmên pelewana dikin hinek xwe di cihê wan pelewanan de dibîn. Pêwîste dayîk û bav di vê qonaxa zarokan de gelek çavdêr bin û li ser reftarê wan bi sekinin. Agahdarbin ji bo zarok bibin kesayetekî baş.Bi vê re jî amojgarî û Çîrok, bandorîyekî mezin li ser derûnîya zarokan çê dike. Ji ber ku , serkeftina pelewanan di çîrokan de zêde bala wan dikişîne, bi vê rejî aramîyek baş di derûnîya wan de çê dike. Ev jî di be sedemê kû zarok hîn zêdetir ji çîrokên pelewanan hesbikin.[88]

Bi vê re goherînek di binyada zarokan de derdikeve holê. Zarok piştî vê qonaxêji xwe şaş dibin gohertin di wan de çê dibe.Mînak : Dema temenê wan digihe

---

[86]El-Hîtî,*b.n.b.*,r.20.
[87] Newzad Elî Ehmed, *Mindal û Edeb,* Weş. rûn, Hewlêr, 2006,r.18.
[88] Sebîhe Faris,*El-Îticahat El-Cedîde Fî Seqafet El-Etfal,*Weş.Mûasese El-Erebîye,1987,r.88.

12 salî, Kur “ Xort” dengê wan mezin dibe, simbêlê wan derdikeve, xwesteka wan ya jîyanê tê gohertin. Her wiha Keç jî gohertin di alîyê " Bîyolojî " de çê dibe laşê wan de gohertin çê dibe, û gelik caran di karên malê de serkeftî nabin.

Di vê qonaxa zarokatî de hest bi keç û kur tê kirin, di alîyê heskirin û xwestekê de. Keç, herî zêde ji wan Çîrokan hesdikin kû qala malê, xwarin û evînîyê dike. Xwesteka keçan ya kesê dijber zêde dibe , kur jî li ser vê xwe paqij digire û çav li derdor digerîne. Herwiha, kur, dixwazin di derbarê “ Seks” 'ê de zanyarîyan hebin, ji ber vê jî pêwîste dayîk û bav agahdarê vê tiştê bin ji bo wan bi şêweyî rast û vekirî bê gotin. Ne biçin ji hevalên xwe zanyarîyan bi girin ev ji dibe sedemê rêyen xirap.[89] Di vî temenî de astê jîrî û hizirîna zarokan zêdetir û baş dibe. Gelek hêza veşartî di laşê wî/wê de heye. Fikra karubarên xwe û yên xelkê dike. Giringî bi pirsgirêkan dide, ji rastîyê hesdike dur dikeve ji xeyalan. Ev cûreyên çîrokan ji bo zarokên di vî qonaxî de pêwîstin: Qeheremanên çîrokan xurt û serkeftîbin. Pêwîste durbin ji destlêdana xwe,çîrok pêwîste xwestekên paqij têde bin.[90]Ev jî wisan dike kû binyadekî baş û xwedî hêz jibo wan çêbibe.

### 2.1.4.Qonaxa Baliqbunê(12-15)Salî

Ev qonax jî zarokên temenê wan 12 heya 15 salî digire nava xwe. Di vê qonaxê de zarok erkên wan û xwestekên wan zêde dibin. Zarok hinek caran keyfxweşe û hinek caran xemgîne, sedemê wêji goherînên Bîyolojîk ên di laşde çêdibin ne. Bi cûrekê, hest bi hebûna xwe dikin û xwestekên wan zêde dibin.Pozbilindin,henekirin, xwe derxistin ji sifetên wekî ji alîyê hezerekan peyda dibin.[91] Her wiha hestên Seksê zêde dibin, bişêweyekî dîyar û berçav hestpê dikin. Goherînên zû çêdibin dinav bera keç û kur de, ev jî bi eşkere derdikevin holê.

Di virde pêwîste dayîk û bav arîkarîya zarokan bikin. Pêwîste mamosta û kesê ku perwerdê dide bi şêweyekî zanistî û hûr ji wan re bêjin û bibin alîkar.Ji ber

---

[89] Xalîde Qadir Ferac, *Çîrokî Mndalan Le Edebî Kurdî da,1970-1990*, Weş. Şehab, Hewlêr,2013, r.78.
[90]Heme Kerîm Hewramî,*Edebî Mindalanî Kurd*,B.Yekem,Weş.Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2005.r.63.
[91] Fazil Mecîd Mihemed,*b.n.b.*, r.38.

ku, zarok dema gihişt qonaxa vî temenî,pêşveçûn di laşde çêdibe û bejna wan bilind dibe, ew bilindîya bejnê jî heya cihekê di sekine. Bi van goherînan re demekî gelek pêwîste ku ji bo zarok xwe dinava civakê û derdorde bibîne.[92]

Demê baliqbunê  de zarok hestbi azadîyekî serbest dikin. Dixwaze hertim biryar û zagon di destê wan debin.Ji ber vê jî gelek caran, Ew tiştên kevin retdikin, ji bo xwe zagon û karubarên nû di afirîne.Eger tiştek bi dilê wî nebe zû aciz dibe, biryaran zû dide. Dixwaze xwe bigihîne wê cîhê kû ya ew dixwaze,di vî temenî de li pey nasnemeyek nû di gere hewil dide qonaxa zarokatî li ser xwe bi avêje.Ji ber ku êdî pêwîstî bi dayîk û bav nebe. Bi xwe dixwaze biryara karên xwe bide.[93] Di vê qonaxê de zarok heskirin û xwestekên wan zêde dibin. Ji ber vê jî ji çîrokên cûrbicûr hesdikin heya ku xwe di nava van çîrokan de dibînin. Bi taybetî, di vê qonax de zêde ji xwendina wan çîrokên ku pelewanên wan bi coş, zîrek û netirs hesdikin. Ev beşên çîrokan heskirin û xwesteka civakî dişkêne û têhnbuna wan dişkîne.[94] Ji ber vê jî destnîşankirina çîrokan ji bo zarokan pir giringe. Bi beşekî li gorî qonaxên zarokan werin belavkirin û  bi şertekî bandorîyê li ser derûnî û perwerda wan neke.

Zarok di vê qonaxê de ji gohdarkirina çîrokan hesdike û bûyeran dibîne. Bi vê re ji bihayê zanîst,mirovayetî û civakê sud dibînîn. Ji bo zorîyê dibin armanca rêyên xweş. Di virde zarok xwe bi tenê di hêle naxwaze gohdarî çîrokên bi vî şêweyî bikin. Çîrokên bi vî awayî, yanî çîrokên naveroka wan sade. Zarok ji wan Çîrokan hesdikin kû naverokan ji babetên renganreng û bi ser şêweyê jîyana wan ve biçin dikin.

---

[92] Hewramî , *b.n.b.*, r.64.
[93]Mzafer Mistefa Îsmaîl, *Rûxsar û Naverokî Çîrokî Mindalan Lay Letîf Helmet*, Weş. Hacî Haşim,Hewlêr, 2011, r.38.
[94]Hewramî , *b.n.b.*,r.64.

## 2.2.Alîyên Pêşveçûna Zarokan

Zarok xwedî hestên nasik û nazadarin, di malbatê de. Pêwiste li gorî wan qonaxên ku me di pêşde qal kirî, Çîrokan pêşkêşî wan bikin.Ev jî dide dîyarkirin ku kesayeta zarokan li gorî cîyawazîya temenê wan tê gohertin. Ji ber kû kiryarên pêşveçûnê li ser bingeha van qonaxan derdikevin. Ew jî pêşveçûnên, fîzîkî, tevger, jîrî, civakî, ziman û reftar...hwd .

Em ê di vir de tenê qala wan alîyen ku peywendî bi teza me re heyî bikîn. Çîrok bandorekî gelek li ser pêşveçûnên jîyana zarokn dikin. Ya ku herî dîyar (Pêşveçûna Ziman û Jîrî ) ye, Ji ber vê jî em ê di teza xweda giringî bidin van her dû beşan:

### 2.2.1.Jîrî û Pêşveçûnên Di Alîyê Qonaxên Zarokan De

Jîrî, weke dîyardeyekê giringîya xwe di jîyana mirovatî û binyata Şaristaneye tê de heye. Sedeme ke ji bo bîranîn, banlkêşî û xeyalkirinê ye. Her di kevinde heya niha zana û nivîskar li ser vê mêjarê bi gumanin. Yek ji zanyên herî binav û deng û giring, mijarek li ser pêşveçûnên jîrî yê dinava zarokan de Bi awayekî pisporî girtîye dest. Ev zana jî " *Can Pîyace*" .[95]

Can Pîyac ( Gean Piaget ) ( 1896-1980 ), di alîyê jîrî û perwerdekirina zarokan de cihek yê taybet ê xwe heye. Yek ji fikrên heri giringê yê derbarê zanyarîyên di zarokan de alîyên westan, bi guman ev e.Pîyac , di wê bawerîyê deye zarok dema ji dayîk dibin mejîyê wan ne spî ye.Belkû karîye hemû ew zîrekî û bandorbun, di rêya hestyarîyê de wan zanyarîyên pispor werdigire.Wana dixe di bin kontrola xwede û bi şêweyekî rast wan rêkdixe.[96]Pîyace di rêya balkêşîya zarokna de karîye bîrdozekê dayne .Peywedîya zarokan li gel xwezayê û li gel karkirina wan ya li derdor di gire dest. Wan zarokan wekî kesayetekî zîrek dibine, ew zarokên kû herdem hewil didin di rîya pirsgirkirinê de zanyarî û lêkolînan wer bigirn. Da ku

---

[95]Qereçetanî,*b.n.b.*,r.60.
[96]Qereçetanî,*b.n.b.*, r.63.

bizanin çi di qewime, bi vî awayî dibînin. Ji alîyê Pîyac ve qonaxa pêşveçûna zarokan dabeşî bi ser çend qonaxan kirîye. Her qonaxek ji van sîmayek taybet yê xwe heye.Salên wan li gorî zîrekî, çandî û sedemên civakî û aborî tên gohertin. Lê belê ligorî pileyan hemû qonaz li pişt hevdû tên. Eger çi cêyawazîyên zirekîyê di navbera zarokan de nebe .[97]

Ev jî dide dîyarkirin kû xweza û dewrûber bandorîyekî mezin li ser pewerde û xurtbûna zarokan heye. Xwezaya Civakên rewşenbîr jî, bandorî liser pêşveçûn û xurt bûna zarokan dike. Di vê derbarê de çîrok rolekî serekî dibîne, di her binyata qonaxê jîrîya zarokan de dibîne.

### 2.2.1.1.Pêşveçûnên Jîrî ya Zarokan Di Baxçeyê Zarokan De

Di vê qonaxê de jîrîtî bi awayekî bilez pêşve diçe. Ev jî bi hîskirina zarokan a dewrûbere. Di alîyê fikirînê de zirek dibin. Ev jî di rêya wan piryara ne ku zarok ji dewrûberê xwe di pirsin. Ji bo zanîn heskirin û xwestekên wan, ji ber ku zarok di vê qonaxê de zêde pirsan dikin. Hewil didin ji bozêdetir jîrîya xwe. Hinek ji zanayan vê qonaxê bi qonaxa pirsyaran bi nav dikin. Ji ber ku zarok bi hiskirina dewruber di xazin zêde zanyarîyan bi zanin. Ji wan ezmûnan fêm bikin ku tê de derbaz dibin .[98]

Zarok hewildidin di rêya pirsyarkirinê de xwe ji nezanîna rizagr bikin. Her wiha pirsyaran ji çar dewrê xwe dikin, ji bo bizanin navê ajalan û ew tiştê li derdora wan. Di vir de pêwîste dayîk û bav pisporê wan daxwazên wan bin,ji bo ku bi awayekî zanisti û perwerdeyî bersiva wan pirsyaran bidin. Bi vê re jî zêde bandorîyê didin ser perwerde û aqilê wan.

Her weku me qal kir cîhana zarokan di vê qonaxê de gelek teng, sînordar û taybete. Zarok tenê di malê û ew civaka ku tê de dijî tevger dike. Ji ber vê jî pêwîste vî corê çîrokan ji wan re bêjin. Di sinorê xeayal û endişeya wî de lê dikole ku dinava

---

[97]Ebdulstar Tahir Şerîf, *Neşûnimaî Zanyarî Laî Mndal*, Weş El-Îraq, Bexda,1982,r.17.
[98]Ebdulkerîm Qasim Ebul Xêr,*El-Nimû min El-hemil îla El-Muraheqe,* Weş. El-Wayîl, Eman,2004, r.131.

malbat u kesyên dewrûber dene. Qalkirina wan ajal û firindeyan ew tiştên dewrûberê wan ji bo zarokan. yan jî qalkirina çen dîyardeyên wekî : Baran, ba, şev, roj, serma û germa...hwd .

Pêşveçûna aqilê zarokan di vê qonaxê de sifet û xasyetên taybet heye. Zarok, di vê qonaxê de hewl dide di rêya hizirînê de bersiva hinek pirsgirêk û dîyardeyên cûrbicûr bide. Mînak : Zarokek keç dikare li gel hinek dîyardeyan hizrên xwe bine ziman wekî, Di demê lehistokan de bukekî şuşe yan bê can tîne li gel wê dikeve goftoguyê, jêre çîrokan dibêje û gelik gazind, amojgarî û Nesîhetan lê dike.[99] Zarok wekî tiştekî zindîye li gel wane li gorî wê têkilîyê li gel çêdike. Pêwiste di vê qonaxê de ew çîrokên ji bo wan tê gotin li gorî hizirîna wan be. Ji ber ku , Zarok di çîrokê de ji bo wan mijarên berfireh dikeve. Xeyalên xwe yên xweş têde di avêje û dide razandin.[100] Ji bo vê jî hilbijartinancorên çîrokan,rêyekî baş di perwerdekirin û dewelenmedkirina xurtîya aqilê zarokan de dibîne.

### 2.2.1.2.Pêşveçûna Jîrî Ya Zarokan Di Qonaxa Bingehîn De

Di vê qonxêde pêşveçûna zarokan raste rast piştî pêşveçûna jîrîya zaroka di baxçê zarokan de destpê dike. Ji ber ku wextê vê qonaxê zêdebûye, ji ber wê ye pêwîste em bi du qonaxan beş bikin.

#### 2.2.1.2.1.Pêşveçûna Jîrî Ya Zarokan Di Qonaxa Destpêkê De

Di vê qonaxê de hizir û Fikrê zarokan fireh dibin,zêdetir kar dikin. Bi cûrekî zanyarî li ser dewrûber û tiştên ku dibîne peyda dike. Pisporê amêrên rast dibe. Ji ber ku, Di vê qonaxê de pirojeya hizirîna zarokan bi hişmentir ( Mantiq ) dibe. Di wê bawerîyê deye ku bi belgeyên zanîstî piştgirîya mantiq hizir û fikrê xwe bike,dikare tiştên mantiqî hest bike.[101] Di vê qonaxê de jîrî ya zarokan amadeye ji bo komkirina

---

[99]Qereçetanî, *b.n.b.*, r.74.
[100] Mehemed Reşîd Fetah, *Nimûne û Lêkolînewe Le Edebî Mindalanî Kurd,*Weş.Roşenbîrî, Hewlêr, 2009, r.25.
[101] Qereçetanî, *b.n.b.*, r.78.

dîyardeya. Mînak : dema ji bo zarokan qala baran û ewir tê kirin, ew bi şêweyekî zanistî di gire. Eger em pirsyara dengê ewran ji zarokan bikîn, belku bersivekî wisan bide bêje; ew jime aciz bûye ji ber wê van ewran bi ser me de tîne.

Em di karin di alîyek dinde destnîşan bikin, alîyê jîrîya zarokan di vê qonaxê de ew ku, Hizirîna mantiqî her di sinorê tiştên hetkirinê re di zivire.Ni kare bi şêweyekî mantiqî hizirîna tişt û pirsgirêkên wate dar û tiştên wekî ;yeksanî, Demokurasî, Dadwerî, rastgotin, Zîrekî, Merdayetî...hwd. bike.[102] Ji ber vê jî pêwîste peyvên watedarên dinava çîrokê de ji bo zarokan bi awayekî vekirî bê dîyarkirin.

Jîrî  ya zarokan di wê qonaxê de hest pê tê kirin demakû hevalên wî yên dewrûber zêde dibin. Di rastî de ji çarçuveya tenêtî ez ezî û xwe xweyî de rizagr dibe. Rihê hevaltî û dostanî tê de zêde dibe, bi zimanekî xweş hevpeyvîna çê dike. Hizir û fikrên hevalên xwe werdigire, bi vê rejî hest dike kû ew kesên beram ber ji wekî wî dihizire û fikir dike. Di gihe wê rastî yê kû kesên din jî bawerîyên cuda li gelwan hene.[103]Jîrî ya zarokan di çe wê qonaxê de dema ku zarok di gihije wê rastîyê ku bawerî bi xwe heye. Ev bi alîkarîya wê civaka kû tê de pêşvediçe. Li ser vî bingehî bawerî bi fikrên kesên din jî heye, ew rêya ku li pey rastîyan digere.

### 2.2.1.2.2.Pêşveçûna Jîrî ya Zarokan Di Dema Baliqbûnê De

Zarok di vê qonaxê de hizrû mejîyê Fizîka wî pêşve diçe û gohertinên bi temamî çê dibe. Qonaxên di pêşîya xwede li pişt xwe dihêle. Di vê qonaxê de hizir ber fireh dibe. Wekî, endamekî bi bandor û xwedî gotin, kesayetekî bi rui di nava civakê de xwe dibîne. ji ber wê jî, zarok, di vê qonaxê de carnan hesdike bi çe jîyana xwe ya berê. Ew çîrokên  di wî demî de gohdayê, ku qala Pelpelistanik, nuqil û gelik tiştên dike. Lêbelê her ku diçe temenê wî mezin dibe, ji çîrokên dildarî jî hes dike.[104]Ji ber ku Zarok di vê qonaxê de alîyên Seksî tam fêm kirîye. ji ber wê jî

[102]Qereçetanî, *b.n.b.*, r.78.
[103]Qereçetanî, *b.n.b.*, r.79.
[104] Heme Seîd Hesen, *Hizr û Şêwaz Le Çîrokî Kurdîda,* Weş.Wezaretî Perwerde, Hewlêr,2005,r.129.

dixwaze qala wan tiştan bike. Heskirina kesê beramber jî zêde dibe.Ji Çîrokên romansî, evînî hesdike. Ji ber vê jî pêwiste dayî û bav li ser babetan peywendîyekî baş li gel wan bike. Di vê qonaxê de alîyê deronî û fîzîkî zû mezin dibe. Hiş û mejî yê wan jî hişk dibe, goherîn di dengê wan de jî çê dibe. Zarok di vê qonaxê de wisan hîs dike kû kes ji wan zîrektir û xurtir nîne. Ji ber vê jî serkêşîya zagonên malbat û civakê dike, bi curekê Zarok di hilbijartina hevalên xwede zêde gûh nadin dayîk û bav li gorî xwe rêve diçe.[105]

Di vê qonaxê de hevalên xirap bandorîyekî mezin dike li ser Fikir û hişê wan. Ji ber ku dibin sedemê ji derketina rê, ji ber vê jî pêwîste dayîk û bav bi awayekî balkêş eleqedarê zarokan bin û amojgarîyan li wan bikin. Ji bo ji hevalên xirapdur bikevin. Lê belê bi reyekî baş û hêmin nek tund.

### 2.2.2.Qonaxên Pêşveçûna Ziman Di alîyê Zarokan De

Ziman pergalek ya ji hevdû fêmkirinê ye, di nava kesên civakê de. Di gel destpêkirina mirovatî re serî hildaye. Mirov dikare bi vê pergalê hizir û xwestekên xwe bîne ziman. Ziman yan axaftina zarokan di destpêkê de ji girî û çend dengê bê wate destpêkirîye. Her ku diçe ev deng dibe dengekî dîyar û bi wate, di dawîyê de jî dibe ziman. Ev zimane di exlaqê zarokan yê rojane de giringe. Bi vêre di kare peywedîyê bi kesên dewruber bike, bi taybetî ew kesên kû li gel jîyan dikin. Her bi vê peyvê dikarin jîyana civakî ava bikin.[106] Zarok di vî demîde zimanê wan digere û di axive. Di wê xwezaya dewruberê xwede digere. Bi ziman dikare fikrû û hizrên xwe bîne ziman,geran li hestên xwe dikin.Ji kesên dewrûber xwestekên xwe di xwazin, di vir de pêwîste xwetekên zarokan bê cih kirin. Da ku mejîyêwan tejî bibe ji çîrokên ciwan. ta ku di vê rê de zanyarîyên wan zêde dibin hest bi aramîyê bikin. Dema ku zarok zimanê wan digerê fêrî axaftinê dibin. Wekî ku ( Saîzer) ' ê perwerdenas dibêje; Çîrok rêyekî a şîrovêye ji bo rastî û nêzikrina hizir û baerîyek guncav ji bo mejîyê zarokan.[107]

---

[105] Newzad Elî Ehmed, *b.n.b.*, r.22.
[106]Hewramî, *b.n.b.*, r. 20-21.
[107]Mehemed Husên El-Xefacî*, Mîyûl El-Etfal El-Qiraye*, Weş. Dar El-Şûn El-Seqafiye, 1984,r.50.

Di alîyê pêşketinê de ziman beşekî serekî û giringe di jîyana zarokan de. Ji ber ku, Di alîyê zarokan de ziman rêgezekî giringe di jîyan û pêşektina fikir de. Bi taybetî di qonaxê destpêka jîyanê de. Pêşveçûnên Ziman jî yek ji dîyardeyên pêşveçûna zarokane. Ji ber wê jî pêwîste çavdêrîyek li ser zimanê zarokan bê kirin.[108] Zarok bi gelek rêyan fêrî tiştan dibin û zimanê wanjî bi hêz dibe. Ew kesê ku bi zarokan ve mijol be pêwîst e di alîyê fêrkirina ziman de pispor be û gelek rêyan bizane. Eşkireye ku,Zarok bi eleqeya xwezaya rewşenbîrî di kare wekî çavlêkirinekê goftigoyê bikin,piştre dikarin peyvên baş bêjin. Tişta ku em di xwazin bêjin divir de pêşkeftina zimanê zarokane û asta pîvana pêşveçûnên laş û fikrê wane .[109]

Pêwîste em vê jî ji bîr nekîn zarokê zîrek û xurt asata girtina ziman ji ya zarokekî hêsanî zêdetire. Zîrekî û jîrî bandorekî raste rast li ser ziman heye. Nabe ku zarokek zimanê wî kêmasî tê de hebe jêre bêjin kesekî ne zirek û tembele. Ji ber ku hinek sedem hene ku bi awayê erênî û nerênî bandorîyê li ser pêşketina zimanê zarokan dikin. Di dîyarkirin û beşkirina qonaxên pêşketina zimanê zarokan de,pişt bi lêkolîn û pisporan ve girê didin. pêşketina zimanê zarokan bi servan qonaxan de dabeş kirîne.

### 2.2.2.1.Qonaxa Temenê 3-6 Salî

Zarok di vî temenî de xwedî ferhengekî ne dewlemend û sadeye di alîyê peyvan de. Ji ber ku hîna di sinorê xêzan û malê de ne derketîye. Her roj wan gotinan digire ku dayî, bav,xuşk, bira û kesên dewrûber dibêjin. Ji ber wê ji zamanê wan destpêkê de li ser wan peyvane. Lê belê hêdî hêdî ferhenga zimanîya wan berû pêşdiçe, sal bi sal berû pêşketinek ya ziman diçe. "*Pêşveçûna ziman bi eşkereyî derdikeve, di temenê 3-6 ' de dikare hevok û pirsyaran çê bike, alîyê fêmkirinê jî zêde dibe. Her wiha dikare bersiva kesên ji xwe mezintir jî bide*."[110] Di vî temenê zarokan de pêwîste Çîrokên peyvên wan sade û durbin ji wergerê, ji wan re bê gotin. Ji ber

---

[108] Ebdulstar Tahir Şerîf, *El-Zexîre El-Lûxewîye Înde El-Tifil Kurdî,* Weş. Dar El-Seqafe El-Kurdiye, Bexda, 1984,r.8.
[109] Semîr Ebdulwehab, *Edeb El-Etfal*,Weş. Dar El-Meysere, Eman, 2006,r.287.
[110] Seîd Rîyaz, *El-Euses El-Nefsîye min Merahil El-Cenîn*, Weş. Dar El-Kelîme ,Msir,2003,r.52.

ku,Zarok di vî temenîde wateya û meneya peyvan fêmnake û bi karjî naêne. Mînak ; peyvên wekî, soz,bîranîn, serbestî, bextîyar, jê fêmnake û xwesteka zarokan jî jêre nîne.[111]

Ji ber wê jî pêwîste wan çîrokan jî zarokan re bêjin ku jê hesdikin û fêmdikin. Bi vê re zimanê wan jî berfireh dibe. Pêwîste dema di vî temenîde axaftin li gelzarokan bê kirin bi awayekî aramî û li ser xwe be. Ji ber ku, tiştê dewrûbera xwe dibîne. Ji ber vê jî navê wan nizane û nikare li wan bigere. Lê belê bi şêweyekî giştî zimanê wan divê çarçêveyê de namîne. Belku salbi sal ber bi pêşketinê ve diçe û ferhenga zimanê wan jî dewlemend dibe. Dikare peyv û hevokên giran jî çêbike û bêje. Ji ber wê jî cîyawazî di navera temenê 4 ,5 ,6 ' de heye. Di her demekê de zarok fêrî peyvên nû dibe,bivî awayî ji jimara peyvan û zimanê wan berbi pêşve diçe. Berdewam mejîyê zarokan firehtir dibe û pêşveçunên nû di xwede çê dike.

Pêşveçûn û dewlemend bûna ziman di alîyê zarokan de, em dikarin di vê xişteya xarê de zêdetir Şîrove bikin.[112]

| Sal | Hejmara Peyvan | Zêdekirina Peyvan |
|---|---|---|
| 4 | 1013 | - |
| 5 | 1105 | 92 |
| 6 | 1132 | 27 |

[111] Hewramî, *b.n.b.*, r.55 .
[112]Ebdulsitar Tahîr Şerîf, *Wişe û Riste laî Mindal le Temenî 1-6 Sal*, “Govarî Zanyarî îraq” ,Berg 14, 1986, r.116.

### 2.2.2.2.Qonaxa Temenê 6-8 Salî

Zimanê zarokan di vê qonaxê de berbi pêşve diçe. Gelek peyvên nû fêrdibe,ji ber kû ji sinirê malê derdikeve û diçe dibistanê. bê goman li dibstanê jî fêrî binyata ziman û xwendin, tîp, peyv, û hevokên sade dibin. Bi vê re ferhenga ziman a zarokan dewlementir dibe.Her çiqas temenê wan mezintir dibe di alîyê zimande berbi pêşve diçe û karanîna ziman ji wan re hêsanî dibe. ji ber  ku,Zarok di vê qonaxê de hest bi rihê xwe dike,hizirîna bûyeran jî bi kartîne. Bi vêrê jî ferhenga ziman berfireh dibe.[113]Bi cûrekî,*”Di temenê 6 salî de nêzîkî 2000 peyvan fêr dibe, heya digihe dawîya qonaxa temenê destpê 7000 peyvan fêr dibin*.”[114] Di vê qonaxê de wateya peyvan bi temamî ne bexşin. Ji ber ku, Hêza zarokan di fêmkirina zimanê nivîsînê de hêzekî sinor dare,di çarçêveyekî teng de xwe dibîne.[115]

Her çiqas jî be zarok di vê qonaxê de bi temamî ji wateya peyvan û hevokan fêmnake. Lê belê di kare çav li kesên mezin bike,ka çawa di axivin û çawa peyvan dibêjin ? Di kare axaftinê li gel kesên derdora xwe bike. Di xwazin goh bidin wan çîrokên ku tê de peyvên hêsan û naveroka wan sade. Ji ber ku zarok di vî temenî de.“*Ji zimanekî vekirî,hêsan û sade hesdike*.”[116]  Pêwîste hêjmara karekterên di nava çîrokê de ji sê yan çar karekteran zêde nebe. Ji ber ku zedebûyîna karekteran di be sedemê zêdebuyîna buyeran.  Pêwîste bûyer û pev li gorî qonaxa temenê zarokan bi karbên heya ku xezîneya ziman a wan dewlemend dibe.

### 2.2.2.3.Qonaxa Temenê 8-12 Salî

Zimanê zarokan di vê qonaxêde pêşveçûnek berçav dîyar dike. Bi cûrekê, Zarok Fêrî yasayên ziman dibe, dikare bê xeletî bi axive hizir û xwestekên xwe bîne ziman. Belku di dawîya vê qonaxê de hinek zaravayên rewanbêjî hebe. Ew dikare

---

113 Fazil Mecîd Mihemed, *b.n.b.*, r.17.
114 Mehmed Elî El-Hirfî, *Edeb El-tafal Dirase NezarîyeTetbîqiye*,Weş. Dar El-Îtîsam,Qahîre, 1996,r.52.
115Razaw Reşîd Sebrî,*Çîrokî Mindalan le Edebî kurdî da 1990-2005*,Weş.Hacî Haşim, Hawlêr, 2010.r.168.
116 Heme Seîd Hesen, *Hizir Û Şêwaz Le Çîrokî Kurdî Da*, Weş.Wezaretî Perwerde, Hewlêr,2005,r.134.

wan fêm bike. dikare hest bi hinek peyvanbike ku wateya wan di çend watande tê bikar anîn.[117] Her wiha sal bi sal ferhenga zimanê wan dewlemend dibe. Heya di gihe astekî, Hêza xwendinê zêde dike, Di kare ew çîrokên ji bo mezinan jî hatî nivîsandin bixwîne û jê fêmbike. Bi vê re xezîneya ziman dewlemend dibe, wisan lê dike di alîyên zagonên ziman de bibe pispor. Hêzek din jî li gel çêdibe ku dikare di dibistanê de fêrî zimanek din jî bibe.[118] Bi vê re hêza fikirînê berfireh dibe heya di gihe,Zarok di vî temenîde çîrok û helestan dinivîse. Gelik caran dema kesên mezin Çîrok û helbestên wan dixwîne li wan balkêş tên û dikevin gomanê.[119]

Bê goman zarok di vî temenî de wekî zevîyekê ne tû têde çi biçînî wê ew tişt mezin bibe. Pêwîste zarok li ser xwedinê bê fêrkirin. Da ku rêyên nivîsînê jêre asan were. Xezîneya ziman heye demekî pêwîste dewlemend be dakû bi kare arîkarî bide di dema xwend û nivîsînê de. Pêwîste zimanê nivîsînê û di çîrokan de peyvên asan û sade têdabin. Di vî temenî de zarok gelek peyvên nû digire û fêrdibe.

### 2.2.2.4.Qonaxa Temenê 12-15 Salî

Gelek ji zanayên Derûnnasîyê vê qonaxa temenê zarokan wekî ji nude dayîkbûnê dibînin. Pêşveçûna Fîzîk û ya zimanê zarokan berbi pêşvediçin. Goherînek bi temamî bi serde tê, hêza axaftinê û hizirînê jî zêde dibe. Heya digihe wê astê, Zimanê baliqbûnê di vê qonaxê de bi temamî kamil dibe. Dikare hemû cûreyên pirtûk û babetên ku bi zimanê dayîka wî-wê hatîne nivîsandin bixwîne û jê fêmbike. Hêza hizirîn û hişê wan digihe dereceyekê ku êdî di zimande pirsgirêkan jîyan neke,hem di alîyê fêmkirin û ne fêmkirinê de .[120]Zarok di vî temenî de zagonên ziman hemû fêmdike. Eger kesek hevokek xelet bêje ew dikre wê hevokê sererast bike. Ji ber ku ferhenga peyv û ya hevakan dewlemende, ji rastîyan fêmdike. Her wiha hunerê peyvan jî dizane hest bi rawanbêjî ji dike. Gelek sedem hene ku zimanê zarokan bi hêztir dike û hêza fikirîna wan zêdetir dike. Dîyare ku , Çîrok sedemekî

---

[117] Fazil Mecîd Mihemed, *b.n.b.*, r.36
[118]Fazil Mecîd Mihemed, *b.n.b.*, r.36
[119] Selam Seîd Mewlûd, *Qonaxekanî Geşekirdinî Mindal û Edeb*,"Kovarî Ayînde", J.3,Silêmanî, 1999,r.80.
[120] Fazil Mecîd Mihemed, *b.n.b.*, r.39.

giringe ji bo dewlemend kirina  zimanê zarokan. Zarok di rêya çîrokan de Fêrî tiştên kevin dibe û sermayeya zimanê xwe zêde dike.Dema ku zarok vê carê ji bo kesekdin çîrokê dibêje wê demê zimanê wî jî bihêz û pêşve diçe .[121] Dikare nivîsan binivîse xwe dibarê nivîsînê de dibîne.  Gelek caran zarok di vî temenî dedestbi nivîsîna çîrok û helbestên zarokatî dikin. Dikarin berhemên ciwan û bi wate binivîsin. Geranik li ser daxwza xwestekên hemû zarokan bikin.

[121]Qereçetanî, *b.n.b.*,r.72.

## BEŞA SÊYEM

## 3.ÇÎROKÊN ZAROKAN

Wêjeya folklor ê di binyat û destpêkirina çîrokên zarokan de tê zanîn. Di gel destpêka gelan û jîyana gelan re hatîye. Bi taybetî, piştî avabûna xwezayê, mirov hatine ser ruyê erdê. Mirov di dema kar de û ew serhatîyên kû bi serê wan hatî di dema kombuna wan ya li gel hevdu de ji hevre digotin. Hêdî hêdî zimannas û kesên pispor, serhatîyên mirovan bi awayekî ciwan û sade biawayekî wêjeyî ji ber kirin û kirin Çîrok.[122] Mirovan di wî demîde xwestek wekî Pendan digirtin, demê xweş, û wext debarskirên ji bi çîrokan derbaz dikirin.

Di demê kevinde qet Çîrok nebûn ku jêre bêjin ( Çîrokên Zarokan ). Çîrokên zarokan jî navek taybet û serbixwe nebû, her li gel çîrokên mezinan dihat gotin. Ji ber ku,hemî ew Çîrok û hikayeta " *Ber Agirdan*"a kurdî yên netewên din bû û çîrokên kesên mezin bun. Ji bo zarokan jî ev çîrok dihatin gotin nivş bi nivş dihat gotin û dihat parastin. Ew çîrok û helbestên bi navê zarokan di hatin naskirin jî kesên mezin ji dinav de bûn. Her wiha ew çîrok û helbestên ku hebûn bi navê kesên mezin dihatin naskirin. Disan ji her beşek ji bo zarokan dihat veqetandin. Êdi ne di gotin çîrokên mezinan yan yên biçûkan.[123] Di wî demîde di nava hemû çîrokan de, daxwaz û xwestekên zarokan ne dihatin nivîsandin. Her çawab be jî em dikarin bêjin , ew çîrok ji bo çavkanîyên Çîrokên zarokan baş bûn. Di vê derbarê de çîrok hêdî hêdî berbi pêşketinekê çû êdî ket nava jîyana mirovan de. Bi vê re Çîrokên zarokan jî dinava çîrokên Folklorî de derketin holê. Mirovan ji bo zarokan bi ahagî çîrok di gotin taybet dema qala qehreman û kesên dinava çîrokê de dikirin.Zarok jî bi vê dikenîn û dil xweş dibûn. Ji bo wê jî em dikarin bêjin ; Buyerên Çîrokên zarokan bi ser çend kesên dîyar de di hat, cih û demê wan ne dîyar bû. Karekterên wan jî mîna Ademin yan jî Efsaneyî ne. Xwesetkan van jî kesayetekî baş di zarokan de çêbike.[124]

[122] Mehemed Rehîm Remezan,*b.n.b.*, r.58.
[123] Hewramî, *b.n.b.*, r.44-45.
[124] Mehemed Abdulrezaq Îbrahîm , *Sqafe El-Tifl*,Weş. Dar El-fikr, Eman,2004, r.332.

Çîrokên Zarokan li ser zimanê mîrovan hatîne û bi şêweyekî pexşan hatîne çêkirin. Xeyal , hest û hizrên zarokan di razîne wekî bergekîxweşik ji ber dikin. Di dema çêkirinê de gelik naverokên cûrbicûr heye dinav de wekî ; ( Perwerde, zanîst û ayîn...hwd ) digire. Her wiha buyer, karekter,cih û dem jî dinav xwede digire. Cîhana zarokan tê de dîyar dike,bi şêweyekî, bandorîya li ser hêz û heskirina zarokan pêşkêş dike. Armanca wan hemû ew e ku ji bo zarokan demekî xweş derbazbike û di alîyê perwerdekirin, pêşketina wan de bi sûd be. Ji ber wê jî; Zarok gelek ji gohdarkirina çîrokan hesdikin. Ji dil li pey buyerande diçe û di gel kesên nav çîrokê de bi rêve diçe heya digihe dawîyê. Bi heskirenekî mezin dixwazin bi gihin encamekê.[125] Ji ber ku dinava naveroka her çîrokekê de amojgarî,pendên civakî û dersên perwerdê heye. Zarok jî li gorî qonaxên temenê xwe û pêşketina jiyana xwe jê sûd digirin. Di virde pêwîste bê zanîn ku li gorî temenê zarokan çîrok ji wan re bê gotin ji ber ku ji xwere perwerdeyekê jê bigirin.

Her weku me di destpêkê de destnîşan kir perwerde kirina zarokan di destpêka jîyana wan de destpê dike. Dema ku zarok ji dayîk dibin bandorîya perwerdê li ser heye. Wekî, fêrbûn, perwerdekirin li ser xwarin û nivistinê. Lê belê ewa kû di virde tê qalkirin ewe ku; pêwîste di temenê Sê salîde ji bo zarokan çîrok neyên gotin ji ber ku bandorê liser nake. ji ber vê jî pêwîste kesê eleqedar piştî temenê Sê salî ji bo zarokan çîrokan bêjin, bişêweyekî perwerdeyî.

### 3.1.Cûreyên çîroka zarokan

Di vir de em dikarin çîrokên derbarê perwerdekirina zarokan de dabeşî bi ser Dû qonaxan de bikin.

#### 3.1.1.Çîrokên Zarokên Temenê Biçûk ( 3-8 ) Salî

Ew çîrokên di demê perwerdê de ji bo zarokên biçûk tê pêşkêşkirin, ser bi temenê Sê salî re ye.Ji ber ku "*zarok di piştî sê salîyê de hest bi hebun û xwesteka*

---

[125]Mehemed Reşîd Fetah, *b.n.b.*, r.29.

*xwe dike. Dikarin sudê ji çîrokan bigirin. Destpêkekî giring a zarokatîye*."[126] Pêwîste evçîrok hêsan bin bişêweyekî sade û darêj bin,peyv û hevokên wê hêsan bin,daku ferhenga zimanîya zarokan bi hêsanî werbigire. Xwesteka çîrokan pêwîste vekirî û dîyarbin. Ji bo wê jî çîrokên bi vî awayî ji bo zarokan gengaze, ku têde qala Ajalan dikin û qala hevaltî û mirovên bi rih dike. Beşekî giring yê van çîrokan ji bo perwerdekirin û amojgarîyê ye. Hemû jî xeyalîne, pêwîste çîrokên vî temnî ji nebaşî û karên xirap, bi tirs durbin. Mînak ; Çavkor, bêzirav,nepaqij, kuştin, kîn...hwd. pêwîste zarok ji van reftaran dur bên xistin û bi taybetî di nava naroka çîrokan de dema tê gotin.

Gelek çîrok hene li gel vê qonaxa zarokan de diguncên. Wekî:Rovî û Çûk, Hêlîna Qirê, Tasa avê, Piling û Rovî , Rovî û Mih, Rovîyê Germîyan, Mihgok û Biznok , Kevok û Mero, Geşta ber bi zozanan ve, Masîyê jîr, Qijik û perê tawis...hwd. Di beşê piratîkî de emê wane perwerdeyên van çîrokan destnîşan bikîn.

### 3.1.2.Çîrokên Zarokên Temen Mezin ( 8-15 ) Salî

Çîrokên vî temenî ji bo her du qonaxên Sêyem û çarem ê zarokan gengaze. Çîrokên hemecûrin dialîyê naverokê de dewlemendin. Hêvî û xwestekên zarokan didin xuyakirin. Xeyalê zarokan bi hêz dike ji bo hizirîn û lê hurbûna tiştan. Herî Zêde çîrok ji bo nîşankirina xurtbûn, bêtirsbûn,ji xwe bawerbûn, pelewanî û karên baş yên mirovane.Çîrokên vê qonaxê buyer û serpêhatîyên wê gelekin, jimara karekterên wan jî gelekin. Di vî temenî de, zarok dikare bi gelek şêweyan perwerdê bibîne. Ji ber ku zarok di pêşîya 7 salî de ne raste rast tên perwerdekirin. Lê belê em dikarin di vî temenî de zarokan bi şêweyekî raste rast yan jî ne raste rast perwede bikin.[127]

Ew çîrokên ku ji bo vê qonaxê guncavin hejmara wan gelekin.Wekî; Serkodîle,Lawikî zîrek, Ferec,zem, Pozbilind, Rastbêjî, Ser rastî, Hêk diz dibe Hêştir diz, Paşa û Şivan, Ne bû Zilam, Çîya û Xizmayetî, Ew kesê ji mêvanan hesbike

---

[126] Mehemed Rehîm Remezan,*Mindal û Çîrokî Mindalan*,Weş.Zankoy Selahadîn,Hewlêr,1984.r.21.
[127] Mehemed Kesas,*Mindal û Saykolojyetî Perwedekirdin*, Ç.2,Weş. Dezgehê Serdem, Slêmanî,2000, r. 5

Xwedê jî jê hesdike, Hêz di yekîtî de...hwd. Em ê di piraktîka van çêrokan de qala wan bikin, wane û amojgarîyên wan destnîşan bikîn.

### 3.2.Dabeşkirina Çîrokan Ji Alîyên Lêkolînvan û Nivîskaran Ve

Ji ber vê jî qonaxa zarokatîyê demekî dirê têxe dinava jîyana zarokan de. Ji bo vê jî çîrok, ji bo jîrî, hêz, ziman, daxwaz û pêwîstîya jîyana zarokan dabeş û rêzbend dike. Her ji ber vêye, nivîskar û Rexnegirên wêjeya zarokan,her yekê li gorî xwe çîrokên zarokan beş kirîne. Di nava wande cûrekî hevbeş dîyar dibe.[128]

Dabeşkirina Çîrokên zarokan ji alîyê çend Nivîskar û lêkolînvana ve hatîye dîyarkirin. Em dikarin qala hinek wan nivîskar û lêkolînvana bikin.

• ( Heme Salih Ferhadî ) di pirtûka xwe ya bi navê "*Mindal û Edebî Mindal"* de bi vî awayî dabeş kirîye.

1. Efsane û Çîrok.
2. Dêw û Cin.
3. Zîrekî di Mêvanperwer.
4. Tiştên Balkêş û Berhem.[129]

• ( Razaw Reşîd Sebrî ) di pirtûka xwe ya bi navê " *Çîrokî Mindalan Le Edebî Kurdî da*" bi vî awayî beş kirîye.

1. Çîrokên Efsaneyî.
2. Çîrokên Folklorî.
3. Çîrokên Ajalan ( Heywanan )
4. Çîrokên Xeyalî.
5. Çîrokên Pelewanan.
6. Çîrokên Rîyalîst.
7. Çîrokên Ayînî ( Olî )

---

128 Hêmin Casim Mhemed, *b.n.b.*,r.59.
129 Heme Salih Ferhadî, *Mindal û Edebî Mindalan*, Weş. Wezaretî Rewşenbîrî , Hewlêr,2005, r.73.

8. Çîrokên Zanistî.
9. Çîrokên Pêkenokî.
10. Çîrokên Dîrokî ( Mêjoyî ).[130]

• ( Dr. Hadî Neman  Elyahît ) Nîvîskar û lêkolînvanê teybet di derbarê zarokan deye. wî jî bi vî awayî dabeş kirîye:

1. Çîrokên Ajalan ( Heywanan )
2. Çîrokên Pelewanên Selçîyekan.
3. Çîrokên Bi Pile.
4. Çîrokên Pêkenokî.
5. Çîrokên Dîrokî ( Mêjoyî ).
6. Çîrokên Zanistî.
7. Çîrokên Efsaneyî.
8. Çîrokên Folklorî. [131]

## 3.3.Armanc û Sûdên Çîrokên Zarokan

Bê goman çîrokên zarokan gelek sûd û armancên wan hene. Xemilandinek berçav û dîyar di jîyana zarokan de heye. Di vir de xwesteka me ewe ku  ew zarokên guh didin çîrokan, çîrokan dixwînin, Peywendîyan bi çîrokan ve heye û bandora çîrokan li ser wan heye. Dîyare ku gelek cûreyên çîrokan hene ku têde armanc û xwestekên bi sud hene jî bozarokan. Gelek hêza baş pêşkêşî wan dikin û di gelek alîyande zarokan pêşdixin. Emê di van xalên li jêr de destnîşan bikin.

1. **Pêşxistina Alîyên Reftarî û Perwerdekirina Zarokan :** Çîrokên zarokan rol û giringîyekî bibandor heye li ser reftar û perwerdekirina zarokan.  Di naveroka çîrokan de hinek şîret û amojgarîyên bi sud hene kû zarok pê zana dibin.  Di virde zarok gelek sudan jê digirin û jîyana wan reng dide. Ji ber ku, çîrok sedemekî gelek giringe ji bo fêrbûna ezlaqê baş û bi sûdmend. Di karin bi van

[130]Razaw reşîd Sebrî,*b.n.b.*, r.98-121.
[131]El-Hîtî,*b.n.b.,* r.148-194.

pergalan re zarokan ji tiştên xirap dur bixin .[132] Em di karin bêjin; Bêyî perwerdeya Adem zarok bê sûd û biçûk dimînin, xusarekî mezin lixwe û civakê dike.[133]

**2. Pêşxistina Alîyê Ziman û Şêwazê îfadekirinê Di Demê Axaftinê De :** Zarok bi çîrokan Ferhenga xwe ya ziman dewlemend dikin. Sinorê hizir û hişê wan firehtir dibe. Bi taybetî di demê, zarok çîrokan li ser zimanê xwe ji bo kesekî din dibêje, bi vêre jî zimanê wan dewlemend dibe.[134] Peyv û zarave zêtir di mejî de xwe bi cih dikin, rêya ziman û îfadekirinê fireh dike. Ji ber ku, çîrok , Sedemê pêşxistina fêrbûna zimane. Bitaybetî dema ku çîrok bêj bi dengekî bilind dixwîne , yan jî çêrokbêj di rêya nivistandinê de ji bo zarokan dibêje.[135]

**3. Pêşxistina Zanyarî û Nasandina Hemû Alîyên Jîyanê :** Zarok di rêya çîrokan re zanyarîyên derbarê jîyanê de nasdike.Hinek alîyên xwezaya coxrafî, civakî û dîroka welatê xwe nasdike. Zanyarîyan derbarê pelewan, serok û navdarên welatê xwe de peyda dike.[136]Ev jî daxwaz û xwesteka hemû mirovane ku zanyarîyan derbarê jîyanê de fêrbibin. Di alîyek din de, çîrok derî ji zarokan re vedike. Ku têde buyer û tiştên balkêş hene lê di alîyê wî de nîne. Çîrok çavkanîya fêrbuna tiştan a zaroka ne ku ew tiştên jê hesdike.[137] Bi vê re Çîrok dibe sedemekîherî giring jibo fêrbûna zarokan di jîyanê de.

**4. Pêşxistina Alîyê Deronî ( Piskolojî ) ya Zarokan :** Rêya çîrokan serkeftîye û bi sûde, Zarok dixweş dibin bi vê rîyê derûnîya wan jî aram dibe. Rêya çîrokên serkeftî de zarok dikarin ji alozîyên deronî xilas bibin. Ji ber ku, gelek rêyên naveroka çîrokan hene ku dibin sedemê, pêkenîn, girîn, henek, acizbûn,hewrkirin û ne razîya zarokan...hwd.Ev hemû jî dibin sedemê nizimkirin û valekirina bilindbûna deronîya zarokan.

---

[132] Ehmed Qadir Seîd, *Çîrok û Geşey Mindalan Du Babetî Perwerdeyî*,Weş. Wezaretî Rewşenbîrî, Silêmanî, 2005, r.33.
[133]Îdrîs Ebdula, *b.n.b.*, B. Sêyem, r.50.
[134]Qereçatanî, *b.n.b.*, r.72.
[135] Ehmed Qadir Seîd, Çîrok û Geşey Mindalan Du Babetî Perwerdeyî, r.33.
[136] Qereçatanî,*b.n.b.*, r.72.
[137] Mehemed Reşîd Fetah,*b.n.b.*,r,25.

Hinek ji derûnnasan Çîrokan wekî şêwazekî ya destnîşankirin û çareserkirina nexweşîyên derûnîyê bi kartînîn.[138]Ji ber vê jî dayîk û bav pêwîste berpirsyarbin di alîyê pêşveçûna derûnîya zarokan de. Çîrokên baş û rast ji bo wan hibijêrin. Ji ber ku, ji ber ku zarok zindîyekî nerm û nazik e. Derûnîya wan gelek bi hêsanî xirab dibe.[139]

5. **Pêşxistina Xeyal û Hizirîna Zarokan:**Di nava naveroka Çîrokên zarokan de gelek xeyal û hizrên ciwan hene. Di gel xweza û xwestekên zarokan gengaz dibin.Îro zana û nivîskar ji bo pêşxistina xeyalê mirov û zarokan bi taybetî balê didin ser çîrokên xeyalî .[140]Ji ber vê jî Çîrokên zarokan giringîyekî gelek dide vî alîyî. Ji ber ku zarok bi xeyal û endîşeyên di nava çîrokan de, pêwîstî û daxwazên xwe di jîyanê de têr dike.

6. **Pêşxistina Alîyê Civakî:** Çîrokên zarokan rolekî girîng û bi bandor dibîne di pêşxistina alîyê civakî a zarokan de. Kesayetekî ras û rêkûpêk çêdike. Di nava civakê de cihê şanazî û bextewarî yê be. Hêza xwe hebe ji bo tevlîbuna kesên di dewruber de. Ji ber ku Çîrok Hêza aqil û hizrê wan pêşdixe, daxwaz û pêwîstîyên wan bi cih tîne. Di nava civakê de jî kesayetekî baş û bi hêz çê dike. Hêza hestên lêpirsîna niştîman û mirovayetîyê heye.  ji ber ku, xwesteka çîrokên zarokan ewe ku perwerdeyekê fêrî zarokan bike û wan têgehiştî bikin. Da ku bi zanin xwe jî tiştên xirap û tirs bi parêzin ev hemû ji bo jîyana wan hêsanî be û baş biçe pêş,beraberî nexweşî û xsarê neyên. Ji bo serê wan tevlî hev nebe û pirsgirêk çê nebe.[141]

7. **Pêşxistina Alîyê Ayînî ( Olî ):** Çîrokên zarokan dikare bi amojagarî û waneyên ayînî peywedîya xwe û zarokan çêbike. Ayînê bi zarokan dide naskirina û Şîrovekirin. Ev ê jî ji  wan re dibêje her dem krê baş beranberî karê xirap serdikeve.Amojgarîyan li wan dike heya kû nêzîkî karê baş dibin û ji karên şer

[138]Qereçatanî, *b.n.b.*, r.72.
[139] Suhêl Tahir Ebdula,*b.n.b.*, r.46.
[140] Hewramî, *b.n.b.*, r.119.
[141]Îdrîs Ebdula, *b.n.b.*, B. Sêyem, r.44.

durbêxe. Her wiha gelek zanyarîyên din hene kû qala: Di babetên ayînî de yên wekî; Bîr û bawerî , Jîyana Pêxmberan, Çîrokên Qurana pîroz, Pirtûkên Asîmanî, Pelewantî, reftar û tevgerên ayînî...hwd, dike.[142] Ev ji ji bo xwestina zanyarî û perwerdekirina zarokane. Di alîyek din dejî ji bo çêkirina bîr û bawerîya ayînî dinava dilê hemû zarokan de.

## 3.4.Pêwîstî û Mercên Çîrokên Zarokan

Çêrokên zarokan gelek merc û pêwîstî hene. Pêwîste Nivîskar û Lêkolînvan agadarên wan bin û li berçavan bigirin.Da ku bikarin berhemên goncav, serkeftî û pêşketî pêşkêşî zarokan bikin. Em dikarin van merc û pêwîstîyan di çend xalan de destnîşan bikin.

1. Pêwîst e çîrokên zarokan li gorî temenê wan bên pêşkêşkirin. Ew çîrokên ji bo zarokên biçûk tên nivîsandin yan jî gotin, pêwîste ji çêrokên zarokan ê temenê wan mezintir cîyawaz be. Ji ber ku di her qonaxek ya temenê zarokan de zarok pêwîstî û daxwazên wan cudane. Ji ber vê jî pêwîst e çîrokbêj yan jî mamosta, hest bi her qonaxek ya qonaxên fêmkirina zarokan bike. Ka wê çi cûre çîrok ji bo wan hilbijêre.[143] Di virde pêwîste naverokên çîrokan li gorî asta temenê zarokan bi goncê û xwestek û daxwzên zarokan têde hebit. Dema ku zarok Şer dikin û aciz dibin çi sudê ji çêrokan nagire.

2. Pêwîste navnîşanên çîrokan ligorî xwestek û daxwazên zarokan be. Nabe babetekî sîyasî yan ji bitirs ji bo zarokan bê gotin. Ji ber ku di derbarê wan de tiştekî nizanin û mejîyê wan jê nagire. Pêwîste,Babetên hibijartî cihê balkêşîya xwestekên zarokane.[144] Da ku zêdetir guh bide çîrokê û sudekî gelek jê werbigire. Ji ber vê jî pêwîste navnîşana çîrokan ji navê Firinde,

[142]Semîr Ebdulwehab, *Edeb El-Etfal Qrat Nezriye û Nemazic Tetbîqîye,*Weş. Dar El-Meysere Eman, 2006, r.142.
[143] Mehemed Reşîd Feteh,*b.n.b.*, r.26.
[144] Mehemed Rehîm Remezan,*b.n.b.*, r 4

Ajal û navekî xwezayî pêkhatibe. Ji ber ku ev hemû di jîyanê de nêzîkî zarokane û zarok ji wan hesdike.[145]

3. Pêwîste di çêrokên zarokande parastin li burîyê serekîya çîrokan bike. Zêde neyê alozkirin ji ber kû zarok hêza fêmkirinê namîne û mejîyê wan belav dibe. Gêlek caran dirêjkirin dibin sedemê lewazîya çîrokê. ji ber vê jî pêwîste giringîyekî zêde bide, bi hişê serekî her çîrok diçe nava dilê zarokan de û pê keyfxweş dibin. Pêwîste Kar li ser wan bên kirin û berdewam bin li ser xwendina çîrokan .[146] Çîrokên serkeftî di alîyê zarokan de dibe cihê balkêşî û heskirinê .

4. Pêwîste di çîrokên zarokan de giringî bi wext, cih û xwezayê bê dayîn. Di virde xwesteka me ew cihe ku zarok tê de jîyan dikin. Zarokên îro û duh di gelek alîyên jîyanê de cîyawazin. Ji ber kû ev çîrok zarokên bajaran zêde guhdidinê û pê dilxweş dibe. lê belê zarokên gundan dibe nek wek yên bajaran be. Ew çîrokên di serdemê kevinde ji bo zarokan di hatin gotin, di serdema nihade zarok zêde gohnadinê û giringî jî nadinê. Ji ber vê jî "*Wext û cih gelik pêwîste ji bo bingeha her çîrokekê*."[147]

5. Pêwîste naveroka çîrokên zarokan durbin ji Hişkî, tirsî, dilreq, û bêhêvî yê. Ji ber wêye bandorekî mezin li ser dil û derûnîya zarokan dike. Ev hemû dibin sedemê kû zarok di jîyanê de bê hêz û hêvî bin. Dema ku zarok guh didin çîrokên hişk û bi tirs di heman demê de jê durdikevin. Wateya vê dide kû ev cûrê çîrokan ji bo na goncê, pêwîste ji wan bê durxistin.[148] Ji ber vê jî xwesteka me ewe ku çîrokên ji bo zarokan tê gotin di alîyê wate û naverokê de bibe cihê dilxweşî û aramîyê di zarokan de bibexşe.

6. Pêwîste di çîrokên zarokan de alîyê ziman giringîyekî gelek bê dayîn. Hem di alîyê çîrok bêjde hem ji di alîyê wan kesên kû çîrokên zarokan di nivîsinin de.

[145] Mzafer Mistefa Îsmaîl,*b.n.b.*, r 178
[146] Xalîde Qadir Ferac, *b.n.b.*, r.90.
[147] Yasîn El-Nesrî, *Delalet El-Mekan Fî Qises El-Etfal*, Weş.Dar El-Seqafe, Bexdad,Îraq,1985, r.6.
[148] Mehemed Reşîd Feteh,*b.n.b.*, r.33.

Pêwîste ew cûreyê ziman bê karanîn li gel qonaxa temenê zarokan bi goncêt. Nabe bi zimanekî hêsan yan jî zimanê çîrokên mezinan ev cûreyê çîrokan bên nivîsandin yan gotin. Pêwîste peyv di asta hiş, hizir û temenê zarokan debe. Da ku xezîneya zimanê wan pêşvebiçe.[149] Başe ku zimanekî şirin, hêsan, sade di nava çîrokên zarokan de bikar bên. Dur be ji peyvên giran, weger û zaraveyekî giran. Mînak; Peyvên wekî;Borjova, Taktîk,Emperyalîzim, Şovîzim...hwd. Ev peyvên bi vî awayî zarok jê fêmnakin. Ji ber vê jî nabe em fikra van peyvan bikin û ji bo wan bi kar bînin. Zarok hêdî hêdî van peyvan di qonaxên mezin bûnê de digirn û jê fêmdikin.[150]

7. Pêwîste di çîrokên zarokan de waneyên perwerdê bi awayekî vekirî û eşkere bê dîyarkirin û nîşanî zarokan bê dayîn. Dema çîrok gotinê de ya herî xweşik ew çîrok bêj bandorekî zêde li ser hiş û hizrê zarokan bike. Ji ber ku em dikarin bi gelek şêweyan zarokan perwerdebikin. Yek ji van şêweyan jî gotin û xwendina çîrokane.[151]Dîyare ku çîrok giringîyekî gelik heye di jîyana zarokan de. Ji ber ku tejîye ji serpêhatîyên wekî buyer,dav û exlaqê ciwan. Bi vê rejî reşenbîrî zanyarîyên zarokan zêde dibin bi vê re fêrî gelek berjengên exlaqîya mirovatîya baş dibin. Exlaqê wekî,rêzgirtin, rastgoyî,destpakî,dilsoz û nîştîman perwerî. Her wiha dur dikeve ji berjengên wekî, direw, dizî, Gunehkirin û Hîle, ev hemû ji bo perwerdekirina zarokan reftarên rihîne.[152]

Bi vî awayî zarok bextewer, bi sud dibin, kesayetên bi hêz û bibawer jê derdikevin. Dibin kesên Çalak di paşerojê de.

---

[149] Necîb El-Teylanî, B.3, Weş. El-Rîsale, Beyrût,1991,r.145.
[150] Mehemed Rehîm Remezan,*b.n.b.*, r.70.
[151]Qereçatanî, *b.n.b.*, r.71.
[152]Qereçatanî, *b.n.b.*, r.72.

## 3.5.Rola Çîrokên Folklorî û Cûreyên Wê Di Perwerdekirina Zarokan De

Gelê kurd xwedî sermayekî dewlemend a folklorê ye. Bûye çavakanîye kî baş ji bo wêjeya gelê me. Em di karin bêjin gelê kurd di vê derbarê de dewlementirîn gele li ser ruyê erdê. Folklor bi giştî xizmeta gelek alîyên mirovan kirîye. Di gelek alîyan de buye bingehek ji bo pêşxistina jîyana gelan û asta wan ya rewşenbîrî. Zarok wekî çînekî giring ya jîyana mirove. Jisudên folklorê bê beş ne bûne, ji ber wê jî em dikarin bêjin; Folklor jî yek ji çavkanîyên bingeha rewşenbîrîya zaroka ne. Pêkhateyên kesayetîya zarokan ava dike. Ji ber ku sermayekî dewlemende xwedî gelek babetên cûrbicûrin [153]Yek ji van babetan jî ji Çîrokê pêktê. Dinava kurdan de Hîkayet yan neql jêre dibêjin, di nava kurdên Lor dejî metelok jêre dibêjin. Beşekî mezin a wêjeya kurdî ye .[154]Dem bi dem, pişt bi pişt zarok dayîk û bav dibihîse û piştre diçe di nav berhemên takekesî de. Pişt bi hemû berhemên gel ve girê dide. Rûyê wê yê eşkere jî ji sadeyî,alîyê zimanî û îfadekirinê pêktê. Tayebtî zimanê gelan pêve dîyare.[155]

Çîrokên Folklorî i gelek pend û amojgarîyên bi sûd tê de heye. Hêzê dide ji bo fêrkirina bihayê mirovatî û rewşenbîrtî. Di hemû alîyên jîyanê de bi çîrokan zarok fêrî reftarên baş û xwezayê dibin, di her çar alîyê jîyanê de dibînın.[156]

Her wiha gelek waneyê cûrbicûr tê deye ku qala paqijî û xwe dur girtin ji derew û dizîyê...hwd, dike. Nabe em vê jî ji bîrbikin ku, hine cûreyên çîrokan hene ku hişkî, buyerên kuştinê, birîn nexweş, û dêw dinava xwe de digire. Hinek din jî hene ji bo zarokan gelek goncavin ku dinav wande buyerên heywanan hene.[157] Çîrokan ji çîna hêsanî ya gel çavkanî girtîye. lê belê li ser zimanê ajal û firindeya dibêjin. Di alîyê perwerdê dayîk û bav û ew kesên kû çîrokan dibêjin pêwîste qala hişkî , tirsî û tiştên ne xweş neke di nava çîrokê de. Eger qal jî kir pêwîste li ser şêweyê perwerdê rast û goncav qal bike. Pêwîste ji bo zarokan bê gotin xwe dur bigirin ji van reftaran. Ji ber ku encamekî pasîf û bandorîye kî xirap li ser kesayeta wan dike.

---

153 Rustem Bacelan, *Mindal û Folklor*, “ Govarî Karwan”, J. 147,Sal 2000, r.57.
154 Îzedîn Mistefa Resul, *b.n.b.*, r.15.
155 Hewramî, *b.n.b.*, r.75.
156 Mehemed Reşîd Feteh, *b.n.b.*, r.25.
157 Razaw Reşîd Sebrî, *b.n.b.*,r.131.

Nivîskar û lêkolînvanên derbarê wêjeya folklorê de dialîyê naverokê de çîrokên zarokan dabeşî bi ser çend beşan de kirîye. Hejmarekî geleke lê emê hewil bidîn van cûreyan bêxin ber çavan, ku rol û bandorekî mezin li ser pêşxistina perwerdeya zarokên kurdan dike.Ya herî giring jî ev e:

### 3.5.1.Çîrokên Ajalan

Çîrokên heywanan giringtirîn cûreyê çîrokê ye ku zarok jê hesdikin û guhê xwe didinê. Herî zêde qala wan ajalan dike ku li dewruberê wan de heye. Bi zimanê ajalan buyer û serpêhatîyê sade ji wan re dibêje. Zarok dikarin bi hêsanî fêmbikin. Karekter û kesayetên di nava çîrokê de cûrbicûr têne berçav. Gelek car ji ( Ajal û Ajal,Ajal û Mirov, Mirov û Ajal ) ' an pêktê. "*Ev çîrok û gotin ji serketî dibin ji bo zarokan, ku li ser zimanê heywanan bê gotin û nivîsandin. Ji ber ku gelik zarok ji heywanan hesdikin û tirsa wan dişkê*."[158]

Ev cûreyê Çîrokan ne tenê zarok belku kesên mezin ji sudê jê digirin. Dema ku li ser zimanê heywanekî wekî; Rovî û Hirç yan jî Şêr Leklek çîrok ji bo zarokan dibêjin. Ew qet Fikirnake ku heywan na axivin. Ji ber wê ji bi balkêşî guhdar dike ka wê encama wê çawa be. Wêne û nîgarên reng bi reng li ser hestên zarokan bibandorin.Bi çîrok dikare zincîrek wêne pêşkêş bike. Zarok dikare gelek buyeran bi hev ve girê bide.[159]Di naverokê de zarok fêrî gelek bihayên bi nirx dibin. Mînak; rastgotin, destpak, Arîkarî, Qehremanî...hwd . Pirtûka " *Kilîlê û Dimne* " ku xwedîyê wê fîlozofê Hindî (*Beydeba* ) ye, Kilîle û Dimne pireji çîrokên bi nirx, gotinên xweş,ramyarî, zanistî û amojgarî ji bo kar û barên mirovan, ku ev hemû jî li ser zimanê heywanan hatine gotin.[160] Peyama çîrokên ajalan peyamekî mirovatî û perwerdeyî ye. Qala babetên renga reng yên jîyanê kirîye. Gelek caran jî pirsgirêkên dinava du kes yan jî du hevsarende pê hatîye çareserkirin.[161]

---

[158] Mehemed Rehîm Remezan,*b.n.b.*, r.8.
[159] Îbrahîm Qadir Mehemed, *Bayexî Çîrokî Mindalan*, "Govarî Runşenbîrî Niwê", J.52,S. 1976, r.41.
[160] Beydeba, *Kîlîle û Dimne*, Wer.Omer Tufîq, Weş. Genc, Silêmanî, 2010,r.3.
[161] Mzafer Mistefa Îsmaîl,*b.n.b.*, r.143.

Bê goman çîrokên ajalan bi şêweyekî berfireh belav bûye, zarokên li seranserî cîhanê hemû yê jê hesdikin. Lêkolînvanan derxistine holê ku ew çîrokên balkêşîya zarokan dide xwe gelek tîrîn ev jî ji çîrokên ajalan pêktê. Di be ku ev ji çîrokên sade û pêşxistîne û mirovan rolê ajalan lehîstîne. Ji ber vê jî zarok gelek jê hesdikin.[162] Dema ku zarok li ser zimanê ajalan guh didin çîrokan, buyer û serpêhatîyan zutir di mejîyê xwede digirin. Eger em bi çavê perwerdê temaşeyî rol û bandorîyên van çîrokan bikin em ê bibînin ku şêweyê reftarê zarokan hatîye gohertin. Çîrok gelek pend û amojarîyên baş û gelek bihayê qezencê perwerdê tê deye. Wekî çirayekî geşû ronî pêşeroja zarokan ronî dike. Lê belê na be em vê ji bîr bikin ku pêwîste hest bi xwestekên her qonaxek ya temenê zarokan bikîn. Ka emê çi cûreyê çîrokan hilbijêrîn û ji bo wan bêjîn.[163]Her qonaxek ji qonaxên pêşveçûna zarokan ji bo bazarkirina li gel çîrokan merc û taybetmendîyên xwe heye. Ji ber ku zarokên temenê wan biçûk xwe bi pelewanê çîrokên ajalan ve girê dide. Lê belê zarokên temenê wan mezin tenê xwestekan wan wate û naveroka çîrokane. Ev jî çîrokên ajalan digire nava xwe.[164]

Di nava çîrokên ajalan de "*Gelek caran ajalên wekî sembol bi kartên mînak; Şêr: Sembula deshilatdar û zîrekîyê ye. Rovî : Sembula hîlebazî û rêyên xirape.*"[165]Ev cûre jî wisan li zarokan dike ku berdewan li ser naveroka buyeran bi fikire û lipey rastîyê de bi gere û pirsyar bike. Ev pirsên zarokan her bi xwe alîyên perwerdê ne.

[162]El-Hîtî,*b.n.b.*, r.148.
[163] Mehemed Reşîd Fetah,*b.n.b.*, r.26.
[164] El-Hîtî,*b.n.b.*, r.150.
[165] Xalîde Qadir Ferac,*b.n.b.*, r.80.

### 3.5.2.Çîrokên Efsaneyî

Zarok gelek ji çîrokên efsaneyî û buyerên xeyalî dike. Her çiqase em nikarin ji buyerên wê fêmbikin, ji ber ku buyerên wê aqilê mirovan nagire. Lê belê bingehek başe jibo xeyalbazî û hizrên fireh yên zarokan û bidestxistina xwestekên wan. Bi mercekê dayî û bav û mamoste di karin bi cûrekê çîrokên bi tirs ji bo zarokan bêjin; ku zarokan keyfxweş bike ne bitirsîne. Ji ber ku,efsane, cûre çîrokeke ku mirovan çêkirîye. Peywendî bi xudawend ve heye. Hinek caran hinek hêzên nedîyar ên wekî, Dêw û Cin jî tevli dibe. Di efsanê de rêyekî baş dîyar dibe ew jî serkeftina hêza baş bi ser hêza xirap û şerxwaz de ye. Peywendî bi cih û dem ve nîne. Bi vêre xweşîyekî bi destpêka mirovahî û bi giştî zarokan dibexş.[166]Buyeran cilekî efsaneyî li ber xwe kirîne mirov nikare jê bawer bike , ji ber ku mejîyê wan jê nagire. Mirovan di wê rojê de hest, hizir û tevgera xwe dinava gerdunekî neyînî de dîtin. Di derbarê nebunê de dîyardeyên xwezayî gelek pirsyarên bê bersiv li gel wan çêbûn. Di xwestin bizanin ew tişt ji ber çi çêdibin. Wisan fikir dikin ku hêzekî ne dîyar heye van tiştan çê dikin.[167]

Mirovan dixwestin ji rawanîya gerdunê fêmbikin. Ji ber vêye dibînin bingeha gelek çîrokan jî ji vê çêdibin. Mirov her dem bi bi çêbûna cîhanê, sedsalan,bûyerên xwezayî yên wekî.baran, lêhî, bablîsok, birosk, erdhej, roj, heyîv û sitêrkan ecêb maye.[168] Her ji ber wê ye ku, zarok jî ji van cûreyên çîrokan hesdikin. Têde qala buyer û kesayetîyên efsaneyî dikin. Ji ber ku cihanek pir ji kevin zincîrî dibe. Cîhanekî tejî Sêhir xeyal û bûyerên balkêşin.[169] Lê belê nabê vê jî ji bîr bikin. Efsane divê ji wan tiştan bê paqijkirin ku dibin sedemê tirsîyê.. Ji ber ku çîrokên efsaneyî yên zarokan xeyalê zarokan ji cihana teng dibe ji derve. Rihê başîyê tê de bilind dibe. Fikreke li ber başî û xirabîyê di sekine. Ferî wê dike ku bi kare başî û xirabîyan ji hevdû cûda bike.[170]

---

[166]Xalîde Qadir Ferac,*b.n.b.*, r. 63.
[167] Hewramî,*b.n.b.*, r.73.
[168]Mewlud Îbrahîm Hesen, *Qedexe Şikênî*,Weş.Desgehê Serdem,Slêmanî,2000, r.137.
[169]Mizafer Mistefa Îsmaîl,*b.n.b.*, r.152.
[170]Hewramî,*b.n.b.*, r.138- 139.

Çîrokbêj nabe hemû cûreyên efsaneyan ji zarokan re bêje,bi taybetî di qonaxa zude. Pêwîste li gorî temenê zarokan çîrokên efsaneyî amade bike û ji wan re bêje. Dayîk û bav pêwîste agahdarê van tiştan bin. Çîrokên efsaneyî de tiştên tirs bê bandor bikin û paqij bikin bi şêweyekî pêşkêşî zarokan bikin ji çîrokê sudê wer bigirin û karên xirap û baş ji hev cuda bikin. zarokan wisan fêrbikin ku rêya rast hertim hilbijêrin. Efsane rolekî mezin di jîyana mirovan de dîtîye. Bi efsaneyan re mirovan karîye xwestekên xwe bi cih bîne .[171]Demakû ji zarokan re qla birosk , baran,roj, heyîv û sitêrkan dike, hestên wan zêde tevger dikin û fêrî raman û hizîrînê dibin. Piştre pirsan dikin û li ser dihizirin. Pirsayrkirin jî alîyekî yê fêrbûna perwerdê ye.Bi vî şêweyî çîrokên efsaneyî bi wî zimanê sade û pêşketî dibêjin. Rol û bandorê liser zarokan dike. Rewşa hewayê di efsaneyê de hêza hizîrînê zêde dike û rêya perwerdeya wan ronî dibe.

### 3.5.3.Çîrokên Resen

Ew Çîrokên di wextekî û rojên kevin yê mirovayetî yê de bi şêweyekî dem bi dem û ser zimanî gihiştîye me. Qalan wan buyer û serpêhatî yan dike kû di vî wextî de qewimîye. Li ser zimanê wan nivş bi nivş ji mere hatîye. Naveroka çîrokênwan jî wekî her çîrokek din asayîye û ji babetên wekî: Civakî,Olî, Exlaqî û Evînî.. pêkhatîye.Dîyare, zarok her ku di temende berbi pêşve diçin, ji cîhana xeyalan durtir dikevin ber bi jîyana rast ve diçin.Hewil didin ji wan xeyalê di temenê pêşde dikirin rizgar bibin. Bi wan xeyalan berbi xeletîyan ve diçûn. Zêdetir nêzîkî tiştên rast dibun. Ji ber vê jî herî zêde ew çîrokên rastîya civakê û xwezayê bala wana dikişand û guh didanê. Zarok, xwestekên wan ê di çîrokên xeyalî de dihatin ditîn, hemu rêkirin di wan çîrokên ku nêzîkî rastîyê ne.[172]

Dema ku ji zarokan re qala çîrok û buyeran tê kirin, di heman demê de bandorê li ser reftarê wan jî têkirin. Çîrokên folklorî ê rastî,naveroka ji hemû corên buyerên rast û serpêhatîyên pelewan û qehremanên rast pêktê. Ev jî dibe sedemê ku zarok hîn zêdetir ji buyerên çîrokan bawer bike. Herî zêde naveroka van çîrokan

---

[171]Kemal Merûf, *Rexneî Niwêy Kurdî*, Weş. Jîn, Silêmanî, 2007, r.98.
[172] Razaw Sebrî Reşîd,*b.n.b.*, r.139.

peyamên perwerdekirinê di piştre hene û pêşkêşî kesê beraberî xwe dike. Ev corên çîrokan jî ji qehremantî, xurtbun, çavtirsî, destpakî û reftarên bilind pêktê.

Gelek caran buyerên van çîrokên rastî li gorî temenê zarokan na guncên. Ji ber vê jî pêwîste dayîk û bav yan mamoste agahdarê van tiştanbin û çîrokan li gorî temenê wan hibijêrin û bêjin. Pêwîste li ser şêwazê perwerdeyî,mirovayetî, reftarî û alîyê aramîya deronîya zarokan de bin .

### 3.5.4.Çîrokên Ayînî ( Olî )

Bingeha Ayînê,rol û bandurîyekî bi hêz li ser reftarê mirovan bi giştî û bi taybet li ser babetên fêrkirina perwerdê de heye. Peywedîya mirovan her di kevin û serdema ni hade jî li gel ayînê heye. wekî çavkanîyek a cihê bextewarîyê hatîye dîtin. Ji ber vê jî em dikarin bêjin: Çîrokên Ayînî, ew cûreyên çîrokane ku qala hinek babetê wekî : Îbadet, Bawerî, Çawa qalkirina jîyana Pêximber , reftarên ayînî, çîrokên kurana pîroz û pirtûkên asîmanî dike. Çîrokbêj bi rêya van çîrokan re ayînê li zarokan dide naskirin û şîrove kirin. Her wiha vê jî ji bo wan dide dîyarkirin hertim karên baş û xêr li ser karê xirap û şerxwaz deye. Ev cûreyê çîrokan jî bi şêweyekî pozîtîf ji bo çêkirina bîr û bawerîyê di deronîya zarokan de. Hemû ew bihayên mezin têdene ku perwerdeya wan pêşdixe.[173]Her wiha ayîn rêya jîyana mirovan xweş dike. "*Ayîn,bernameya jîyana serfiraza herdemîye û bi ayînê jîyan xweş dibe*."[174]

Di çîrokên ayînî de dikarin qala van tiştan ji bo zarokan bikin. Şopdarên desturên ayîna îslamin,Xwedina qurana pîroz û fermanên Pêximber ku hemû di derbarê perwerdekirinê dene. Mînak: Pak û paqij, rêdarî ji bo dayîk û bav, Kesên mezin, arîkarîdayîna hevdu, Durketin ji karên direw,xirap, Reftarên ne dichde û gotinên ne xweş. Herwiha di rêya çîrokên ayînî de zarok fêrî Nimêj, Destnimêj girtin û giringîya ayîna îslamê di jîyana rojane de dibin.[175] Di nava çîrokên ayînî de gelek caran qala sezayên karê mirovî tên kirin. Bi vêre jî dayîk û bav, mamoste dikarin sûd

---

[173] Razaw Sebrî Reşîd,*b.n.b.*, r.141.
[174]Îdrîs Ebdula, *b.n.b.*, B.3,r.39.
[175]Fazil Mecîd Mehmud,*b.n.b.*, r.166.

ji rêziknamên ayînî bi girin. Ji bo hibijartina aiîyên baş, ji bo bi destanîna pişeyên baş ê xudayî,du xistin ji karên xirap û ne pesend.

### 3.5.5.Çîrokên Pêkenokî

Ev Çîrokane jî di şêweyê Pêkenînê deye. Xweşî û şadîyê têxe dilê zarokan. Sedemê wê jî çareserkirina gelek nexweşî û alîyê derûnîya zarokan ne. Ew jî wekî beşek ji wêjeyea folklorê giringîyekî zêde heye. Di gelek alîyan de ev jî wekî beşên din ê folklorê de kevne. Çîrokekî gelek bi nirxe û samanê neteweyîye, wêjeya ser zaimanê gele. Yek ji wan cûreyê wêjeyê ye ku mora cih û demê wê pêve dîyare. Neynikeke gelek buyerên serdema xwe dide dîyarkirin. Gotinên wê ê xweş dîyare ê kîjan gelî û miletîne. Dikarin gotinên xweş ê İngilîzî, Erebî û kurdî ji hev cuda bikin. Gelek ser pêhatîyên mirovî di nava gotinên xweş,henekî û pêkenînde dirar dibin.[176]

Çîrokên pêkenîn, bi temen,cih û asta rewşenbîrîya xelkê pêşketina xelkê û bandorîya xwe nîşan dide. Di her rewşê de bi şêweyekî cûrbicûr derdikeve. Ji ber ku, çîrokên pêkenîn ê kevin gelek komedî û henekî bûn. Belkû di çîrokên niha de tama pêkenînê tê de ne mabin. Ew çîrokên herî zêde girêdayî gund dikin pêkenok, belkû yên di nava bajêrde zêde nekarin bikin pêkenok. Ew çîrokên ku zarok pê dikenin belkû kesên mezin ji wan re asayî bên û pê nekenin. Yan jî ew çîrokên ku zarokên li bajaran dijin wan dikenîn belkû zarokên ji derveyî bajar dijîn ne kenînin.[177] Wêjeya zarokan bêyî çîrokên pêknok û henekî nabe. Ji ber ku di pişt pêkenînê re gelek xwestek û aramancên biha derdikeve holê.Mînak : Heskirin, Rugeş, dilnerm,dilsozû rast gotin... hwd. Ev jî bi mercekê bandorîyê xirap çêneke hestên kesekê birîndar neke. Ev çîrok bi vê hatîye nakirin ku sivik asanî û kurtin. Babtên wê jijîyana rojne hatîye girtin. Xeyalên berfireh têde cih digire zarok pê keyfxweş dibin. Zarok pê fêrî guhdarkirina çîrokan dibin û zêde li ser buyeran lêhurbûnan çêdikin. Ev bi xwejî armanceke ji bo fêrkirinê. Ev cûreyê çîrokan sedemeke ji bo nîşankirina kêmasîyên civakî.Ji bo beraberî van kêmasîyan bisekine û van kêmasîyan perdeyekî bi serde

---

[176]Mukrî, *b.n.b.*, r.79.
[177] Hewramî, *b.n.b.*, r.137.

bîne. Ev jî di şêweyê çîrokên kurt de derdikeve û ev çîrok ji alîyê çend kesên navdar û qehraman ve tê gotin.[178]

Di alîyê kurdan û hemû gelan ve şert nîne ku kesên nav çîrokên pêkenînê de her mirov be. Bel ku gelek caran ser zimanê ajal û firindeyan jî hatibe gotin. Ev jî hemu dibin nîşan dijîyana mirovande. Çîrokên Pêkenok bandorîyekî zêde li ser dil û derûnîya zarokan heye. Ji ber wêye ku wan keyfxwş dike. Di alîyek din de jî di heman demê de dibin sedemê rexnegirtinê û rêyên ne pesend ê xelkên dinava civakê de.[179]

Bi vê re jî zarok di çarçûveyekî perwerdeyekî rast de fêr dibin. Pêwîste kesekî çalak û aktîf tiştên xirap û ne dirêde, kesên nebaş ê di nava civakê de destnîşan bike. Pêwîste qala kesên hunera pêkenînê ê dinava civaka kurdan de bê kirin. Mînak: kesên wekî, Mela Mezbor, Ehmed Kirno, Xalê Receb, Lale Serhed...hwd . Evan kesan rolekî baş hene ji bo pêkenîn û henekirinê.

[178] Îzedîn Mistefa Resul, *b.n.b.*, r .91.
[179] Hewramî, *b.n.b.*, r.134.

# BEŞA ÇARAM

## 4.PİRAKTÎKKİRİNA ÇÎROKAN

### 4.1.Rola Çîrokan Di Perwerdekirina Derûnîya Zarokan De

Zarok di dema çêbûnê de, zindîyekî gelek nazik û hestyare. Bi hêsanî dikevin bin bandora tiştên dewrûberê xwe,li gel wan girêdanekî çêdike. Bi taybetî jî "Çîrok"ji ber ku, zarok dikarin bi çîrokan ji gelek alozîyên derûnî rizgar bibin. Ji ber ku gelek naverokên çîrokan hene dibin sedema: Pêkenîn, dilxweşî, girîn, henekî û acizbûn...hwd. Ev hemû ji bo deronîya zarokan dibin dergehek ji rizgarbûna alozî û pirsgirêkan.[180] Ji ber van sedeman, pêwîste em wan çîrokan hilbijêrîn ku ji bo perwerdekirin û pêşveçûna zarokan sudekî mezin ê xwe hebin. Dema çîrok gotinê de pêwîst e çîrokbêj bi baldarî li ser rewşa derûnîya zarokan bisekine. Çîrokbêj pêwîste wisan çîrokê bêje ku di zarokan de hêz û bawerîyê çêbike.

Bê goman çîrokên folklorî, xwedîyê taybetmendîyên cîyawaz û serkeftîne. Ev taybetmendîyên cîyawaz jî wisan bi zarokan dike ku bikevin bin bandora çîrokan. Ji ber ku her çîrokek ji çend pend û amojgarîyan pêk hatîye.Dema ku em alîyên baş ê çîrokan bigirin dest,wê demê emê bikarin zarokan ji şermê, tirs û xeman xilas bikin. Zarokan di alîyê perwerde û fikirînê de berû pêş bibin.

Hinek çîrok jî hene bandorîyê li ser derûnîya zarokan çêdikin. Em dikarin çend mînakên wan çîrokan bidin dîyarkirin. ( Rovî û Çûk, Hêlîna Qirê, Piling û Rovî, Serkudîle, Lawikê Zîrek , Ferec, zem,Poz Bilind..hwd ). Ev cûrê çîrokan di alîyê naverokê de em dikarin bi ser her du qonaxên temenê ( Mezin û Biçûk ) ê zarokan de dabeş bikin.

[180]Qereçatanî, *b.n.b.*,r.72.

### 4.1.1.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Derûnîya Zarokên Temen Biçûk De (3-8 ) Salî

Di vê qonaxê de em dikarin van çîrokan destnîşan bikin ku, bandorîyekî zêde li ser zarokên temenê wan ji ( 3-8 ) ' salî de heye. Di vî temenî de; "*Zarok hemû tiştên hawirdor nasdikin. mînak : Dema ku dest dide tiştekî germ, pê dihese destê wî dişewite , Çêlek şîr dide wî/wê, mirîşk hêkan dike."*[181] Karekterên ku dinava çîrokê de ji du/ sê karekteran derbaz nake. Pêwîste naveroka çîrokên vê qonaxê li gel temen û derûnîya zarokan bigoncên.

Mînakên çîrokên bi vî rengî gelek in. Wekî: Rovî û Çûk, Hêlîna Qirê, Tasa avê, Piling û Rovî...hwd. Gelek mijarên cûrbicûr di van çîrokan de hene. Bê beramber evan mijaran bandorîyê li ser derûnîya zarokan jî çêdike.

#### A.Waneya Keyfxweşî û Ji Xeman Rizgarbûn :

Em dikarin di virde mînakên çend çîrokan destnîşan bikin. Di heman demê de wane û alîyên derûnîya wan jî dîyar bikin. Wekî ku di çîroka ( Rovî û Çûk ) ê de hatîye dîyarkirin." ***Çûkek ciwan û xweşik di daristên de ji vî alî difirîya alîyê din. Dema difirî dil xweş dibû xem di nava dilê wê de ne bû...Lê belê rovîyekî fêlbaz xwe diavêje û wê digire... Çûka xweşik ditirse xweşîya wê hemû diçe... ji tirsan hemû laşê wê dilerize...Rovî pirsek ji çûkê dike û dibêje; Belê çûka biçûk bi çi tiştî tu ev qas aram û dilxweş î ?! Hertim gotin, soz û awazên xweş di xwînî!! Êz rovîyekî ev qas bi hêzim lê çima hertim xemgîn û dil teng im ?...Çûk dibêje : Mam ê rovî,eger tu bixwazî bersiva xwe bigirî pêwîst e tu destpêkê de min Azad berdî. Rovî ji got: Keremke tu Azad î...Çûk jî gelek keyfxweş bu bi vê biryara rovî. Ew tirsa wê hemu çû... Çûkê li rovî temaşe kir û got: Rast e ez lewazim lê rexmê hemû tiştan ez keyfxweş û dil xweş im. Tu bi hêz î lê hertim xemgîn û dil teng î ?! Ji ber ku ez ji hemu ajalan hesdikim... Ez hizra zîyandana kesekî nakim... Lê tu hertim bi zîyandana ajalan ve mijûl î. Çiqas tu zîyanê bidî xelkê tu ew qas zîyanê didî canê***

---

[181]Ezîz Gerdî*, Midal û Perwerde Û Çîrok*, "Govara Nûserî nwê", J.11, Hewlêr,1972, r.17.

***xwe jî. Ji ber wê ez hertim keyfxweş û dil xweş îm. Wijdana te jî diêşe ji ber wê jî tu hertim xembarî***."[182] .

Di vê çîrokê de zarok bi azadbûna çûkê keyf xweş dibin. Di alîyê derûnî de jî hest bi aramîyê dikin. Xem ji dil û derûnîya wan kêm dibe, ji kes û karên hawirdorê xwe hesdikin. Lê belê kesên mîna rovî hertim xemgîn û dil teng dibin. Ji ber ku zîyanê didin kesên hawirdura xwe;Wijdana wana ne rihete. Di jîyanê de kesên mîna rovî tu caran keyfxweş nabin.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De :** Zarokan keyf xweş dike, ji xemgîyê rizgar dike û cîhana wan aram dike. Zarokan fêrî zîyannedayîna kesên din dike. Eger berevajî van rastîyan bikin wê di jîyanê de hertim xemgîn,dil nexweş û dil teng bin.

Her wiha di heman şêweyî de di çîroka ( Hêlîna Qirê ) de jî ji bo zarokan hinek waneyên derûnî û perwerdeyî ên bi sûd hene. Di çîrokê de dibêje; "***Fîlek her roj pêl hêlîna Qirê dike û hêlîna wê xirap dike...Qirjî bi vê xemgîn dibe... Li pey çareserîyekê digere...Qir radibe û diçe cem beqek, serpêhatîya xwe û hêlîna xwe jê re dibêje... Beq jî bi vê xemgîn dibe ew jî radibe diçe cem pêşîyên dewruber... Buyera Qirê ji wan re dibêje û got: Pêwîst e em çareyek baş ji bo qirê bibînîn, da ku em ji vî zalimî rizgar bikîn. Pêşîyan jî gotin : Em hemu amade ne... Şev hat û roj çû... Fîl disan wekî her carê berbi hêlîna qirê ve çû. Da ku hêlînê dîsan xirap bike. Pêşîyan jî bi hevre êrîş kirin ser fîl û çavê wî kor kirin... Beq jî li nêzîkî çalê destbi qîre qîrê kir... Fîl jî ber bi dengê beqê ve rêket... Di encamê de fîl ket di çalê de û parçe parçe bu***."[183]

Di vê çîrokê de jî zarok di alîyê derûnî de keyfxweş dibin, taybet bi arîkarî dayîna beq û pêşîyan ya ji bo Qirê. Ji ber ku parastina hêlîna qirê kirin. Çavê fîlê zalim kor kirin û ew avêtin di çalê de. Ev jî xweşî û pêkenînê di zarokan de çê dike. Hem jî wan di alîyê derûnî de keyfxweş dikin.

[182] Îdrîs Ebdula Mistefa, *Wane Zêrînekan*,Weş.Wezareta Roşenbîrî,Hewlêr,2008, r.309.
[183] Omer Îbrahîm Ezîz, *Rêwî Germiyan û Kwêstan*, Weş.Edîb, Bexdad, 1984, r.38-40.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De :** Derûnîya zarokan keyfxweş û aram dike. Zarokan fêrî wan tiştan dike,ew kesên xirap,sitem û zalim pêwîste bê ceza kirin. Her wiha nîşanî zarokan di ku beraberî tiştên xirap helwesta wan jî hebe. Hertim arîkarîya kesên mezlum bike. Bê goman zarok ji encama çîrokê gelek keyf xweş bûn û xemgînîya wan nema.

### B.Waneya Geşbînî û Bêhêvînebûnê:

Pêwîst e zarok hê di temenê biçûk de fêrî geşbînî û bihêvîbunê bê kirin. Ji ber ku da beramberî zîyan û reşbînî yê neyê kirin. Eger zarok bêhêvî û bêgeşbînî dibin paşe roja wan reşdibe. Hewildana wan a jîyanê sist û lewaz dibe. Di jîyanê de geşbînî û bêhêvînebûnê gelek çîrokên girîng û binirx hene. Di alîyê derûnî de jî zarokan fêr dikin ku dema beramberî pirsgirêkan hatin bêhêvî nebin. Di naveroka çîroka ( Tasa Avê ) de jî dîyar e. Ev çîrok jî bi vî rengî destpê dike; "***Qelereşik dikeve nav çolekî rut û hişk de. Li pey tasek av digere... Çengê wê ne diket... Ji tîbunê hinek maye bifetise... Piştî ewqas li hawirdor zivirî û gera vê carê çavê qelereşik bi tasek a avê ket...Ji keyfan hinek bihêz hatê... Qelereş hat ser tasa avê...Her çiqas serê xwe xist di tasê de jî nikilê wê ne gihişt avê...Ji ber ku av heya nîva tasikê bû. Qelereşik jî bi vê xemgîn bu...Piştî ku hizirî bi lez kevirên biçûk avêt binê tasê de ji bo ku av biser bikeve. Dema av bi ser ket vê carê têr av vexwar***."[184]

Di vê çîrokê de zarokan di destpêkê de alîyê derûnî de hest bi bêhêvîyê kirin. Dema ku qelereşk dikeve deştekî hişk de û bê av dimîne, hema bêje wê ji têhna bifetise û li pey avê digere. Ev hemu bandorîya bê hêvîyê li ser wan çê dike. Yan jî dema zarok dibihîsin devê qelereş nagihê avê ku vexwe, lê disan jî a herî girîng çareserkirina bêhêvîya zarokan e. Zîrekîya qelereş geşbînîyê di wan de çêdike. Qelereş bilez kevirên hur avêt binê tasê de, av hêdî hêdî bilind bû. Bi bilindbuna avê re devê wê gihişt avê û têr av vexwar. Bi vê yekê re zarok keyfxweş dibin û di derûnîya wan de aramî çêdibe.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:**Zarokan Fêr dike, nîşa wan dike, ku çi dema beramberî pirsgirêkan hatin pêwîste hewildan di wan de çê bibe. Bifikirin

[184] Kurdistn Mûkiryanî,*Bîst Çîrokî Folklorî Kurdî*,Weş,Roşenbîrî, Hewlêr, 1984, r.38.

û bêhêvî nebin. Geşbînî bin di jîyanê de û ji hemu pirsgirêkan re çareserîyê bibînin. Ji ber ku dema mirov bi geşbînîyê re bifikire bêgoman wê bigihije armanca xwe. Lê belê eger bêhêvî be û reşbînî be, wê çi pirsgirêkan çareser neke. Ev jî dibe sedemê ku alîyê derûnîya zarokan têkbiçe. Wê ji keyfxweşîyê bêpar bimînê û wê di jîyanê de hertim ne serkeftî be.

## C.Waneya Ji Xwe Bawerî û Nemana Tirsê:

Ji bo dîyarkirin û derxistina van xwestekan, wane û zelalkirina derûnîyê, em ê di çîroka ( Piling û Rovî ) de bidin destnîşan kirin. Ka vê çîrokê rolek heye ji xwe bawerî û netirsîna zarokan de. Naveroka çîrokê jî bi vî awayî ye; "***Carek ji caran Pilingek hebu û gelek birçî bu... Digihêje Rovîyek nexweş... Di dilê xwe de dibêje ev nêçîr e...Ji bo wê jî ji rovî re dibêje: Xwe ji bo revê amade neke? yan ez ê te bixwim...Rovî jî ji xwere dibêje eger ez fêlekî lê nekim wê piling min bixwe. Rovî bi tirs û xorşekî temaşeyî Pilingî kir û got: Te hay ji devê xwe hebe, bê edebîyan neke !! Piling bi van gotinên rovî matmayî dimîne ?! Rovî dubare got : Ka tu ji min re bêje tu çîyî ?! Ma tu dikarî min bixwî. Ez ji alîyê Şêr ve wekî mezinê daristanê hatîme hibijartin. Hemu heywanên di daristanê de dibin destê min de ne û ji min şermê dikin... Piling vê carê hîn zêdetir matmayî dimîne ?! Piling jî jê pirsî erê te belgeyek ya van gotina heye? Rovî got: Belê; were bi keve pêşîya min em herin nav daristanê de... Temaşeyî heywanan bike , tê bibînî çawa ji min şermê dikin û direvin. Piling got : Gelek baş e ka em biçin...Bi hev re berbi daristanê ve rêketin... Dema çavên heywanên di nava daristanê de bi piling dikeve, ji tirsa hemu direvin. Lê belê piling ne dizanî hemû ji tirsa wî direvin. Bawerîya wî bi rovî hatî bû wisan dizanî hemu ji ber meznahîya rovî direvin... Bi vî awayî rovî bi fêlbazîya xwe, xwe ji mirinekî bêguman rizgarkir***."[185]

Di vê çîrokê de rovî zîrekîya xwe bi kartine.Bê tirs bersiva piling dide. Tu kîyî ta ku tu bikarî min bixwî ? Te hay ji devê xwe hebe ez ne rovîyek ji rêzê me. Di vir de zarok jî bi heyecan dibin û di alîyê derûnî de ji xwe bawerîyek di wande çê

---

[185] Îdrîs Ebdula Mistefa, *b.n.b.*, r.359.

dibe.Tirs di wan de namîne berevajî hêz û zîrekî di wande çê dibe. Xwe amade dibînîn li beramberî kesên xirap.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De**: Mirov dema beramberî kesên xirap tên pêwîste mejî û zîrekîya xwe bide karanîn. Her wiha ev çîrok jî ji bo zarokan wiha dide dîyarkirin ku, dema beramberî kesên xirap hatin netirsin ji xwe bawer û bihêzbin.

## 4.1.2.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Derûnîya Zarokên Temen Mezin De( 8-15 ) Salî

Ji bo vê qonaxê jî em dikarin van çîrokan destnîşan bikin. Hem di alîyê derûnî û perwerdeyê de rol û bandorê li ser zarokên temenê wan (8-15) salî de çê bike. Ji ber ku "*Ev qonax bi destpêkirina kesayetîya zarokan tê zanîn. Di vê qonaxê de zarok xwe di alîyê derûnî û hêzê de amade dikin.*"[186]

Çîrokên vê qonaxa zarokan buyer û serpêhatîyên wan gelek dirêjin, hejmara karekterên wan jî zêdetire. Ev jî wextê çîrokan dirêj dike. Taybetmendîyên çîrokên vê qonaxê ji qonaxa pêşîya xwe cîyawaztire. Ji ber ku zarokên temenê wan mezin di alîyê hizir û fikirînê de hinek din zêdetir berbi pêşveçunê çûne. Zutir dikarin ji buyerên dinava çîrokê de bi bandor bibin û di jîyana rojanede dubare bikin. Em dikarin mînakên çîrokên vê qonaxê jî destnîşan bikin.Wekî: Serkodîle,Lawik zîrek, Ferec, Zem, Pozbilind...h.w.d. Di van çîrokan de waneyê perwerdeyî jî hene em dikarin dîyar bikin.

### A.Waneya Ji Xwe Bawerî û Çav Ne Tirs:

Di çîroka ( Serkûdîle ) de, hinek waneyên perwerdeyî yên alîyên derûnî ê pêwîst hene. Ev waneyên perwerdeyî raste rast bandorîyê li ser derûnîya zarokan dike. Bi van waneyan re di zarokan de ji xwe bawerbun û zîrekî çêdibe. Ev çîrok jî bi vî rengî ye; "***Li gundekî çîyayî, komek zarok diçin ser çîya û tehtan...Dema ku zarok berbi çîyê ve diçin wê demê asîman jî vekirî ye...Serkûdîlê jî ji hemuyan mezintir e, ji ber wê ew dikeve pêşîya wan.. Gelek dur diçin...Hemu bi komkirina***

[186] Hêmn Jasim Mehemed, *b.n.b.*, r.166.

***daran ve xerîk dibin...Ewir li asîman dîyar bu û roja wan lê hat gohertin...Baranê destpêkir...Çîya û newal tarî bu, li wan bu şev...Zarokan êdî rêya malê ne dizanî...Hemu di tirsîyan...Ne dizanîn berbi kîjan alî ve biçin.Serkûdîle jî ji bo zarok netirsin ji wanre qala zîrektîyê dikir...Piştre li cihekî dur çîroskek agir dîtin...Zarok bi vê gelek keyfxweş bun... Gihan nêzîkî agir...Temaşeyan kir pîre jinek dinava şikeftê de agirek kirîye û xwe germ dike...Serkûdîle jî jê pirs kir; Pîrê tu mêvanan dihewînî ? Pîrejinê jî got: Fermo werin hundir...Zarok hemu razan lê serkodîle ne raza...Ji ber ku wî dizanî pîrejin dêwe û nîyeta wê xirab e...Piştre serkodîle ji pîrejinê re got: Here bi bêjingê ji mere avê bîne... Pîrejin jî çû avê bîne... Heya ew hat... Serkodîle zarokan hemuyan ji xew şîyar dike...Hem derketin ji derve...Ewir û baran xilas bu asîman vebû...Serkodîle hemu zarok rizgar kir û çûn heya gihiştin mal..Bi dil xweşî jîyana xwe bi serxistin***.”[187]

Di vê çîrokê de zîrektî û ji xwe bawerîya ( Serkodîle ) derdikeve holê. Di dema tarî û tirs de ji zarokan re qala tiştên xweş dikir û zîrektî di wan de çêdikir. Bi vê re xwe wekî qehremanekê dide nîşan kirin, hêza zarokên din jî zêde dike û wan di alîyê derûnî de dilxweş dike. Piştre ji destê pîrevokê xilas dike û wan bi saxî digihîne malê. Kes û karên wan jî bi vê keyf xweş dibin.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:**Her dema ku mirov beramberî pirsgirêkan hatin pêwîst e aqil û zirekîya xwe bide karanîn. Ji bo ku xwe ji pirsgirêkan rizgar bike.Ev çîrok jî wisan li zarokan dike ku ji xwe bawer bin û aram bin, xwe di alîyê derûnî de kotrol bikin. Ta ku xwe ji pirsgirêkan rizgar bikin û netirsin. Ji ber ku tirs bandorîyê li ser pêşketina mejîyê zarokan de çêdike û kesayetîyek lewaz di zarokan de çêdike. Dîsan wisan li zarokan dike ku emncama karên di pêşîya wan de sernekevin û bêbawerîyê di wan de çê dike.

Her wiha di çîroka ( Lawikê Zîrek ) de jî hatîye û dibêje: “***Zilamek li gundek ê Kurdistanê jîyan dike, keçek a wî ya şox û şeng û xweşik heye. Şevek ji şevan, ciwan û pîr di dîwanxana wî de kom dibin û dest bi axaftinên xweş, metelok û çîrokan dikin.. Piştre axaftina wan tê li ser şert girtinê...Bavê keçikê dibêje: Ez ê***

[187]Zîad Mehemed Emîn,*Bûkî Xeman*, Weş.Karo, Slêmanî, 2011, r.137.

***şertekî li gel we bikim...Kîjan ji we dikare di vê şevê de biçe dinava goristanê de ji min re savarê çêbike û bizivire, ez ê keça xwe bidimê...Lê belê dema tirsa û revîya... Wê hemu xelk henekê xwe lê bike û carek din nabe bê dîwanxanê... Ciwanekî cahîl û xwîn germ dibêje: Ez ê herim...Li pêşîya çavê xelkê berbi goristanê ve dikeve rê... Bavê keçikê jî, di dilê xwe de dibêje: Bi xwedê ev ciwan ciwanekî çavnetirs û zîrek e... We keça min ji min bistîne.. Wisan başe ku ez herim di nava goristanê de xwe lê bikim reş daku rihê wî bikeve di destê wî de... Bavê keçikê cilekî spî li xwe kir...Bi vê şevê berbi goristanê dikeve rê.. Bavê keçikê Li pişt wî ciwanî di sekine, destê xwe di avêje ser milê wî û dibêje : Ew xwarina ku te çêkirî tu nikarî têra min jî çê bikî ? Lawik jî bêyî bitirse... Dibêje: Hey kesê mirî, min ev xwarin ji bo kesekî zindî çêkirîye... Ew şert jî li vir bi dawî hat lawikê netirs gihişt daxwaz û mirada dilê xwe.***"[188]

Di vê çîrokê de, Lawik ji ber armanc û xwesteka xwe rêyekî gelek bitirs û ne xweş hilbijart. Hizra tirs û revê nake. Hizra wê dike ka wê çawa vî şertî bibe û bigihê keçikê. Zarokên vê qonaxê bi çîrokên wisan gelek keyfxweş dibin. Di xeyalê xwe de xwe di cihê lawikê zîrek de dibînin û tu caran netirsin. Ji ber ku eger bitirsin wê di jîyanê de negihin armanc û xwesteka xwe. Di alîyê derûnî de jî wê têkbiçin. Ji ber vê jî li gorî kesên zana dema zarok ji dil bu, bê tirs kar dike, serdikeve û xelk jî jê re rêzê digire.[189] Pêwîst e em vê jî bizanîn piştî vê qonaxê zarok dikevin qonaxa baliqbunê. Fikrên seksê û heskarîya wî a kesa beraber zêdetir dibe. Ji bo zanînên zêdetir ê vê babetê pêwîst e goh li çîrokên bi vı rengî bigirin ku qala evînî û heskirinê dike.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De**: Mirov pêwîste di jîyanê de hewildan û qurbanîyan bide, ta digihe xwestek û armanca xwe. Nabe tirs û du dilî pêşengîyê lê bike û ji armancê dur bixe. Her wiha ev çîrok vê fêrî zarokan dike pişt bixwe girê bidin ji xwe bawerbin,hizra tirs û revînê nekin, ta bi gihin paşeroja xwe.

---

[188] Behadîn Jelal Mistefa, *Şewanî Caran*, Weş. El-Hewadis,Bexdad, 1990, r.23.
[189]Yaqûb Qesab*, Le Pênaw Perwerdey Mindalan da*,Weş. Hewlêr, 1990, r.78.

**B.Waneya Çêkirina Dilxweşî û Ji Xeman Rizgarbûn :**

Di çîroka ( Ferec ) de, xwestek û waneyên çîrokê em ê destnîşan bikin. Çawa zarokan dil xweş dike û ji xem, diltengîyê rizagar dike. Naveroka çîrokê bi vî awayî destpê dike; "***Di zemanê xwe de sê xuşk bi hevre di xanîyekê de di jîyan....Ya yekem kiraş diçînî a duyem jî kirawî diçînî, ya sêyem jî cil didirû...Şevek her sê bi hevre roniştibun xerîkî çînîn û dirûtinê bun... Yek ji wan siha dizekî di pencerê de dît... Ew ji tirsa...Çû bi îşareta ji her duk xuşkên xwe re got : Netirsin û hewar nekin... Keçik rabû bi dengekî bilind got : Ez di demê xwe de gelik xweşik bûm...Heya wisan lê hati bû xweşibuna min gihiştibû guhê paşa...Paşa dema xweşikbuna min bihîst hat xwastina min û ez jî pêre zewicîm... Piştî demekî zikê min çêbû...Piştre jan hat min û min hewarkir : Ya ferec ya ferec...Ji ber ku cîranê ferec bûn...Ferec jî wisan dizanî banî wî dikin...Bi lez û bez ji malê derket û diz dît, diz ji revî ew dur xist.. Her sê xuşk jî rizgarbûn...***"[190]

Zarok hemu bi buyer û serpêhatîyên di nava çîrokê de dil xweş bûn. Bi taybetî jî bi dubare kirina navê ( Ya Ferec Ya Ferec ), cîranê wan bi dengê wan ve hat, Piştre ketina pey dizî û rizgarkirina her sê xuşkan. Ev jî wisan bi zarokan dike ku xweşîyekê ji çîrokê bigirin. Di alîyê derûnî de jî aram dibin û her dixwazin dubare guh bidin çîrokê. .

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:**Zarok hest bi xweşî û rihetîyê dikin, dikevin rewşa pêkenînê de û xem di derûnîya wan de namîne. Di heman demê de fêrî hişyarî û zîrekî yê dibin li beraberî kesên xirab de. Her wiha çîrok nîşanî zarokan dike ku arîkarîya kesên derdora xwe bin. Beşdarîyê di çareserkirina pirsgirêkan de çêbikin. Bi vî awayî zarok di nava civakê de kesayetîyekî serkeftî çêdikin.

Her wiha di naveroka çîroka ( Zem ) de hatîye gotin: "***Hebu nebû... Mîrek navê wî Ebas bû, jinek hebu navê wê Zem bû...Aqilê wê sivik bû... Rojekê mêrê wê berxek ser jêkir û goştê wê danî ser agir da ku bikele... Zem ji mêrê xwere got :***

[190]- Husên Sabir Elî, *Nêrgizekanî Qelat*, Weş.Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2010, r.81.

***Dema me goşt xwar wê hinek liber didanê me de bimîne ... Ka rabe em herin di nav baxçede hinek zilkên didanan bînîn da ku em wî goştê çûyî ber didanê me de derbixîn...Ebas got: Başe ka em herin, ji xwe heya em bizivirin wê goştê me jî bikele. Di rê de zemê zilamek dît û got : Zilamo ne çîye, me goştê danî li ser kozan, nan yê di nava selikêde û mifte jî ya di qula darê de... Tu agahdarbî ne tu biçî hundir. Zilam jî got : Başe ez naçim... Zilam ji zemê û ebas derbas bû. Raste rast berê xwe da mala wan...Mifte ji qula darê derxist û derî vekir ket li ser kocqana goşt , heya cîngîn ji binê kocqanê anî...***"[191]

Di vê çîrokê de zarok bi aqilê jina Ebas dikenin. Mala xwe nîşanî zilamekî nenas dike. Zilam jî diçe mala wan mifteyê ji darê dertîne derî ve dike û diçe hundir hemu goştê wan dixwe ji wan re paryekê jî nahêle. Di vir de zarok bi matmayî li gel çîrokê diçin. Bi vê re dilxweş dibin û bandorîyê li ser derûnîya wan çê dike.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Zarok dema guh didin cûreyên çîrokên bi vî rengî pê keyfxweş dibin. Ji ber vê sedemê hîn zêdetir fêrî waneyên jîyanê dibin. Hizir û fikrê wan berfirehtir dibe , ku ji hemu kesê bawer nekin heya ku tam nasneke. Her wiha fêrî vê jî dike ku tiştê xwe ji hemu kesê re nebêjin. Ta ku fêrî hemu tiştê kesê beramber buyî. Ji ber ku bi vî reftarî wê beramberî zîyanan werin û kesên xirap wê bi ser wan de bi bandor bibin. Ji ber vê jî pêwîste dayîk û bav yan mamoste van cûreyên çîrokan ji wan re bêjin.

### C.Çareserkirina Pozbilindî û Xwe Mezin Kirinê :

Pozbilindî û xwe mezin hesibandin yek ji berjengên ne xweşik ê kesane. Di jîyana rojane de ev gelek caran derdikeve holê. Kesên di nava civakê de ji van kesan hesnakin. Ji ber vê jî,kesên Pozbilind, li gel xwe bi çavekî nizim temaşeyî kesên din dikin. Wisan dizanin ku ji hemu kesên din baştirin. Di heman demê ew kesên wisan kesên lewazin û di jîyanê de kesên nezanin.[192]

---

[191] Ebdul Rehman Neqişbendî, *Hebû nebû*, Weş. Dar El-Huriye, Bexdad, 1980, r.147.
[192]Qereçatanî, *b.n.b.*, r.237.

Di vir de ji bo hîn zêdetir fêmkirina vê mijarê em ê di çîroka ( Pozbilind) de destnîşan bikin. Di naveroka çîrokê de jî dibêje:“***Carek du hevalên Pozbilind di rêyekê de diçin... Di nîva rê de baxçeyek ê zebeşan dibînîn...Gelek birçî ne û tirimpêlê didin alîyekê diçin di nava baxçe de...Heya ku têr zebeşan dixwin û têr dibin... Lê ew gelek ji xwe razî û pozbilind in... Duayan ji xwedîyê baxçe re nakin, belku xeberan jî jêre dikin... Hemu zebeşên tirş jê dikin, dişkînîn û pîs dikin... Ji nava baxçî derdikevin û diçin... Sê roj piştî wê... Bi westîyayî û jı hevketî dizivirin nava baxçe... Temaşe dikin zebeşên nû pêve nînin. her ew zebeşên şikestî û pîs pêve mane...Ew zebeş jî kêrî xwarinê nayên... Ji ber ku wan pîs kirîbu. Hîn zêdetir birçî bûn... Çİ çareyek jê re ne dîtîn... Ji mecburî Qalikên pîs ê zebeşan xwarin...***”[193]

Di vê çîrokê de bi awayekî vekîrî em jîyana herdu hevalên pozbilind dibînîn. Piştî ew qas zebeş xwarin, di cihê spasî ji bo xwuda bikin, rabun zebeş hemu şikandin û pîskirin li ser wê re xeber jî dan xwedîyê baxçe. Di encamê de her duyan ji neçarî çun ew zebeşê ku pîs kirîn xwarin Pozbilindîya wan jî ket.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Ev Çîrok jî vîya fêrî zarokan dike ku xwe ji pozbilîndî û xwe mezinkirinê xilas bikin. Bi çavekî nizim temaşeyî mal û samanê xelkê nekin. Dîsan vê jî nîşana zarokan dike xwe ji hemu kesê mezintir ne zanin, ji ber ku wê bikevin ser zimanê xelkê û wê ew ji alîyê wan ve neyê heskirin. Di paşerojê de jî wê çarenûsa wan encamên xirap bi xwere bîne.

Gelek çîrok hene bandorê li ser derûnîya zarokan dikin. Mînak : Çîrokên wekî: Mirîşka sor, Pisîka zer, Awazên Çûkê, Mirîşka Reş û Mam rovî, Gorî xwe li Pişta Mihê da, Gelek wane û amojarîyên bisûd di van çîrokan de hene ku bandorîyê li ser dil û derûnîya zarokên biçûk û mezin de heye.

[193]Îdrîs Ebdula Mistefa,*b.n.b.*, r.323.

## 4.2.Rola Çîrokan Di Perwedekirina Reftarê Zarokan De :

Bê goman çîrok sedemekî giringe, zarokan fêrî gelek reftarên baş dike. Di jîyana rojane de van reftaran bikartînîn, mejîyê wan jî ber fireh dike û wan pêştêxe. Ji ber ku zarok gelek ji çîrokan hesdikin û li gel kesên di nava çîrokê de diçin. Bi vî awayî zarok bi çîrokan fêrî gelek sifet û reftarên xweşik dibin. Mînak: Rast gotin, dest pakî, wefadarî,hevaltî, dilsozî û... hwd . Xirabî û sifetên ne baş jî ji wan re dide dîyarkirin. Mînak: Direw, dizî, Tawan, Hîlekerî û... hwd . Ev hemu perwerdekirinekî rihî û exlaqîye ji bo zarokan.[194]

Çîrok, çavkanîyekî başe ji bo bi cihkirina mafên zarokan. Ev jî bandorê li ser kesayetî ya zarokan dike di alîyê reftar,taybetmendî,û pêşketina wan a rojane de. Zarok, ji sûd girtina çîrokan paşerojekî ronî çê dike. Ji ber ku dema zarok di destpêkê de fêrî reftarên baş bû, êdî nikarin ji wan hestan biçin paş. Ev ji bandorîyekî pozîtîf li ser hemu alîyên civakê de çê dike. Çîrok bandorîyekî mezin li ser pêşketina alîyên reftarên zarokan de heye. Em dikarin di çend çîrokan de destnîşan bikin. Mînak: çîrokên wekî ; Rovî û Mih, Rovîyê Germîyan, Mihgok û Biznok, Rastbêjî, Ser rastî, Hêk diz dibe Hêştir diz,Paşa û Şivan ...hwd. Naveroka van çîrokan em dikarin bi ser zarokên temenê wan biçûk û mezin de dabeş bikin. Wane û perwerdeyekî baş emê bidin nîşa kirin.

### 4.2.1.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Reftarê Zarokên Temen Biçûk De (3-8 ) Salî :

Dîyare, bandorîya çîrokan li ser hemu zarokan de heye. Bi taybetî jî li ser zarokên temenê wan biçûk de heye. Ji ber ku zarok di vî temenî de gelek ji çîrokan hesdikin. Di nav çîrokan de hîn zêdetir ji çîrokên ajalan û Firindeyan hesdikin. Li ser zimanê wan fêrî reftarên baş dibin. Di vê qonaxê de hêza hizîrîna zarokan kurt û sinordare. Ji bo vê jî pêwîste "*Çîrok gelek kurt bin û ji yek buyerê*

[194] Qereçatanî, *b.n.b.*, r.72.

*pêkhatibe*."[195]Hertim pêwiste armanca wan ji bo perwerdekirina zarokan be û sûdê jê bigirin.

Mînak ev cûreyên çîrokan jî bo vê qonaxa zarokan goncave. Çîrokên wekî: Rovî û Mih, Rovîyê Germîyan, Mihgok û Biznok...hwd. Gelek pend û waneyên cûrbicûrtê de hene.

**A.Waneya Rast Gotin û Dur Ketin Ji Derewan :**

Di naveroka çîroka ( Rovî û Mih ) de qala derew kirin û encamên xirap dike. Wisan bi zarokan dike ji van dîyardeyên ne şirîn dur bikevin û berbi rast gotinê ve biçin. Di çîrokê de bi vî awayî hatîye gotin; "***Mihek ji kerîyê pez dur dikeve... Li nav çêrê de bi tenê dimîne û diçêre... Rovîyekî birçî hat cem û got : Ma tu nizanî ev zevî ya min e...Tu çawa dikarî dinav de biçêrî ?! Mihê jî got: Mam rovî zevî zevîya xuda ye vaye ez û tû d inav de diçêrîn... Eger bi navê te be tu bike yê xwe... Rovî jî got: Ne ev zevîye ya mine... Mihê zanî rovî fêlbaze û dixwaze wê bixwe... Mihê got: îşev ji min bigerê sibê em ê herin cem zilamê baş em ê sond bixwîn, kîjan ji me direwan dike xudê dizane û ewê heqê xwe jê bigire... Rovî qebul kir... Mih zîrek bu zu xwe gihand şivanê xwe û jêre qala serpêhatîya xwe kir... Şivan jî biryar da arîkarîya wê bike... Seyên xwe di nava çalekê de veşart û poşî danî ser wan,dema rovî hat zu bigirin... Rovî jî çubu cem gurî û serpêhatîya xwe jêre got... Gurî jî biryar da li gel rovî biçin nav zevîyê û mihê bixwin... Sibeh hat... Rovî û Gurî çûn cem mihê... Mihê jî got: ka em biçin cem zilamê baş... Her sê berbi wê çalê ve çûn ku se tê de veşartî bûn... Mihê got: Fermo ev ew zilamê başe ka sond bixwe ew zevî ya teye... Rovî got: Gurî tu mezinê min î tu sond bixwe... Gurî nêzîkî zilamê baş bû... Seyan xwe avêtin gurî û rovîyê direwker ew birîndar kirin û ji zevîyê dûr xistin... Mih jî rizgar bû***."[196]

Di vê çîrokê de rovî yê fêlbaz di jêr navê gihiştna xwesteka a xirap de dest bi direwan kir.Dema ku dibêje : Ew zevî ya mine. Bi vê hêcetê xwe nêzîkî mihê dike da

[195] Miryem Selîm, *Edeb El-Tfil û Seqafetihî*, Weş. Dar El-Nehze El-Erebiye, Lubnan, 2001, r.189.
[196]- Mûkiryanî,*b.n.b.*, r.47.

ku wê bixwe.Lê belê mihê jî bi awayekî rast gotin û rastî bersiva rovî da. Dema ku dibêje: Ev zevî zevîya xudê ye. Ez û tu di navde diçêrin. Bi vê re rastîya mihê jî derdikeve holê, li beramberî rovî û gorîyê kovî. Di dawîyê de mih bi arîkarîya başîya şivanî rizgar dibe. Gorî û rovî ketin dava seyan û ew hatin sezakirin, durxistin.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Em ê waneye kî bi sûd ji bo zarokan bidin dîyarkirin. Ew jî dur ketine ji (Derewan ) . Ev jî bandorekê li ser pêşektina reftarê zarokan dike. Di sedemê ku zarok ji direwan dur bikeve û di jîyanê de hertim rastîyan bêjin.

Lêkolînên di derbarê zanîna derûnîya zarokan de tehkîd li ser wê dike zarok di temenê destpêkê de hine direwan dikin. Hinek caran jî nikarin cîyawazîyê bêxin di navbera rastîyan de. Hinek car jî zarok direwan dikin ta ku xwe ji pirsgirêkan xilas dikin. Hinek caran jî ji bo dayîk û bav jî wî hesbike rêya direwan di hilbijêre. Xuşk û birayên xwe direwker derdixe da ku xwe li dewruber de bide qebulkirin. Ji bo vê jî pêwîste dayîk û bav amojgarîyan li wan bikin,van cûreyên çîrokan ji wan re bêjin. Fêrî zarokan bikin ku hertim li ser peywendîya rast gotinê bin,heya ku civak jî ji wan hesbikin. Pêwîste vê jî jiwan re bêje direw hebûnekî xelet û ne şîrîne mirovan rureş dike dinava civakê de.

### B.Waneya Destpakî û Durketin Ji Dizîyê :

Di çîroka ( Rovîyê Germîyan ) de bandorîya karên xirap û dîyardeyên (Dizîkirin ) destnîşan dike û nîşa zarokan dike ku ji dizîkirinê dur bikevin. Ji ber ku di jîyanê de bi destpakî û serbilindî bijîn. Çîrok bi vî awayî destpê dike; "***Rovîyekî yê germîyan biryar da berbi navçeyên zozanan ve koç bike...Gehişt navçeyekî çîyayî,li nêzîkî gundekî çavê wî li du kêvroşkan ket, çû cem wan silav kir û ji wan pirsî : Erê di welatê we de çi cûreyênxwarinê heye ? Kêvroşkan jî bersiv da gotin livî welatî hemû tişt hene... Rovî got ez ê bibim mêvanê we... Kêvroşkan goman ji nîyeta rovî kirin û agahîya wan jê hebû, lêmalek nêzîkî mala xwe ji rovî re çêkirin... Zivistan hat û berf barî... Rovî birçî bû...Bi şev diçu nava gund mirişk didizî û dixwar... Kêvroşkan jî bi vî karê rovî hesîyan û jê di tirsan...Biryar dan bi***

***çi corekî be pêwîste ji xwe dur bixin... Rovî carê bi şev diçû dizîya mirîşkan lê vê carê kêvrokşan ew razîkirî bû bi roj biçe dîzîya mirîşkan da ku wî bêxin xefkê...Bu roj rovî çû gund...Nêzîkî malekê bû û serê xwe êxist dinav koxikê mirîşkan de...Xwedîyê malê jî rahişt tevrekî li serê rovî da û ew kuşt,bi vî awayî xelkê navçeyê ji rovî yê diz rizgar bûn**.”[197]

Di vê çîrokê de dîyardeyên ne şirîn û ne di cih de dîyar dibin. Ew ji dizî kirine, rovî hemu şevan diçe gund mirişkan didize û dixwe. Her roj vî karî dubare dike,xelkê gund jî bi vê aciz dibe. Bê goman dizîkirin reftarekî ne baş û ne di cih deye,her di dawîyê de eşkere dibe. Ji ber ku dest dirêjî kirina mal û milkê xelkê reftarekî ne başe û ev kesên bi vî awayî dinava civakê de bi çavekî biçûk û pîs lê tê temaşekirin.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De**: Zarokan fêrî wê tiştê dike ku dizî reftarekî ne baş û xirape. Mirovan berbi pirsgirêk û nebaşîyan ve dibe. Disan zarokan fêr dike ku dest dirêjîya mal û samanê xelkê neke, xwe ji van dîyardeyên ne baş dur bixin. Bê goman pêwîste dayîk û bav van cûreyên çîrokan ji zarokan re bêjin û waneyên perwerdeyî ê baş ji wan re şîrove eşkere bikin. Bi vêre wê zarok ji karên xirap, dizî û ne ne başîyan dur bikevin. Wê bibin kesekî destpak wê bên heskirin dinava civakê de.

### C.Waneya Gohdarî Kirina Kesên Bi Ezmûn :

Gelek caran zarok gohdarî dayik û bav û kesên derdor nakin. Ev jî di encama nerêkîya derûnîya zarokan de serî hildide. Di çîroka ( Mihgok û Biznokê ) de qala bandorîyên xirap û berjengên ne gohdar kirinê dike. Di çîrokê de dibêje : “***Hebû ne bû mihek û Biznek hebû... Li evrazî di cih de mabûn... Wekî gêjan di qeliqîn... Hêdî hêdî werza havînê di borî...Sermayê destpêkir... Biznokê ji mihgokê re got : Were em fikrek ji bo paşeroja xwere bibînîn, wisan xuyaye ku zivistan nêzîkî meye... Eger em malekê ji xwe re çê nekin emê perîşan bibin... Mihê goh neda bizinê ... got: Min hirî heye ez ji zivistanê na tirsim tu ji keyfa xweyî... Bizinê got :***

[197]- Perî Germiyanî, *Rêwî Germiyam*, “ Govara Heng ” , J. 38, 1999, Hewlêr, r.28.

***Sermaya zivistanê dijware wê me li gel xwe bibe... Mihgokê got: Min hirî heye ez ji serma na tirsim... Bizinê zanî çiqas hewildan bike wê bê sud bimîne, bi xwe rabû bi tenê malek ji xwe re çêkir... Gelek ne çû sermayê destpêkir... Mih pûşman bû ku bi gotina bizinê nekir...Hewldan û derfet ji destê wê çû... Befirê destpêkir...Mih neçar ma li gel bizinê li hev bike û got : Cihek ji bo min ji bike... Bizinê got : Min gelik ji tere got lê te goh neda min... Min tenê karî cihê xwe çêbikim...Mih bê bersiv ma li ber derîyê bizinê...Bizin raza...Dema ku serê sibê rabû dît ku mih ji serma li ber derî perîşan bûye...***"[198]

Em di vê çîrokê de dibînîn ku mihê bi goh nedana hevala xwe bizinê, li ber derî ji serma perîşan bûye. Ji ber ku tenê wê goh dida axaftinên xwe goh ne dida amojgarîyên hevala xwe bizinê.Ji ber vê sedemê rastî têkçûnê hat.

Her wiha di çîroka ( Karika Xezalê û Ya Dil Saf ) de, heman şêweyê ne gohdar kirinê derdikeve holê. Di naveroka çîrokê de dibêje: "***Di nav daristanê de pilingek birçî çû dinava xezalan de got : Min tobe kirîye di vî wextî de hun di karin bi azadî bilehîzin...Yek ji karika xezalê bi vê gotina Piling keyfxweş bu, ji dayîka xwe xwest biçe bi lehîze... Lê dayîka wê ew agahdarkir ku neçe neke ji ber ku Piling fêlbaze...Lê belê karika xezalê goh neda dayîka xwe...Çû bi lehîze...Pilingê fêlbaz çû ew girt...Bi vê re karika xezalê fêmkir ku di rêyek xelet de çû...Got, xwezîmin goh bidaya amojgarîyên dayîka xwe...***"[199]

Di vê çîrokê de jî wekî çîroka pêşîyê karika xezalê rastî êş û têkçûnê hat. Ji ber ku goh ne da dayîka xwe û sûd ji amojgarîyên wê negirt. Ji ber vê sedemê pilingê fêlbaz karî wê bigire û bixwe.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Her Du Çîrokan De :** Di van her du çîrokan de tê xuyakirin ku, ewê goh nede kesên bi ezmûn û têgihiştî yan jî goh nedin dayîk û bavê xwe, wê hertim di jîyanê de ruber ruyî pirsgirêk,êş û nexweşîyan bibin. Ji ber ku li kesên bi ezmûn gohdar kirin sûdekî pir giring heye. Zarok bi vêre hiş û hizrê wan berfireh dibe. Di jîyanê de dibin kesên xwedî ezmûn û çav vekirî. Pêwîste dayîk

---
[198] Ebdulqadir Qadirî, *Meroke û Biznoke*, Ç.1, Weş.Hîwa, Mehabad,Îran, 1393, r.5.
[199] Îdrîs Ebdula Mistefa, *b.n.b.*, r.325.

û bav ji xeyrî van çîrokên bi sûd jî amojarîyên cuda lizarokan bikin. Daku zarokên wan hîn zêdetir baştir û gohdar bin.Ji ber ku *"Dema ku zarokan hîskir dayîk û bav bişêweyekî baş li gel wan di axive,ew ji hîn zêdetir gohdidin wan û bi vê keyfxweş dibin.*"[200] Ji ber ku dema zarok gohdar dikin axaftin û amojgarîyan bi cih tînîn. Pêwîste bi heskirinek nîşa wan bê dayîn bi başî pesnê wan bê dayîn. Ev jî dide xuyakirin ku wê karên başencam bidin.Bi vî awayî zarokên bi vî rengî dibin mirovên bi sûd di civakê û jîyana taybet a xwede.

### 4.2.2.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Reftarê Zarokên Temen Mezin De (8-15 ) Salî:

Çîrok di vê qonaxê de jî giringîyekî zêde heye. Ji ber ku hizir û fikrê zarokan ber firehtir bûye. Bi hêsanî ji wateya peyv û hevokan fêm dikin. Ji ber vê sedemî fêrî wane û amojgarîyên dinava çîrokê de dibin. Heskirin û xwestekên xwe di çîrokan de dibînîn. Her wiha zarok hîn zêdetir ji peyam û xwestekên çîrokan tê digihin. Dikarin waneyên bi sûd destnîşan bikin. Bi vê yekê re zarok bi çîrokên ji bo vê qonaxê hatîn hilbijartin re fêrî gelek tiştan dibin. Mînak: Rast gotin,destpakî, wefadarî, gohdarkirin û rêzgirtin...hwd. Her wiha jî gelek reftarên xirab û neşirîn jî dur dikevin. Mînak : Direw, dizî, xîyanet, hîle, poz bilindî...hwd . Disan ji ber wê ye ku di jîyana zarokan de çîrokê giringîyekî wê ye zêde heye. Ji ber ku pire ji serpêhatî û bûyerên bisûd. Reftarên zanistî ê zarokan jî zêde dike.[201]

Mînakên van cûreyên çîrokan gelekin. Zarokên vê qonaxê dikarin gelek sûdan jê bigirin û jê bandor bibin.Mijar û amojgarîyê dinav de em dikarin ji wan re bikin bingeh û rê di jîyanê de. Li ser vê xwestekê em dikarin çîrokên mîna: Rast gotin, Ser rastî, Hêk diz dibe Hêştir diz, Paşa û Şivan, bidin dîyarkirin.Waneyên perwedeyî ê dinav de em dikarin bi vî şêweyê li xarê destnîşan bikin.

---

[200]Kesas,*b.n.b.*, r.51
[201]Qereçatanî, *b.n.b.*, r.72.

**A.Waneya Rast gotin û Durketin Ji Direwan :**

Bê goman rastgotin exlaqekî xweşike. Pêwîste dayîk û bav,mamoste wane û amojgarîyên di nava çîrokê de nîşanî zarokan bidin ku hertim rastîyan bêjin. Ji ber kueger te zaroka xweli ser rêya rast gotinê mezin kir,yan di rêyek rast de perwerde kir ewê wê rêyê baş bigire.[202]Bi vî awayî mirov dibe kesekî heskirî û bextewar di nava kesên hawirdur de. Bê goman kesên direwker hertim dinava jîyanê de şermezar dibin.

Wekî din naveroka çîroka ( Rastbêjî ) de jî hatîye dîyarkirin ku;"***Sê birayên hejar hebun...Biryardan ji bajêr herin li pey kar bigerin...Çûn di rê de şev bi ser wan de hat...Serê sibehê dema rabun zilamekî bi temen rih sipî dîtîn... Piştre bi zilamê rih sipî re çûn... Birayê mezin li asîman komek qijik dîtin...Xwezî ev qijikane hemu ji min re bibûna mîh... Zilamê rih sipî got: Ji alîyê xwedê ve hêsanîye, lê eger yên te buna teyê xêr û başî bikira ? Birayê mezin ji got : Belê... Piştre hemu qijik jêre bun mih... Vê carê birayê navîn ji daxwazîya xwe anî ziman û got : xwezî ev darên berûyan hemu ji min re bibuna darên Zeytunê... Piştre birayê biçûk li gel zilamê rih spî çû...Gihiştin robarekî... Birayê biçûk jî got : Xwezî ev av û robare ji bo min bibûna hingivîn...Zilamê rih spî got : Ji alîyê xwedê ve hêsanîye, lê tu wê xêr û başîyan bikî ? Birayê biçûk ji got : Belê... Av hemu bu hingivîn... Birayê biçûk dewlemend bu...Rast bu ji bo sozan... Piştî demekê çû serdana birayên xwe...Dît ku ew darên zeytûnê û mih nemayîne... Zilamê rih spî dîyar bu û got : Te rast di got,lê birayên te derew dikirin ji ber wê hejar man...***"[203]

Di encama çîrokê de dîyare ku tenê ew her dewlemend maye. Ji ber ku birayê biçûk rastgoyî bu soz û biryarên xwe bi cih anî, arîkarîya kesên hejar kir ji ber wê tenê ew dewlemend ma. Lê belêbirayê mezin û yê navendê ji ber ku derew dikirin û ne rast bun, li ber acizbûna ji xwedê mezin bûn, mal û samanê wan jî ji dest çûn her di jîyanê de bi hejarî man. Di vir de ji mere dide dîyar kirin ku kesên rastgo û bextewar wê di jîyanê de hertim serkeftî bimînîn. Ji alîyê xwedê û xelkê ve jî tên heskirin. Lê belê ew kesên ku bi derewan dixwazin bigihin armanca xwe wê hertim şermezar bin dinava civakê de.

---

[202]Suhêl Tahir Ebdula,*b.n.b.*, r.38.
[203] Pîrdawid Mexmûrî, *Sorê Çawşîn*, Weş. Roj helat, Hewlêr, 2011, r.247-250.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Mirov dema rastîyan bêje wê di jîyanê de her tim serbilind û serkeftî be.Xwedayê mezin jî wê daxwazên wî bi cih bînin, ji alîyê gelve jî wê bên heskirin. Dibin mînakek baş ji bo xelkên dinjî, ji ber ku berjengekî xweşike ew ji wê dubare bikin. Her wiha ev çîrok jî nîşa zarokan dike ku ji direwan dur bikevin. Ji ber ku ew kesên direwan dikin wê rastî zîyanê werin û wê di jîyanê de negihin xwestek û armanca xwe.

Her wiha di naveroka çîroka ( Ser rastî ) de jî hatîye gotin : Di heman şêweyî de di çîrokên pêşî de jî nirx û bihayê rast gotinê hatîye dîyarkirin. Encama xirapî û derew kirinê jî hatîye dîyarkirin. Di naveroka çîrokê de dibêje : "***Darvanek dema darê dibire tevrê wî dikeve nav Robarî de...Melevanekî sihirbaz jî darvan di şopîne... Di nav robarî de tevrekî zêr anî û got : Ev ya teye ? Zilamê darvan jî dibêje: Na, ne ya mine...Bi lez û bez tevrekî zîv derdixe û dibêje: Ev ya teye ? Darvan dibêje: Ne ew ji ne ya mine... Cara sêyem zilamê sihirbaz tevrê darvan derdixe û dibêje : ma ev ji ne ya teye ? Darvan tevrê xwe nasdike û dibêje : Belê ew tevir yê mine... Melevanê sihirbaz ji rast gotina darvan matmayî dimîne... Tevrê zêr û zîv jî dide wî... Darvan jî bi dilxweşî vedigere gund... Serpêhatîya xwe ji hevalên xwere dibêje...Yek ji hevalê wî di dilê xwe de dibêje : Ez ê jî herim da ku zêr û zîvekî bînim...Bi heman awayî tevrê xwe xist dinava robarî de... Melevanê sihirbaz bi heman şêweyî tevrê zêr derxist û got : Ev ya teye ? Hevalê direwker got : Belê belê ew ya min e...Melevanê sihirbaz jî zanî ku ew direwkere... Ji ber wê jî ew rureşkir û şand malê ...***" [204]

## B.Waneyên Destpakî û Durketin Ji Dizîyan :

Li ser armanca rastgotin û durketin ji dizîyê, ji bo zarokên vê qonaxê di nav kurdan de gelek çîrokên girîng û bi nirx hene. Di naveroka çîroka ( Hêk diz buye Hêştir diz ) de dibêje : "***Dizek, her şev dizî dikir û xelkê acizdikir...Yek ji wan şevan Hêştirek dizi û kesek kuşt...Heya rojekê xeber hat gotin destgir kirin...Paşayê welêt biryar da pêwîste dizker bê îdamkirin... Ji dizker re gotin wesyeta xwe bêje û gotina***

[204] Îdrîs Ebdula Mistefa, *b.n.b.*, r.231.

***dawî bike... Dizker ji got : Min dayîkek pîr heye, rica dikim hun bînin ez bibînim ji bo ez heqê wê helal bikim...Çûn dayîka wî a pîr anîn pêşîya wî...Dizker got: Dayê tu zimanê xwe derbixe ji bo ez maç bikimû xatirî te...Pîrejin zimanê xwe derxist... Dizker gezek li zimanê wê da û zimanê wê ji binîde derxist... Xel pê matmayî man... Hakim got: Dizo te çîma wisan kir ? Dizker jî got : Min di destpêkê de hêkek dizî...Ew ê ez fêrkirim ku tiştên mezintir bidizim. Ewê çarenûsekî xirab ji min re çêkir...***" [205]

Ev ê çîrokê dîyardeyên dizî kîrinê û tiştên xirab da dîyar kirin. Yekem sedemê reftarên bi vî rengî ji alîyê malbatê ve ne perwerdekirina zarokan e. Bi taybet ji dema danûstendina wan a li gel zarokên wan e. Mînak: Çav girtin li xeletîyan, bi nazdarî perwerdekirin û dil şikandina zarokan e. Ev hemu bandora karên xirab li ser zarokan çêdikin. Ji ber vê jî pêwist e zarokan berbi destpakîyê ve bibin û xwestekên wan ji alîyê dayîk û bav ve bê bicih anîn. Ji ber ku, bê beşkirina zarokan ji wan tiştên ku ew dixwazin, ew tişt ne şert e ku tiştên madî bin, belku tenê hiştina zarokan û ne heskirina wan jî dibe sedemê dizîkirinê.[206] Ji ber vê jî pêwîst e çîrokên bi vî rengî ji zarokan re bê gotin. Ev jî zarokan fêrî destpaqijî, durketin ji dizî û destdirêjî nekirina malê xelkê. Bi wî şertî ku zarok qet hisnekin ku çîrok qala wan tiştan dikin. Ji ber ku dibe sedemê birîndarkirina hîsên zarokan û jê sudê nabînîn.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Ev çîrok jî fêrî zarokan dike ku, destpakbin,dur bikevin ji dizîyan û destdirêjî malê kesekê nekin. Peyamekê ji pêşkêşî dayîk û bavan dike. Bi awayekî baş zarokan perwerde bikin, eger zarokên wan xeletîyek kir zu li pêşîyê bibin asteng, bi awayekî zanistî û bi amojgarîyan zarokên xwe bêxin ser rêya rast. Eger berevajî van rastîya çav li zarokan bê girtin wê hertim li ser rêya karê xirap berdewambin.

### C.Waneya Wijdanî û Durketin Ji Xîyanet û Ne Paqijîyê :

[205] Haşim Selîmî, *Çîrok û Efsaney Mukiryan* , Ç.1, Weş . Serdem, Slêmanî, 2013, r.257.
[206] Ebdulrehîm Mehmud Qerewlûsî*, Girife Derûnyekanî Mindalan*, Weş. Kardo, Kerkuk, 2014, r.38.

Em ê armanca çîroka( Paşa û Şivan ) bidin destnîşan kirin. Di naveroka çîrokê de dibêje : "***Salekê qeyran hat welat... Paşa ji bo çareserîyê li cihan digerîya...Dît şivanekê pezê xwe mixel anîye û seyê xwe jî girêdaye ...Paşa jê pirsî : Çima te seyê xwe girêdaye ? Şivan got: Heya tu jî daxwaza min bi cih nekî ez na bêjim... Paşa keça xwe lê markir lê her dîsan şivan jê re negot... Paşa jêre got ez ê te îdam bikim... Şivan dibêje: Tu min îdam jî bikî ez ji tere nabêjim... Paşa dibêje: Ji min re bêje te çima seyê xwe girêdaye tu çi bixwazî ez ê ji tere bêjim... Şivan dibêje: Ez dixwazim hefteyekê bibim paşa... Paşa jî ji neçarî qebul kir... Şivan jî bû paşa û desthilatdarî girt... Wezîr û berpirsyarên wî hemu li sêdarê dan... Ji paşa re gotin çima ev şivan wisan dike? Paşa jî çu cem şivan jê re got te çima wisan kir ?... Got: Seyê min mih ji bo goran dibir... Min jî ew girêda ji ber ku xîyanetî dikir û ne paqij bû... Wezîrên te jî hemu xayîn û ne paqij bûn... Dixwestin werin cihê te... Welat jî wê hîn zêdetir berbi giranî û nexweşîyê ve biçûya... Paşa jî got : Bila koşk û paşayetî ji tere be...***"[207]

Di vê çîrokê de dîyardeyên xirab û îxanetê têxe ber çavan. Dema ku şivan seyê xwe bi singî ve girê dide. Ji ber ku mih ji bo gorîyan dibir. Her wiha dema ku şivan di hefteyekê de dibe paşa wezîrên wî jî li sêdarê dide.Ji ber ku dizî û xîyanet li paşa û welat dikirin. Li vir jî derdikeve holê ku ew kesên ku xîyanetê dikin çarenûsekî xirab ji xwe re çêdikin. Pêwîste dayîk û bav hîn zêdetir van çîrokan ji zarokên xwe re bêjin.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Ev çîrok jî zarokan fêr dike ku xîyanet û nepaqijî xelet e. Hemu karên xirab di rojekê de dîyar dibin. Ev jî wisan li mirovan dike hertim rûreş û şermezar bin. Zarokan ji vê çîroka girîng fêmkirin ku ya herî baş bi wijdanbûn e

Gelek çîrok di derbarê reftarê zarokan de heye. Mînak : Çîrokên wekî, Hevaletîya Gorî, Şêr û Rovî , Rovî, Mirîşik û Dîkil, Rovî û Kêvroşk, Gayê Kovî,Şivan û Talançî, Paşayê Zordar, Nebû Paşa...hwd .Gelek wane û amojgarîyên

[207] Mewlud Îbrahîm Hesen, *Têrnexore*, Weş. Rojhelat, Hewlêr, 2008, r.291.

bi nirx tê de hene. Bandorê wan li ser pêşketin û reftarê zarokan de heye. Di hemu alîyên jîyanê de.

### 4.3.Rola Çîrokan Di Perwerdekirina Alîyên Civakîya Zarokan De:

Çîrok, rolekî giring dibîne di binyata perwerdekirina civakê de. Fêrdike ku çawa hewildanên ciwan û reftarê baş di nava civakê de encam bide.Dîsan zarokan ji bo paşerojê amade dike ku serkeftî be bi cih anîna erkên civakê de. Gelek waneyê civakî yên wekî: Arîkarî dayîna xelkê, Xizmet û mafên cîranan, Yekîtî û yek girtin,Rêzdarî ji bo kesên din, Beşdarbûyîna di xweşî û nexweşî yê de, Başkirin û arîkarî dayîna xelkê...hwd,fêrdike.

Bê goman pêwîste ji alîyê dayîk,bav û mamoste ve çîrok bê hilbijartin.Ew wane û amojgarîyên zanîstî yên tê de bi awayekî vekirî ji wan re bê şîrovekirin. Ji ber vê pêwîste "*Zarok fêrî edeta rast ya dinava civakê de bêkirin. Ji bo ku bibe hemwelatîyekî bi sûd û rêzê ji kesên dewruber û ên mezinê xwe bigire*."[208] Her wiha pêwîste çîrokên bi vî awayî ji bo zarokan bên gotin. Li gel serdem û reftarê civakê bîgoncê. Pêwîste ji wan naverokê çîrokan ku sûd û feydeyekê nadin zarokan dur bikeve.[209] Bi vî awayî zarok dibin kesayetên baş dinava civakê de.

Ew çîrokên ku bandorê li ser perwerde û kesayeta zarokan jî dikin hene. Mînak : Çîrokên wekî; Kevok û Mêro, Geşta Ber Bi Zozanan Ve, Masîyê Jîr, Qijik û Perê Tawis, Nebu Zilam, Çîya û Xizmayetî, Ew kesê ku ji mêvana hesbike heskirîyê xwedê ye, Hêz Di Yekîtî Daye.. hwd . Gelek waneyên giring di nava xwe de digire. Ji bo pêşxistina zarokan di alîyê civakê de. Em ê dikarin van cûreyên çîrokan bi ser her du qonaxê temenê zarokan de dabeş bikin, ango yên biçûk û mezin de.

#### 4.3.1.Waneyên Çîrokan Di Perwerdekirina Civakîya Zarokên Temen Biçûk De (3-8) Salî :

[208]Kesas,*b.n.b.*, r.9.
[209]Qereçatanî, *b.n.b.*, r.73.

Di vê qonaxê de emê van çîrokan bidin dîyarkirin. Bi zimanekî sade û hêsan hatîyte nivîsandin. Ev cûreyê çîrokan li ser zimanê Firinde û ajalan de hatîye çêkirin.Şêweyê pirtûkê wan jî wekî nîv pirtûke. Çîroka ( Kîlîle û Dimne ) jî li ser zimanê ajalan hatîye nivîsandin û xwesteka naveroka wê jî dide dîyarkirin. Zarokên vê qonaxê gelek keyfxweş dike. Ji ber ku "*Zarok di vê qonaxê de daxwaza çîrokên Firinde û ajalan dikin*."[210] . Di be sedemê ku zarok bi hêsanî jê fêm bikin û sûdê ji wane û nêzîkatîyên civakî wer bigirn. Di jîyana rojane de jî bi karbînîn.

Li ser vê armancê emê mînakên civakî di çend çîrokan de bidin dîyarkirin. çîrokên wekî: ( Kevok û Mero, Geşta Ber Bi Zozanan Ve, Masîyê Jîr, Qijik û Perê Tawis...) .Wane û nêzîkatîyên civakî jî dide dîyarkirin.Li ser armanca alîyên civakî û bi hevre jîyankirin de. Zarokan berbi pêşve bibin, heya ku dibin zilamê paşerojê û ji bo civakê bi sûd bin. Ew çîrok van waneyên xwarê dide dîyarkirin:

**A.Waneya Arîkarî û Hevkarî Kirina Xelkê :**

Bê goman arîkarî dayîna kesên di nava civakê de erkekî pîroz ê civakîye . Hestekî xweş di mirovan de dide avakirin. Mînaka vê waneyê jî emê di naveroka çîroka ( Kevok û mêro ) de bidin dîyarkirin " ***Kevokek nazik û xweşik li ser çiqê darê sekinîye... Temaşe kir mêroyek ket di nava avê de... Hema wê bifetise... Kevok gihiştê pelek yê darê kir dibinde... Mêro jî bi vî pelî xwe gihand kenarê avê... Ji tirsa, neçarî û nemayînê xilas bû... Hest bi aramîyê kir... Ew ê ji dît nêçîrvanek nîşan li kevokê girtîye da ku wê bikuje... Mêroyê xwe gihan nêçîrvan yekser lingê wî gez kir... Nêçîrvan ji êşa destê wî lerizî û tîra wî xelet çû... Kevok jî bi azad firî û rizgar bû...***"[211]

Di vê çîrokê de em hest bi nêzîkatîyek ya civakî dikîn. Ew jî arîkarî û arîkarî dayîna heve, dema ku kevok mêroyê ji nav avê rizgar dike. Li beramberî vê başîya kevokê jî mêroyê ew ji nêçîrvan rizgar kir. Ev ji dibe sedemê ku hestên arîkarîyê di zarokan de çêbibe. Bibe kesayetekî bi sûd û bi bandor di nava civakê de.

---

[210] Razaw Reşîd Sebrî,*b.n.b.*, r.165.
[211]Mûkiryanî,*b.n.b.*, r.57.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Çîrok zarokan fêrî arîkarîya kesên dewruber dike. Armanca wê jî ewe ku berjenga arîkarîyê di zarokan de peş bikeve. Dîsan zarokan fêr dike ku bermaberî her karekî baş ew jî başîyê pêşkêş bike. Ev jî dibe binyadekî baş, hem di civakê de hem jî di paşeroja jîyana zarokan de.

## B.Waneya Yekîtî û Yekgirtin :

Ev jî waneyekî bi sûd ya civakî ye û ya zarokan e jî. Nîşa wan dike li beramberî kesên xirab bihêz bin. Weku di naveroka çîroka( Geştek Berbi ZozananVe) de dibêje: "***Kerekî Pîr çu zozanan... Di rêde beramberî du berana hat... Beranan jêre got: Mamê ker tu wê kuve biçî? Wî ji got: Niyeta min ewe ez biçim zozanan... Beranan got: Em jî bi te re werin? Kerê pîr jî got: Fermo... Di nîva rê de beramberî Elokekê hatin... Elokê jî got: Min jî bi xwe re bibin. Hemuyan gotin xwe amade bike em biçin... Nêzikî zozanan bûn... Vê carê gorîyek (gurek) beramberî wan hat... Kerê pîr ji beran re got: Ez ê di nava vî gîyayî de biçêrim... Dema ku gur berbi min ve hat, hun bi hûçê xwe êrîşî li ser bikin û zikê wî bidirînin.... Bila eloka hevala me jî serû çavê wî birîndar bike... Hemuyan gûh dan gotinên kerê pîr... Dema gurî nêzîkî kerê pîr bû, elokê xwe li ser û çavê wî da... Beranan jî bi hûçên xwe zikê wî dirandin... Bi vî rengî xwe û kerê pîr ê hevalê xwe ji mirinê rizgar kirin... Hemûyan biryar dan bizivirin germîyan da ku gurekî din beramberî wan neyên...***"[212]

Di vê çîrokê de bi şêweyekî dîyar û berçav mirov hest bi nêzîkatîyek a civakî dike. Ew jî yekêtî û yekgirtina kerê pîr, her du beran û elokê ye. Dema ku di nava xwede biryar dan li dijî hemu pirsgirêk û nexweşîyan de pişta hav bigirin û yekgirtî bin li dijî sitemkar û şerxwazan.

Di çîroka ( Masîyê Zîrek ) de , em ê helwesta masîyên biçûk a li beramberî masîyê dirinde ê mezin de bibinîn. Di çîrokê de dibêje: "***Hebu ne bu komek masîyên biçûk hebun di robarekî de dijîyan... Masîyek bi lez hat cem wan û got : We agahî***

---

[212] Omer Îbrahîm Ezîz, *b.n.b.*, r.57.

***ji xwe hebe masîyek dirinde hatîye di nav robarî de... Masî li cem hev kom bûn da ku xwe ji vê pirsgirêkê xilas bikin... Yek ji wan got : Pêwîste em ji vî robarî biçin... Yekek din got : Em ji vî robarî naçîn ev robar yê meye. Masîyê zîrek got : Em bi arîkarîya hevdû û bi piştgirîya xwedayê mezin, li ser nexşeyekê li hev bikin em ê ser bikevin... Dema em hemû bi hevre êrîşî li ser dijminê xwe bikin ewê bi neçarî bireve... Çavê masîyê dirinde bi hemû masîyan ket û yek ji wan girt, temaşekir gelekin tirsa ji neçarî robar hêla û çû... masî hemu dil xweş bûn û bi xweşî di nava robarî de bi hevre jîyan kirin...***"[213] .

Di vê çîrokê de yekîtî û yekgirtina masîyên biçûk dide dîyarkirin, li beramaberî masîyê dirinde. Masîyên biçûk bi yekgirtin û piştgirtina hevdû karin masîyê mezin û dirinde ji nava robarî de derbixe. Bivê re karin bi awayekî keyfxweşî di nava robarî de bi hevre jîyan bikin. Dur ketin ji tirsa dijmin.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Her Du Çîrokan De :** Li bermaberî pirsgirêk û kesên xirap ê dinava civakê; ev cûreyên çîrokan zarokan fêrdike ku yekbiryar û yekgirtîbin. Ji bo zarokan dide dîyarkirin ku kesên yekgirtî hertim beramberî şerde ser dikevin. Ev jî wisan bi zarokan dike ku hêj di destpêka temenê xwe de ev hest li gel pêş bikeve. Di paşeroja zarokan de bandorekî pozîtîfî çêdike û di nava civakê û di jîyanê de bi hevre jîyankirin jî dide avakirin.

### C.Waneya Bexşandin û Lêborînê:

Lêborîn yek ji nêzîkatîyên civakîne. Bê goman hemu mirovek xeletîyan dike. Ya herî girîng ewe ku mirov ji xeletîyên xwe poşman bibe û jê lêburînê bi xwaze.Weke ku di çîroka ( Qijik û Perê Tawis ) de hatîye gotin : "***Qijikek di serdemekê de bi komkirina perê tawis ve xerîk dibû. Hey ku per û çengê xwe pê xemiland... Bi xweşî firî çû nav firindeyan. Bi nazikî dinav wan de diçû û dihat... Melek bi halê qijikê kenîn. Hemu lê kombûn û perên tawis jê vekirin û avêtin asîman... Qijik ji şerman ji wê navçeyê çû...Demekê li çol û deştan geriya... Piştre***

[213] Rûnak, *Masiyekî Zîrek*, " Govara Heng " , J. 34, 1998, r.9.

***poşman bû hat li cem teyr û lêburîna xwe jê xwest. Ji ber vê jî melekan ew jî wekî yek ji xwe hesibandin...***" [214]

Em di vê çîrokê de dibînîn ku qijikê xeletîyekî kirîye. Dema ku hewil dide xwe bi perên tawis bi xemilîne û xwe li ber çavê hevalên xwe bide gohertin. Ji ber vî karêne goncav hevalên wî jê aciz bûn û ew bi tenê ma. Piştre hest bi xeletîya xwe kir û poşman bû, daxwaza lêborînê ji hevalên xwe xwest. Ewan ji daxwazîya wê qebul kirin û wekî yek ji xwe hesibandin.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Ev çîrok Hiş û hizrê zarokan têdixe tevgerê. Fêrî wan di ke ku di encam her karên xirap de lêborînê bi xwazin. Ji xeletîyên xwe poşman bibe. Her weku çawe gijik poşman bu û hat ji hevalên xwe lêborîn xwest. Ev çîrok berjengê lêborînê di zarokan de dide avakirin.Bi vê re zarok ji dibin kesên binirx û bibexş di nava civakê de.

### D.Waneya Beşdarbun Di Xweşî û Nexweşîya Xelkê De:

Weku tê zanî mirov hebûnekî civakîye. Nikare bi tena serê xwe jîyan bike. Ji ber wê ye ku pêwîste di xweşî û nexweşîyên xwe de hevbeşbin û beşdar bibin. Weku di naveroka çîroka ( Şevşevoka Kor û Tirsonek ) de dibêje : " ***Komek ajal bi hevre dijîn... Lê belê rojekê ji ber kêmbûna xwarinê şer dikeve di navbera wan de... Dema ku peleweran xwe ji bo şer amade dikin ji şevşevoka kor re dibêjin : Erê tu jî wê li gel me beşdarbibî yan ?... Şevşevokê got : Nexêr,Ji ber ku ez ne pelewerim, ez hêkan nakim... Şevşevoka kor çû... çû... Heya gihişt ajalan...Şêr serokê ajalan bû û got : Tu wê beşdarî me bibî ? Şevşevoka kor ji wan re jî got: Na... Ji ber ku hun dibînin min wekî firindeya çeng hene... Şer destpêkir... Şevşevoka kor li wan temaşekir... Piştî şerekî pir... Pelewer û ajal li hevhatin... Aheng çêkirin... Dema ku şevşevoka kor hat ahengê, Jêre gotin : Te di dema şerde beşdarî nekir û te xwe dizî, niha jî nabe tu beşdarî ahenga me bibî...***"[215]

---

[214]Mûkiryanî,*b.n.b.*, r.36.
[215] Husên Sabir Elî, *Baxî Qelat*, Weş. Şehab, Hewlêr, 2013, r.68.

Di vê çîrokê de qala şevşevoka kor a tirsinok dike. Di dema xweşîyê de beşdarî ji bo ajal û peleweran kir. Lê di nexweşîyê de beşdar nebû. Tenê ji derve temaşe kir. Di dawîya şerde aşitî çêbû. Pelewer û ajalan disan nehişt şevşevoka kor û tirsonek beşdarî aheng û xweşîya wan bibe.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:**Di vê çîrokê de binyadekî berfireh û perwerdeyîya civakî ji bo zarokan dide avakirin. Ta bikare di xweşî û nexweşîya kesên hawirdora xwe de beşdarî bike. Ji ber ku dema mirov tenê di xweşîyan de beşdarî kir û di nexweşîyan de beşdarî nekir, ew dibe kesekî berjewendî perest û di civakê de cihê wî namîne, bi çavekî nizim lê tê temaşekirin. Ji bo vê pêwîste zarokên me li ser vê nêzîkatîya civakî a xweşîk mezin bibe. Heya ku dibin kesekî serkeftî û civak jî piştgirîyê biditê.

### 4.3.2.Waneya Çîrokan Di Perwerdekirina Civakîya Zarokên Temen Mezin De (8-15) Salî :

Di vê qonaxê de fikrê zarokan ber firehtir dibe. Ji xeyalan dur dikevin û ji buyerên rastî ê civakî hesdikin. Di Zarokan de erk û çalekîyên jîyanî zêdetir dibin. Ji ber vê jî bihevre bûn û naskirina dewruber ji alîyê zarokan ve zêdetir dibe. Hizra tiştan dike, hizirînekî bi wijdan.[216] Ji bo vê armancê em dikarin bêjin çîrokên civakî hemû dikarin bandorê li ser reftarên zarokan de çê bikin. Di kare di hemû alîyên jîyanê de wan berbi pêş ve bibe. Bi taybetî jî ew çîrokên ku peywendî bi civak û perwerdekirina zarokan re heye. Babetên cûrbicûr yên wekî : Xizmayetî, Rêzgirtina dayîk û bav û kesên mezin,Beşdarbun di xweşî û nexweşîyên xelkê de, Rêz û pêşwazîkirina mêvanan û Yekêtî û Yekgirtin...hwd . pêktên. Ev hemu jî zarok dikarin di jîyan û paşerojê de sûdê jê bigirin.

Mînakên van çîrokan ê ji bo vê qonaxa zarokan gelek in. Çîrokên wekî : Nebû Zilam, Çîya û Xizmayetî, Ew Kesê Ji Mêvanan Hesbike Xwedê jî Jê Hesdike, Hêz Di Yekîtî de. Ev hemu xwedîyê wane û amojgarîyên bi sûd in. Nêzîkatîya zarokan a civakî pêşdixe.

[216]Newzad Elî Ehmed, *Midal û Edeb*, Ç.2, Weş.Rûn, Slêmanî, 2006, r.22.

**A.Waneya Rêzgirtin Ji bo Dayîk û Bav û Kesên Mezin:**

Bê goman rêzgirtin di jîyanê de cihê şanazîyê ye. Pêwîste bi şêweyekî herî baş rêz ji bo kesên dewrubera me bê girtin. Di destpêkê de pêwîste bi aramî li gel wan biçin. Daku ev reftare û nêzîkatîya civakî di zarokan de pêş bikeve. Di rêya çîrokên civakî de giringî ji bo zarokan were dayîn. Heya ku hîn zêdetir ji bo vê armancê tevbigerin. Di naveroka çîroka ( Nebû Zilam ) de jî dibêje : ***" Birayekî heft kur hebûn... Ji nêzîkatîyên kurê xwe ê biçûk ne razî bû... Ji ber ku ne rêzdar bû. Babê wî ji dij jêre dibêje : Tu qe nabî zilam... Kurê biçûk piştî demekê çû Tarhranê...Piştî çend salan bu Serleşker... Bu kesayetekî Pile mezin...Zivirî bajarê xwe... Nêzîkî gundê babê xwe... Ji cendermeyan re got : Herin filan cihî, birayek heye, şeş kurên wî hene, pirça wî bibirin û siwarê kerekê bikin binîn vir... Hefeteyekê kirin di zindanê de... Piştî hefteyekê got : Ji zîndanê der bixin... Kurê wî bi cil û bergên leşkerî bi zimanê farisî ji babê xwe pirsî : Tu min nasdikî yan ne, babê wî ê pîr got : Na ez te nasnakim... Kurê wî bi zimanê kurdî got : Ez ew kesim ku te hertim di got tu nabî zilam... Ez niha bume Ser leşker ... Babê wî got : Min ne gotîye tu nabî Ser leşker ... Lê min got tu qet nabî zilam...Eger tu biba zilam te wê ji xwe re rêz û hurmet bi girta û tu wê bi rêzdarî bihatîya cem me.. "***[217]

Tişta di vê çîrokê de hatî fêmkirin eve. Zarok hîn zêdetir wê rezgirtinê bidin bavê xwe. Reftarên kurê biçû yên ne pesend wê ji xwe dur bigirin.Ji ber wê ye ku kurê biçûk hêj di destpêkê de rêzdarî ji bavê xwe re nedigirt û bê rêz bû. Reftar û tevgerên wî ji birayên din cuda bû. Bavê xwe pir aciz dikir. Ji ber wê bavê wî hertim jêre di got tu qet nabî zilam. Di çîrokê de dide dîyarkirin ku kurê biçûk di qonaxên din ê jîyanê de dibe efsane lê belê qet sudek ji ezmunên jîyanê ne girtîye. Li ser wê nêzîkatîya xwe a ji malbata xwe re rêz negirtin berdewam dike. Ji ber wê jî dikeve ber acizbun û nefreta bavê xwe.

---

[217] Haşim Selîmî, *b.n.b.*, r.293.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Zarokan fêr dike ku hertim ji pileya xwe derbaz nekin. Pêwîste rêzdarî bide bav û kesên ji xwe meztir. Eger wisan neke wê gel jê nefretê bike. Ji ber dema ku mirov rêz dide xelkê rêzdarîyê ji xwe re jî digire. Her wiha çîrok nîşa zarokan dike ku hertim birêz bin. Bi taybetî beramber kesên bi temen û pîr. Ji ber ku zanîn û ezmûnê wan zêdetir di rêvebirina karên jîyanê de heye.

## B.Waneya Giringîdayîna Xizmayetîyê :

Dîyare ku bi qonaxa mezinbuna zarokan re erkên wan ê civakî jî zêde dibin. Ji ber ku zarok hêdî hêdî mezin dibin. Pêwîste bizane çawe nêzikî reftarên kesê dewruber û bi taybet kesên xizmê wan bibe. Ji bo vê jî pêwîste em van çîrokan bêxin di bin xizmeta zarokan de. Fêrî zarokan bike ku pewyendîyekî baş, rêkûpêk li gel kes û karên xwe de çêbike. ji ber ku xizmayetî bandorekî pozîtîf li ser zarokan çê dike. Di çîroka ( Çîya û Xizmayetî ) de zêdetir ev armanc dîyardibe.Di çîrokê de dibêje; "***Li deverekê de dû bine mal hene...Xizim û kesên yek bun. Çîyayek mezin dinavbera her du bine malan de hebû... Ji hevdu cuda kirin... Ne di hişt bi hêsanî hatu çûnê bikin... Rojekê birayê mezin di wî alîyê çîyayî de fikrekkir...Endamên xêzanê komkirin û ji wan re ragihand... Pêwîste ev çîyayê ku hatu çûna me û ya xizmên me zehmet dike nemîne... Endamên xêzanê jî vî fikrî matmayî man... Jina wî jêre got : Em bê hêz û lewazîn em ê çawe bikarin vî çîyayî bi roxînîn?!... Zilamê jîr jî bersiv da û got : Eger em her roj kevirek ji çîyê bibin wê piştî demekî ev bilindahî nemîne. Wê çaxê heta heta em ji xizmatî û heskirina kesên wî alîyê din bê beş namînîn...***" [218]

Di vê çîrokê de hîn zêdetir giringîya dinavbera xizmayetî û hat û çûna kesên nêzîk derdikeve holê. Dema ku zilamê jîr daxwaz ji endamên xêzanê kir, pêwîste ev çîyayê bilin nemîne. Ji bo wê ye ku heta heta em bikarin hat û çûnê di navbera xizmên xwe ê di wî alî de bikin. Daku rêz û soza heskirina di navebra me de zêdetir bibe, agahîya me ji xweşî û nexweşîyên hevdu hebe.

---

[218] Sabir Marf, *Şax û Xizmayetî*, " Govara Heng" , J. 78, Hewlêr, 2002, r.4.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Ev çîrok jî zarokan fêr dike ku hat û çûyîna xizm û kesên nêzîkî xwe bikin û heskirinê nîşa hev bidin. Her wiha fêrî dike ku ew pirsgirêkên ku dibin sedemê hat û çûna wan a li cem hev ne hêlin. Ji ber ku xizmayetî hezkirina mirovan a ji bo hevdu zêdetir dike. Wekî kurd dibêjin : ( Ewê liber çavane,her ewe yê li ber dilane ).

### C.Waneya Pêşwazî û Rêzgirtina Mêvanan :

Pêwîste zarokan fêrî rêzgirtin ji bo mêvanan bikin. Bi çavekî rêzdarî li mêvanan temaşe bikê û bi pêşwazîyekî germ bên silav kirin. Di vê derbarê de çîrokan bandorekî pir heye. Daku bi karin wî erkê pîroz ê civakî bi cih bikin. Di çîroka (Ew Kesê Ji Mêvanan Hesbike Heskirîyê Xwedê Ye ) de zêdetir giringîya rêz girtina ji bo mêvanan derdixe holê. Di naveroka çîrokê de dibêje : " ***Hebû nebû kesek ji xwedê mezintir nebû... Zilamek misilman xwedî xêzan bu... Hejar û dest kurt bu... Elokek, Çêlekek û Berxek wî hebûn... Ji bêkarî li mal runiştî bu... Rojekê mêvanekê li derîyê wan xist û bû mêvanê wan... Ewan jî bi keyfxweşî pêşwazîya wî kir... Xwedîyê malê ji hevsera xwe re got : Ji bo nanê êvarê me çi tişt heye ?... Hevsera wî got: Titek nîne... Zilamê wê got: Ka elokekê ser jêke... Hevsera wî got: Başe... Elok serjêkir paqijkir û danî li ser agir... Piştî nimêja êvarê hat zilamê wê çû medbexê temaşekir hevsera wî nivistîye... Nêzîk bu temaşekir jina wî çûye ber dilovanîya yezdan... Ew jî bi bêdengî li hundir danî û bang li jinek ya cîranê xwe kir... Ji bo ku xwarinê amade bike... Ji jinikê re got: Bila mêvanê me nezanibe hevsera min çûye rehmetê... Emê şîna xwe piştî çûyîna mêvanê xwe bikin... Ligel mêvanê xwe xwarin xwar heya direngîya şevê bi mêvan re keyfxweş bû... Ser siharê mêvan çû û xatir xwest... Ew ji bi alîkarîya xelkê gund hevsera xwe veşart û tazîya xwe danî..*** "[219]

Di vê çîrokê de em nêzîkatîyek bilind a civakî dibînîn. Her çiqas hevsera zilamê misilman koça dawî jî kir lê ewî her rêzdarî û xizmeta mêvanê xwe kir. Ne hişt mêvanê wî têkbiçe û hest bi nexweşîyan bike. Bi şêweyekî pir rêzî pêşwazîya mêvanê xwe kir.

---

[219] Azad Hîdayet Delo, *Çarenûs*, Weş. Çira , Hewlêr, 2002, r.57.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Ev çîrok zarokan fêrdike ku rêzdarîyê bidin mêvanê xwe û bi şêweyekî xweşik pêşwazîya mêvanê xwe bikin. Ji bo zarokan şîrove dike ku qet wisan nekin ku mêvan hest bi acizî û nerehetîyê bike.Dema ku mêvan hat pêwîste li ser her sedemekê berdewam be, erkê mêvandarîyê bi cih bîne. Ji bo vê jî dibêjin : ( Mêvan mêvanê xwedê ye ).

**D.Waneya Yekîtî û Yekgirtin :**

Yekîtî û yekgirtin nêzîkatîyekî giring a civakî ye. Ji ber vê sedemê ji xwe bawerîya zarokan zêde dibe. Wekî kesekî serkeftî di nava civakê de derdikevin. Dibe ku mirov nekaribe di her wextî de xwestekên xwe ji kesekî din re bêje. . Ji bo bi serkeftî bigihêje armanc û xwestekên xwe ê di jîyanê de; Pêwîst e li gel kesên din di kar û xebatan de bibe yek yan jî yekgirtina xwe çêbike. Li ser vê armancê emê di çîroka ( Hêz Di Yekgirtinê De Ye ) de bidin destnîşan kirin. Di çîrokê de dibêje: "***Hebû nebû birayek hebû heft kurên wî hebûn... Ewan kuran li hevdu nedikirin... Bavê wan fikirî rêyek dît... Heft darên tîra anî bi hev ve girêda... Piştre gazî her heft kurên xwe kir û got: Ka em temaşe bikin kîjan ji we vî qefdê daran bişkîne... Ez ê xelatekê bidimê... Her heftan jî nekarîn qefdê daran bişkênin... Piştre bavê wan qevdê daran vekir yek yek dan destê wan... Hemuya bi hêsanî dar şikandin... Bavê wan li wan temaşekir û got: Eger hun her hef bi yekrebin û pişta yek bigirin wê kesek nekaribe we... Lê belê eger hun yek, yek bimînîn her çiqas hun zîrek ji bin, wê we bi hêsanî bişkênin û dijmin wê we têk bibe... Ev gotinên bavê wan gelek ket dilê wan... Biryar dan û soz dan pişta yek bigirin û nakokîya bihêlin...***"[220]

Di vê çîrokê de em bi awayekî vekirî dibînîn ku bavê wan şêweyekî baş hilbijart. Ji bo zarokên wî ji yekîtî û yekgirtinê fêmbikin, dur bikevin ji nakokîya. Ji ber ku bi yekêtî û yekgirtinê dikarin bigihin armanc û xwestekên xwe û li beramberî dijmin serbikevin. Eger ne yekgitîbin,dijmin dikare bi serwande bigire û wan têkbibin.

---

[220]Komelêk, Xwêndinewey Kurdî bo Polî Sêyemî Bineretî, *Hêz le Yekêtî daye* , Weş, Wezareta Perwerde, Hewlêr, r.37.

**Waneyên Perwerdeyî Yên Di Çîrokê De:** Evê çîrokê waneyekî girîng dest nîşan dike. Ji bo zarokên vê qonaxê jî guncav e. Bi sûd girtina ji vê çîrokê jî hestên civakî di zarokan de bi hêz dibe. Ji ber ku bi yekêtî û yekgirtinê hêza ji xwe bawerbunê zêde dibe. Di jîyanê de bi hêsanî digihin armanc û xwestekên xwe. Hîç hêzek nikar bi serwande serbikeve. Zaroka fêr dike ku bi nakokî û nearamîyê nikarin di jîyanê de berbi pêşve biçin. Dijmin dikare li beramberî wan bi hêsanî serbikeve.

Gelek çîrok hene alîyên civakî ê zarokan berbi pêşve dibin. çîrokên wekî: Gur Û Rovî, Çûka Zana, Çend Paşayek, Rezvanê Rezîl, Berhema Kar, Kurê Paşa û Kurê Wezîr, Kakil Zêr û Didan Merwanî,Kurê Keçel, Şertên Şeytan, Kurê Pûş Firoş...hwd, Gelek wane û amojgarîyên bi sûd divan çîrokan de heye. Ji bo beru pêşçûna jîyana civakî û bi hevre jîyankirinê zarokd dikarin jê sûdê werbigirin. Bi vê yekê re dikarin bibin kesayetîyek serkeftî di civakê de û paşerojekî pêşketî ji bo xwe avabikin.

# ENCAM

Çîrok weke beşeke ji wêjeya folklorê sedemeke ji bo perwerdekirina berûpêş birina jîrî û aqilê zarokan di qonaxên cuda cuda ê jîyanê de. Ev jî dibe sedemê ku zarok di qonaxa seretayî heya baliqbûnê sûdê ji çîrokan bigirin û hizirîna wan berfireh bibe. Her wiha çîrokên li gorî qonaxa temenê zarokan arîkarîyekî girîng e ji bo dewlemendkirina ferhenga zimanê wan. Şêwazekî baş e ji bo bihêzkirina axaftina zarokan.  Bê goman ji bo wê yekê ye ku zarok bi şêweyekî baş ji çîrokan sûdmend dibin. Pêwîst e dayîk bav û mamoste li gorî qonaxa temenê zarokan ji wan re çîrokan bi hilbijêrin û ji wan re bêjin. Ji ber ku ew çîrokên ji bo zarokên temenê wan biçûk in, ji bo zarokên temenê wan mezin naguncin û bisûd nabin. Her wiha ew çîrokên ji bo zarokên temen mezin guncav in, zarokên temenê wan biçûk nikarin jê fêm bikin. Ev jî dibe sedemê ku zarok ji çîrokan bêzar bibin û naxwazin gohdarî bikin.

Ew çîrokên ku ji bo zarokên temenê wan biçûk guncav in,buyer û serpêhatîyên wan herî zêde li ser zimanê ajal û firindeyan e. Ji ber ku zarokên vî temenî ji van çîrokan hesdikin û jê bandor digirin. Ev cûreyê çîrokan jî peyv û hevokên wan kurt in, ji sê çar karakteran derbaz nakin buyer û serpêhatîyên wan kurt in. Zarokan van qonaxan bi şêweyekî raste rast ji wane û perwerdeyên di nava çîrokê werdigirin. Lê belê ew çîrokên ji bo zarokên temenê wan mezin hatîn hibijartin zêdetir karakterê wan ji mirovan pêktê. Zarokên vê qonaxê jî hemû peyvên di nava çîrokê de fêm dikin. Dikarin bi şêweyekî rasterast yan jî ne rasterast ji wane û amojgarîyên di nava çîrokê sudê wer bigirin û di nava jîyana rojane de bikar bînin.

Çîrok bi waneyên cûrbicûr, di hemû alîyên jîyanê de zarokan perwede dike, wane û amojgarîyên baş nîşa wan dike. Di alîyê derûnî de wan aram û keyfxweş dike, wan fêr dike ku beramberî tir û xeman neşkên û ji xwe bawer bin. Di alîyê reftar de jî wan fêrî gelek waneyê perwerdeyî dikin. Di derbarê destpakî û rast gotinê de jî wan fêr dike, fêri gohdarkirina dayîk û bavan jî dike. Di heman demê de wan fêr dikin dur bikevin ji reftarê ne baş ên wekî . Dizî, Direw, Hîlekirin. Her wiha di alîyê civakî de jî çîrok bi waneyên bi sûd wisan bi zarokan dike, bibine kesekî serkeftî û hêza li gel hev jîyan kirinê hebe. Beşdar bibe di xweşî û nexweşîyên kesên derûber de.

# ÇAVKANÎ

ALANÎ, Ezîz, (2014), ***Perwerdeî Mndalekanman***, Silêmanî, Weş. Çarçira.

ATTİ, Hikmettin. (2013), ***Lêkolîneke Folklorê li ser Destana Mem û Zînê***, Teza Lînsansa Bilind, Mardîn.

BABAN, Cemal,(2010), ***Galtewkep û Danisqayî Kurdewarî***, Silêmanî Çapxaneî Şifa.

BACELAN, Rustem,( 2000), ***Mindal û Folklor***, " Govarî Karwan", J. 147.

BEHADÎN J. M,(1990). ***Şewanî Caran***, Bexdad Weş. el-Hewadis.

BERZENCÎ, Taha Ehmet, (1995), ***Metel***, "Govarî Keluporî Kurd", J. 57.

BESAM B.Y, (2002), ***Turq Diraset el-Tifil***, Erden , Weş. Dar el-Meysere.

BÊXALÎ, Seyîd Mewlûd,(2013), ***Efsane û Dastan le Kurdî da***, Hewlêr, Weş. Hewlêr.

BEYDEBA, (2010), ***Kîlîle û Dimne***, Wer. Omer Tufîq, Silêmanî ,Weş. Genc.

BİQAÎ, Îman, (2004**), *Fen Qise el-Etfal***, Lûbnan Weş. Dar el-Hadî.

CAMBAZ, Tariq, (1998), ***Hîkayetên Kurdî û Motîvayekan Lêdwan û Çend Hîkayetek,*** "Govarî Rewşenbîrî Niwê", J.110.

CİZÎRÎ, Elî, (2000), ***el- Edeb el-Şefahî el- Kurdî***, , Ç.2, Weş.Ofsêt.

COTYAR, Xalid, (1984), ***Berew folklor***, Bexda Weş. el- Hewadis.

DELO, A. Hîdayet,(2002), ***Çarenûs***, Hewlêr, Weş. Çira.

EBDULFTAH ABU MEHEL, (2001), ***Edeb el-Etfal*** , Eman Weş. Dar el-Şrûq.

EBDULHEMÎD, Y.,(2009), ***Mûcem el-folklor***, Misr, Weş. el-Heye el-Misrîye.

EBDULKERÎM Q. EBUL XÊR, (2004), ***el-Nimû min el-hemil îla el-Muraheqe,*** Eman, Weş. el-Waîl .

EBDULSİTAR T. ŞERÎF,(1986), ***Wişe û Riste laî Mindal le Temenî 1-6 Sal***, "Govarî Zanyarî îraq" Berg 14.

EBDULSTAR T. ŞERÎF, (1984), ***el-Zexîre el-Lûxewîye Înde el-Tifil Kurdî***, Bexda, Weş. Dar el-Seqafe el-Kurdiye.

EBDULSTAR T. ŞERÎF, (1977), ***Mindal û Perwerde***, Bexda ,Weş. Dar el-Îraq.

EBDULSTAR T. ŞERÎF,1982, ***Neşûnimaî Zanyarî Laî Mndal***, Bexda, Weş. el-Îraq.

EFLATUN, 2006, ***Komar***, Hewlêr, Wer.Suran Emer Heme, Rêbwar Qaraman, Hesen Çomanî, Weş.Wezaretî Perwerde.

EHMED, N., 1968, ***Fen el-Kitabe Lîl Etfal***, Qahire, Weş. Dar el-Kutb.

EHMED Q. SEÎD, 2005, ***Çîrok û Geşey Mindalan Du Babetî Perwerdeyî,*** Silêmanî,Weş. Wezaretî Rewşenbîrî.

EL-HİRFÎ, Mehmed Elî, 1996***,*** ***Edeb el-tafal Dirase NezarîyeTetbîqiye***, Qahîre, Weş. Dar el-Îtîsam .

EL-HÎTÎ, Hadî Neman,1977***,*** ***Edeb el-Tfal Felsefetîhî Fnûnîhî û Wesaytihî***, bexda, Weş. Dar el-Hûriye.

EL-NESRÎ, Yasîn, 1985, ***Delalet el-Mekan fî Qises el-Etfal***, Bexdad, Îraq, Weş. Dar el-Seqafe.

EL-XEFACÎ, M. Husên, 1984, ***Mîyûl el-Etfal el-Qiraye***, Weş. Dar el-Şûn Seqafiye.

FAZİL M. MAHMÛD, 2006, ***Şiirî Mindalan Le Edebî Kurdî da***, Slêmanî, Weş. Serdem.

FERHADÎ, Heme Salih, 2005, ***Mindal û Edebî Mindalan***, Hewlêr, Weş. Wezaretî Rewşenbîrî.

GERDÎ, Ezîz,*1972*, ***Midal û Perwerde û Çîrok***, "Govara Nûserî nwê", Jimare.11.

GERMİYANÎ, Perî, 1999, ***Rêwî Germiyam***, " Govara Heng " , Hewlêr , Jimare. 38.

GORAN, Y.Hesen,1997, ***Lawik û Sitiranên Kurdewarî***, Hewlêr, Weş. Rewşenbîrî.

HAŞİM SELÎM , 2013, ***Çîrok û Efsaneyî Mokryan,*** , Silêmanî, Weş. Serdem .

HAWARÎ, Sefer,2001, ***Pendî pêşînan Le deverî Hewreman da,***"Govarî Asûyî Folklorî ", J.5.

HEME S. HESEN, 2005, ***Hizir û Şêwaz Le Çîrokî Kurdî Da***, Hewlêr, Weş.Wezaretî Perwerde.

HÊMİN C.MİHEMED, 2015, ***Hunerî Gêranewe Le Çîrokî Folklorî Kurdî Çîrokî Mindalan Be Nimune***, Hewlêr ,Teza Lîsansa Bilind, Selahedîn.

HEWRAMÎ, Heme Kerîm, 2005, ***Edebî Mindalanî Kurd***, B.Yekem, Hewlêr, Weş.Wezareta Perwerde.

HÎWA O. EHMED, 1979, ***Mêjoî Folklor*** " Kovarî Nûserî Niwê" Jimare 4.

HÎWA O. EHMED, 1977, ***Rajenînî Lankî Mirovayetî*** , Silêmanî.

HUSÊN S. ELÎ, 2013, ***Baxî Qelat***, Hewlêr ,Weş. Şehab.

HUSÊN S. ELÎ, 2010, ***Nêrgizekanî Qelat***, Hewlêr, Weş.Wezareta Perwerde .

ÎBRAHÎM Q. MEHEMED, 1976, ***Bayexî Çîrokî Mindalan***, “Govarî Runşenbîrî Niwê”, Jimare.52.

ÎDRÎS E. MİSTEFA, 2008, ***Wane Zêrînekan***, Hewlêr, Weş.Wezareta Roşenbîrî .

ÎDRÎS EBDULA, 2014, ***Edebî Mîlî û Folklorî***, B.1, Hewlêr ,Weş. Hacî Haşim.

ÎDRÎS EBDULA, 2014, ***Edebî Mîlî û Folklorî***, B.3, Hewlêr, Weş. Hacî Haşim.

ÎZEDÎN M. R., 1979, ***Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî***, Slêmanê, Çapa 2, Weşanxaneya Zankoy Silêmanî.

KEMAL MERÛF,2007***, Rexneî Niwêy Kurdî***, Silêmanî, Weş. Jîn .

KESAS, Mehemed, 2000, ***Mindal û Saykolojyetî Perwedekirdin***, Ç.2, Slêmanî Weş. Dezgehê Serdem.

KOMELÊK, ***Xwêndinewey Kurdî bo Polî Sêyemî Bineretî,Hêz le Yekêtî daye,*** Hewlêr, Weş. Wezareta Perwerde.

MEHEMED A. ÎBRAHÎM ,2004, ***Sqafe el-Tifl***, Eman, Weş. Dar el-fikr .

MEHEMED E. MUÎD, ***el-Esatîr û el- Xûrafiyat*** , Beyrût, Dar el-hedase.

MEHEMED F. HESEN,2010, ***Memleketî Masî***, Hewlêr, Weş. Aras .

MEHEMED R. REMEZAN, 1984, ***Mindal û Çîrokî Mindalan***, Hewlêr, Weş. Zankoy Selahadîn.

MEHEMED R. FETAH, 2009, ***Nimûne û Lêkolînewe Le Edebî Mindalanî Kurd,*** Hewlêr, Weş.Roşenbîrî .

MEWLÛD Î. HESEN, 2002, ***Geran Be diway Nemirî da***, Hewlêr, Weş. Aras .

MEWLUD Î. HESEN, 2000, ***Qedexe Şikênî***, Slêmanî, Weş. Desgehê Serdem .

MEWLUD Î. HESEN, ***Têrnexore***, Hewlêr, Weş. Rojhelat .

MEXMÛRÎ, Pîrdawid, 2011, ***Sorê Çawşîn***, Hewlêr, Weş. Roj helat .

MİRYEM SELÎM, 2001, ***Edeb el-Tfil û Seqafetihî***, Lubnan, Weş. Dar el-Nehze el-Erebiye.

MORSÎ, E. Alî, 1975, ***Muqedîme fî Folklor***, Qahre, Dar el-Seqafe û el-Neşir.

MÛKİRYANÎ, Kurdistn, 1984, ***Bîst Çîrokî Folklorî Kurdî***, Hewlêr, Weş. Roşenbîrî.

MUKRÎ, Kamuran (Muhemed Ehmet Taha), 1984, ***Edebî Folklorî Kurdî***, Hewlêr, Weş. Zankoy Selahedîn.

MZAFER M. ÎSMAÎL, 2011, ***Rûxsar û Naverokî Çîrokî Mindalan Lay Letîf Helmet***, Hewlêr, Weş. Hacî Haşim.

NAHÎDE E., 2005, ***Seratayek Deerbareî Serhildanî Edebî Mindalanî Kurd***, Weş.Wezareta Perwerde,.

NEQİŞBENDÎ, Ebdul Rehman, 1980, ***Hebû nebû***, Bexdad, Weş. Dar el-Huriye.

NEWZAD E. EHMED, 2006, ***Midal û Edeb***, Ç.2, Slêmanî, Weş.Rûn.

OMER Î. EZÎZ, 1984, ***Rêwî Germiyan û Kwêstan***, Bexdad, Weş.Edîb.

QADİRÎ, Ebdulqadir, 1393***, Meroke û Biznoke***, Ç.1, Îran, Mehabad, Weş. Hîwa.

QEREÇATANÎ, K. Şerîf, 2011, ***Saykolîcya û Perwerdeî Mndalan***, Silêmanî , Weş. Peywend.

QEREÇATANÎ, K. Şerîf, 1997, ***Saykolojiyetî Mindal***, B. yekem, Slêmanî, Weş. Zanko.

QEREWLÛSÎ, E. Mehmud, 2014***, Girife Derûnyekanî Mindalan***, Kerkuk, Weş. Kardo.

QESAB, Yaqûb, 1990, ***Le Pênaw Perwerdey Mindalan da***,Weş. Hewlêr.

RAZAW, R. SEBRÎ, 2010, ***Çîrokî Mindalan le Edebî kurdî da 1990-2005***, Hawlêr, Weş. Hacî Haşim.

RŞDAN, Ebdula, 1999, ***Îlim el-Îçtimae el- Terbiye*** , Eman, el-Erden, Weş. Dar el-şruq.

SEBÎHE FARİS, 1987, ***el-Îticahat el-Cedîde fî Seqafet el-Etfal***, Weş. Mûasese Erebîye.

SECADÎ, Eladîn, 1391, ***Mêjoyî Edebî Kurdî***, Sendec, Îran,Weş. Întişarat Kurdistan.

SEDREDÎN N. EBUBEKİR, 2005, ***Berkurtekî Metelî Folklorî Kurdî***, Hewlêr Weş.Wezaretî Rewşenbîrî.

SEÎD RÎYAZ, 2003, ***el-Euses el-Nefsîye min Merahil el-Cenîn***, Msir, Weş. Dar el-Kelîme.

SELAM S. MEWLÛD, 1999, ***Qonaxekanî Geşekirdinî Mindal û Edeb***, Silêmanî,”Kovarî Ayînde”, J.3.

SELÎMÎ, Haşim, 2013, ***Çîrok û Efsaney Mukiryan*** , Ç.1, Slêmanî, Weş . Serdem.

SEMÎR EBDULWEHAB, 2006, ***Edeb el-Etfal Qrat Nezriye û Nemazic Tetbîqîye***, Eman, Weş. Dar el-Meysere.

SEWAF, M. Şerîf, 2004, ***Perwerdeî Mindal u Herzekarî***, Weş. Wezaretî Perwerde.

SUHÊL T. EBDULA, ***Perwerde Le Serdemekî Metirsîdar Da***, Dihok ,Weş. Xanî.

ŞÎLAZÎ, C. M., 2003, ***Çend Vekolînek Di Çîrokên  Folklorî Kurdî de***, Silêmanî, Weş. Şivan.

ŞÛKRÎYE R. ÎBRAHÎM, 1984***, Edebî Folklorî kurdî***, B.duyem, Hewlêr, Weş. Zankoy Sellahedîn.

ŞUKRÎYE R. ÎBRAHÎM, 2005. ***Hîkayetî Folklorî Giyandaran***, Silêmanî, Weş. Şivan.

ŞÛKRÎYE R. ÎBRAHÎM, 1984, ***Lêkolînewe le Zanîstî Ewrupa û le Kurdistan***"Kovarî Karwan" J.14.

XALÎDE Q. FERAC, 2013, ***Çîrokî Mndalan Le Edebî Kurdî da,1970-1990***, Hewlêr, Weş. Şehab.

YORÎ SOKOLOF,1971, ***el-Folklor Qezaye ûTarîxh***,Wer. Hilmî Şerawî, Ebdulhemîd Hewas, Misir, el-Heye el-Misrye.

YUSİF O. HEMED, 2006, ***Tîorekanî Perwerde û Ferkirin***, Ç.1, Hewlêr, Weş.Asoy Perwerde.

ZERDEŞT, Ehmed, 1999, ***Kawa û Newroz Efsaneyî Bîrî Niwê***, Weş. Dezgehê Ruşenbîrî Kurdî,.

ZÎAD M. EMÎN, 2011, ***Bûkî Xeman***,  Slêmanî, Weş. Karo.